Hikâyede ayrıca sosyal yaşamdaki adlandırmaların nasıl yapıldığı bilgisi aktarılır. Yani bireylerin isimlendirilmesinde ne tür kıstaslara başvurulduğu bilgisi verilir. Bazı köylülerin isimleri şunlardır: Hesenê Çe Feratî, Kêkê Selmono, Biraê Bakî, Nesemî Axa, Hesen Usta. Görüldüğü gibi bireylerin adlandırılması bazı bağamlar üzerinden gerçekleştirilir. İlk bağlam aile bağıdır. Örneğin Hesenê Çe Feratî, Ferhatların Evinin Hasanı anlamına gelir. Hasan ismini bağlı bulunduğu aileden yani “Ferhatların Evi”nden alır. Kêkê Selmono, Selman’ın Ağabeyi demekken Biraê Bakî, Baki’nin Kardeşi anlamına gelir. Görüldüğü gibi bazı kişilerin âdetâ isimleri yoktur. Onlar falanca kişinin kardeşi ya da falanca kişinin ağabeyi şeklinde adlandırılırlar. Yani onlar adlandırılırken onların isimleri değil başkalarının isimleri merkezdedir. Nesemî Axa, Nesemi Ağa demektir. Yani bazı kişiler ya maddi durumları iyi oldukları ya saygınlıklarını ya da yaşlılıklarından dolayı Ağa unvanını alırlar. Hesen Usta, Hasan Usta demektir. Eğer biri bazı alanlarda yetenekliyse ona usta lakabı takılır.

“Yaranîe (Şaka)” isimli hikâyede ise köylerdeki düğünlere dair gelenek ve göreneklere yer verilir. Hikâyede Tunceli’in Ovacık ilçesinin köylerinden söz edilir. Bu köylerde düğünlerin modern düğünlerin aksine birkaç gün sürdüğü bilgisi aktarılır. Düğün olunca köyde başka bir uğraşı kalmaz ve tüm köylüler âdetâ birkaç gün başka bir dünyaya göç ederler. Bu tarz bir durum psikolojik açıdan onlara gerekli olan bir şemdir. Çünkü köylerde şehirlerde bulunan psikolojik terapiler yoktur ve köylüler düğün ve benzeri etkinlikler üzerinden âdetâ psikolojik terapilerini gerçekleştirip ruhlarını arındırırlar. Nitekim dünyanın birçok bölgesinde geleneksel toplumlar bu tarz etkinlikleri bu ve benzeri amaçlar için uzun tutmuşlardır. Hikâyede düğünde oynayan kişiler ayrıntılı şekilde tasvir edilir ve onların oyun oynarken yoğun şekilde terledikleri ama yüzlerinde de bitmeyen bir tebessümün bulunduğu

aktarılır. Yani onlar oynarken sadece bedenlerinden tuz ve toksinler atılmaz aynı zamanda psikolojik hallerindeki, ruhlarındaki sıkıntılar, kederler, stres de dışarı atılır. Bu mutlu hâl düğünden sonra da etkisini sürdürür. Düğünden sonraki belli bir zaman diliminde de köylülerin yüzünde gülükler eksik olmaz ve birbirleriyle şakalaşır dururlar. Yani “psikolojik terapi” fazlaıyla amacına ulaşır.

Sosyal yaşamda selamlama, birbirini sorma önemli bir yer tutar. “Yaranîe (Şaka)” hikâyesinde bu konuya ayrıca dikkat çekilir. Aktarılan bazı ifadeler şunlardır: “Wes û war be, kal u pîr be/sapasağlam ol, yaşlı ve ihtiyar ol” (s. 78); “Eke raştê jubîn amaî, jubîn rê vanê: Gonîa m’, ’çitonî a, conê to wes o, gonîa’m, bî roce di rocî ke meymane ma be, qidaê tu mi ser bîero, rind qaitê xu be! / Birbirleriyle karşılaşlıklarında şunları söylerler: Benim canım, nasılsın, iyi misin; benim canım, gel birkaç gün bende misafir ol, dertlerini üstüme alayım, kendine iyi bak” (s. 79). Bu ifadelerdeki asonans, aliterasyon, tekrir ve kafiyeleri tam olarak gösterebilmek için onların Zazacasına da yer verdik. Görüldüğü gibi bu köyde sosyal yaşam akarken köylüler arasındaki kişilerin morallerini yükseltmek ve köyün mutluluğunu artırmak için iyi niyet ve iyi temenniler ortaya koyan teşekkür babında ifadeler kullanırlar.

Sonuç

Edebiyat sosyolojisi, tüm edebiyatlarda kendisine yer bulan bir disiplindir. Ancak Zaza edebiyatı gibi ağırlıklı olarak dili ve kimliği var kılma, devam ettirme amacı ile edebî eserlerin ürettiği edebiyatlarda bu disiplin kendisine daha fazla yer bulur. Bu tür edebiyatlarda edebiyat sosyolojisi analizleri yapıp bu eksende çıkarımlarda bulunmak daha yaygın bir olgudur. Zaza edebiyatı, köy olgusu eksenli çalışmalar da uygun bir alandır. Çünkü Zaza yazarlar saf dile, kültüre, kimliğe ulaşmak için köylerin kendilerine sunduğu imkânların farkındadırlar ve bu realiteden fazlasıyla istifade ederler.

Kemal Astare'nin *Cer Hard Cor Asmen* isimli kitabında yer alan hikâyelerde köy olgusu farklı bağamlarda ele alınır. Örneğin yazar köyün ontolojisini ortaya koyar. Köyün şehirlere nazaran daha "transparan" olan yapısı edebî kurgular ile ortaya konulur. Özellikle "Bektes Axa" hikâyesinde bu durum somutlaştırılır. Hikâyede köyün şehirlere nazaran daha az katmanlı yapısının bir şeyleri gizlemeyi, saklamayı zorlaştırdığına vurgu yapılır. Yazar hikâyelerinde köyün bitemviye, değişmeyen, tekdüze yaşamını onu şehirle karşılaştırarak verir. Şehirlerin dinamik yapısına karşın köyün statikliğine vurgu yapar. Şehirlerdeki duygusal değişim hızının fazlalığına ve duygusal gelgitlere köyde daha az rastlanıldığına gönderme yapar. Hikâyelerde ele alınan konulardan biri de köyün ve köylülerin dış dünyadan soyut ve izole yapısıdır. Ancak bu özelliğe sahip köyün sakinlerinin söz konusu savaş olunca birden dış dünyaya entegre olduklarına dikkat çekilir. Çünkü ölüm ve acı çekme ihtimali bireylerin tüm hücrelerini canlandırıp onları bu ihtimallerden nasıl uzak kalabileceklerini düşünmeye sevk eder. Bu da kaçınılmaz olarak dış dünyayla ilgilenme, ona entegre olma sonucunu doğurur.

Kitapta köyün ekonomik temelleri de ele alınır. Özellikle hayvanların ve toprağın köylüler için nedenli vazgeçilmez olduğu üzerinde durulur. "Gaê Alışanî" hikâyesinde köylünün kaybolan öküzüne şarkы yazması ve ona cesur, altın gibi nitelikleri layık görmesi bu realiteyi en somut haline büründürür. Yazar kitabında iyiliğin ve kötüluğun ne şekilde tezahür ettiği konusu üzerinde durur ve bazı hikâyelerde mekân olarak köyü seçer. Bu hikâyelerin bazlarında köyün sosyal ve ekonomik yapısı ile iyilik ve kötülük arasında bağ kurulur. Yani hikâyelerde köydeki iyilik ve kötülik aktarılır. Örneğin "Mordemê Wextê Verenî" hikâyesinde insanlar eski zamana ve köye ait oldukları için iyidirler. "Eskicî" hikâyesinde ise rüşvet gibi olumsuz bir eylem köy realitesi üzerinden yani yumurtayı rüşvet olarak verme şeklinde vücut bulur. Kitapta yer alan hikâyelerde ayrıca gelenek ve göreneklerin köyün sosyal yaşamına nasıl etki ettiği üzerinde durulur ve gelenek ile göreneklerin sosyal yapılanmanın temel yapı taşlarından biri olduğu çeşitli örnekler üzerinden somutlaştırılmaya çalışılır.

183

Çalışmamızda biz sadece bir kitap ve bir konu üzerinden Zaza edebiyatında edebiyat sosyolojisi konusunu ele aldık. Ancak Zaza edebiyatının birçok eseri edebiyat sosyolojisinin birçok konusu üzerinden analiz edilmeye müsaittir. Çalışmamız bu konu ekseninde kaleme alınacak daha kapsamlı çalışmalarla mütevazı bir örnektir.

Kaynakça

- Akman, İ. (2021). "Zaza Edebiyatında Şehir-Birey İlişkisi: Eksik Bedenler, Daralan Yollar, Genişleyen Muhayyile", Erman Gören vd. (der.) *Şehir: Edebî Karşılaşmalar içinde* (1-15), İstanbul: İstanbul Üniversitesi Yayıncıları.
- Andrews, W. G. (2003). *Şiirin Sesi Toplumun Şarkısı*. T. Güney (çev.) İstanbul: İletişim Yayıncıları.
- Angelopoulos, T. (1998). *Sonsuzluk ve Bir Gün (Eternity and a Day)*. Yunanistan: Paradis Films.
- Arslan, H. (2019). *Türkiye'de Kir Sosyolojisi Araştırmaları*. Ankara: Siyasal Kitabevi.
- Astare, K. (1994). *Cer Hard Cor Asmen*. İstanbul: Weşanxaneyê Doz.
- Baskıcı, M. M. (1998). "Evcilleştirme Tarihine Kısa Bir Bakış", *Ankara Üniversitesi SBF Dergisi*, 53 (1): 73-94.
- Bloch, M. (2013). *Tarih Savunuşu veya Tarihçilik Mesleği*. A Berktaş (çev.) İstanbul: İletişim Yayıncıları.
- Dağılma, İ., Avcı, E. (2022). "Kitabo Verin ê Hikâyeyanê Zazaki Cer Hard Cor Asmen Ser Yo Etud", *Bingöl Üniversitesi Yaşıyan Diller Enstitüsü Dergisi*, 8 (15): 22-39.
- Ertürk, R. (2008). "Türkiye'de Köy Sosyolojisi Literatürü", *Türkiye Araştırmaları Literatür Dergisi*, 6 (11): 185-194.
- Escarpit, R. (1992). *Edebiyat Sosyolojisi*. H. Portakal (çev.) İstanbul: İletişim Yayıncıları.
- Giddens, A. (2012). *Sosyoloji*. C. Güzel (yay. haz.) İstanbul: Kırmızı Yayıncıları.
- Harrington, A. (2019). "Sosyal Dünyanın Edebiyat Yoluyla Kavranması: Robert Musil'in Niteliksiz Adam Romanı Üzerine Sosyolojik Düşünceler", N. Çalışkan (çev.) K. Alver (der.) *Edebiyat Sosyolojisi İncelemeleri* içinde (109-123), İstanbul: İz Yayıncılık.
- İçli, G. (2011). *Sosyolojiye Giriş*. Ankara: Anı Yayıncılık.
- Jusdanis, G. (1998). *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*. T. Birkan, (çev.) İstanbul: Metis Yayıncıları.
- Karpat, K. H. (2017). *Osmanlıdan Günümüze Edebiyat ve Toplum*. G. Ayas (çev.) İstanbul: Timaş Yayıncıları.
- Kurtkan, A. (1968). *Köy Sosyolojisi*. İstanbul: İstanbul Üniversitesi Yayıncıları.
- Merrill, F. E. "Sosyolog Olarak Balzac: Bir Edebiyat Sosyolojisi İncelemesi", K. Alver ve M. Fişne (çev.) K. Alver (der.) *Edebiyat Sosyolojisi İncelemeleri* içinde (95-109), İstanbul: İz Yayıncılık.
- Moran, B. (2008). *Edebiyat Kuramları ve Eleştiri*. İstanbul: İletişim Yayıncıları.
- Sağlık, Ş. (2019). "Popüler Romanlar ve Edebiyat Sosyolojisi", K. Alver (der.) *Edebiyat Sosyolojisi İncelemeleri* içinde (251-285), İstanbul: İz Yayıncılık.
- Sapiro, G. (2019). *Edebiyat Sosyolojisi*. E. C. Gürcan (çev.) Ankara: Doğu Batı Yayıncıları.
- Tezcan, M. (1970). "Sosyolojik Yönden Köy", *Amme İdaresi Dergisi*, 3 (3): 151-182.

ŞAIRTÎYA ŞÊX ZÎYAEDDÎNÊ NORŞÎNÎ (HEZRET)

M. Zana KARAK

KURTE

Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî (Hezret) alim û miderisekî heyama dawî ya Osmanî ye. Zîyaeddîn 1856an de li navçeya Hîzana Bedlîsê hatiye dunyayê û bi leqeba “Hezret” hatiye naskirin. Zîyaeddîn herî pêşî li ba bavê xwe Şêx Ebdurrehmanê Taxî (w. 1886) perwerde bûye, paşê li ba hin alimên meşhûr ên mîna Şêx Fethullahê Werqanîsî (w. 1899) perwerdeya xwe berdewam kiriye û xilafet jî ji wî wergirtiye. Di sala 1889an de Şêx Fethullah ew bî îrşadê wezifedar kiriye. Hezret li Bedlîs û derdora wê dest bi îrşadê kiriye û paşê postnişmîya tekyaya Norşînê jî kiriye. Di silsileya terîqeta Neqşebendîya Xalidîtiyê de cihekî girîng digire û îcazeya ilm û terîqetê daye gelek kesan. Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî di Şerê Cîhanê yê Yekem de jî bi yekîneyên dildar re li dijî Rûsan şer kiriye û milekî wî jê bûye û bûye xazî. Herweha birayêن wî Mihemed Saîd û Mihemed Eşref jî di şer de şehîd bûne. Şêx Mihemed Zîyaeddîn di 1924an de wefat kiriye û gora wî li Norşînê ye. Li gorî agahîyen li ber destê me berhema ku ji nameyên wî pêk têن bi navê Mektûbatê hatiye weşandin. Heta niha ev helbest di lîteratûrê de cî negirtibû û hay ji hebûna helbestnûsiya Hezret tunebû. Di vê xebatê de em ê li ser helbesteke wî ku heta niha nehatiye weşandin bisekinin. Em ê di vê xebatê de vê helbestê ji alîyê ruxsarî û naverokî ve binirxînin û ligel destxetê metna transkirîbekirî pêşkêş bikin. Bi vê lêkolînê dê di çarçoveya Neqşebendîya Xalidîtiyê de alîyê wî yê edebî û tesewifi jî zelaltir bibe.

M. Zana KARAK, Lîsansa Bilind a Kurdî, Lêkolerê Serbixwe, / MA in Kurdish, Independent Researcher
e-mail: m.zana47@gmail.com
ORCID: 0000-0003-1681-4917

Article Type/Makale Türü:
Research Article/Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 01.08.2022
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 20.09.2022
Published / Makale Yayın Tarihi: 30.09.2022
Doi: 10.35859/jms.2022.1152016

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:
Bu makale iki taraflı kör hakem sisteme göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atif:
M.Z. [2022]. Şairtiya Şêx Zîyaeddînê Norşînî (Hezret), The Journal of Mesopotamian Studies, 7 (2), ss. 185 - 201
DOI: 10.35859/jms.2022.1152016

Peyvîn Sereke: Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî, Neqşebendî, Teyyaya Norşînê, Hezret, Şêx Fethullahê Werqanîsî

Norşinli Şeyh Ziyaeddin'in (Hazret) Şairliği

ÖZ

Şeyh Muhammed Ziyaeddin (Hazret), Osmanlı'nın son dönemlerinde yaşamış önemli müderis ve âlimlerden biridir. Ziyaeddin, 1856 yılında Bitlis'e bağlı Hizan ilçesinde dünyaya gelmiş ve "Hazret" lakabıyla tanınmıştır. Ziyaeddin ilk eğitimini babası Şeyh Abdurrahman-i Tahi'nin (ö. 1886) yanında almış, daha sonra Şeyh Fethullah-i Verkanisi (ö. 1899) gibi ünlü âlimlerin yanında eğitimine devam etmiş ve Şeyh Fethullah-i Verkanisi'den hilafetini almıştır. Şeyh Fethullah 1889'da Hazreti irşadla görevlendirmiştir, Hazret de Bitlis ve çevresinde irşada başlamış, daha sonra Norşin Dergahı postnişiniliğini de yapmıştır. Ziyaeddin, Halidî Nakşibendi tarikatı silsilesinde önemli bir yere sahip olup birçok kişiye ilim ve tarikat icazeti vermiştir. Norşinli Şeyh Muhammed Ziyaeddin Birinci Dünya Savaşı'nda gönüllü birliklerle Ruslara karşı savaşmış ve bir kolunu kaybederek gazi olmuştur. Ayrıca kardeşleri Muhammed Said ve Muhammed Eşref de bu savaşta şehit düşmüştür. Şeyh Muhammed Ziyaeddin 1924 yılında vefat etmiş ve Norşinde medfundur. Elimizdeki bilgilere göre mektuplarından oluşan eseri *Mektubat* adıyla yayımlanmıştır. Şimdiye kadar bu şiri literatüre girmemişti ve Hazret'in şairliğine dair hiçbir şey bilinmiyordu. Bu çalışmamızda onun henüz yayımlanmamış bir şiri üzerine durulacaktır. Bu çalışmamızda bu şiri şekil ve muhteva açısından değerlendirdip, şíirin transkripsiyonlu metni ve el yazmasını birlikte sunacağız. Bu çalışma ile Ziyaeddin'in Nakşî Halidilik çerçevesinde edebi ve tasavvufi yönleri ortaya çıkarılacaktır.

186

Anahtar Kelimler: Norşinli Şeyh Muhamed Ziyaeddin, Nakşibendi, Norşin Tekyası, Hazret, Şeyh Fethullah-i Verkanisi

Poetry of Sheikh Diya-ad-din Norshini (Hadhrat)

ABSTRACT

Sheikh Muhammad Diya-ad-din Norshini (Hadhrat) is a scholar and teacher of the last era of Ottoman Empire. Diya-ad-din was born in 1856 in town of Hizan of Bedlis and was known by the nickname "Hadhrat". Diya-ad-din received his first education with his father, Sheikh Abdurrahman-i Tahi (d. 1886), then continued his education with famous scholars such as Sheikh Fethullah-i Verkanisi (d. 1899) and received his caliphate from also Sheikh Fethullah-i Verkanisi. In 1889, Sheikh Fethullah appointed him as the irshad. Hadhrat started his work as a religious guidance in Bedlis and nearby settlements and later he also supervise the Dervish Lodge of Norshin. Diya-ad-din has an important place in the Khalidi Naqshbandi sect and he also gave the authorization of religious and science to many people. Sheikh Muhammad Diya-ad-din Norshini fought against the Russian troops in the First World War as a member of voluntary units and lost his arm. Also, his brothers Muhammad Said and Muhammad Ashraf were martyred in the war. Sheikh Muhammad Diya-ad-din died in 1924 and his grave is in Norshin. According to the information that we have, his work consisting of his letters was published by the name *Mektubat*. Until now, this poem had not been included in the literature and there was no awareness of the existence of Hathrat's poetry. In this work, we will focus on one of his poems that has not been published yet and we will evaluate this poem from the point of view of authorship

and content and present the transcribed text along with the manuscript. By this research, literary and mystical side of Diya-ad-din will become clearer in the context of Khalidity's tradition.

Keywords: Sheikh Muhammad Diya-ad-din Norshini, Naqshbandi, Dervish Lodge of Norshin, Hezret, Sheikh Fethullah Werqanisi

EXTENDED SUMMARY

Dozens of scholars and poets grew up in and around the Norshin Lodge, and this one played a major role in the development of religious-mystical and literary sciences. Sheikh Muhammed Ziyaeddin also went through a good education because he was the disciple and caliph of this dervish lodge.

Sheikh Muhammed Ziyaeddin (Hezret) from Norshin is one of the important professors and scholars who lived in the last periods of the Ottoman Empire. Ziyaeddin was born in the Hizan district of Bitlis in 1856 and was known by the nickname "Hezret". Ziyaeddin received his first education with his father, Sheikh Abdurrahman-i Tahi (d. 1886), then continued his education with famous scholars such as Sheikh Fethullah-i Verkanisi (d. 1899), and then from Sheikh Fethullah-i Verkanisi to the Naqshbandi order got his caliphate.

Sheikh Fethullah appointed Sheikh Mohammed Ziyaeddin with guidance in 1889. Hezret also started enlightenment in Bitlis and its environs, and later he also served as the postnîşin of the Norshin Lodge. Hezret had an important place in the Khalidi-Nakshibendi sect and gave many people knowledge and sect licenses. Sheikh Muhammed Ziyaeddin served as a guide for a total of 34 years. In addition, his students and caliphs have fulfilled the duty of guidance for many years in various regions like him. According to different sources, between 13 and 16 people received the caliphate of tariqa from the Hezret.

187

In addition to his religious and mystical personality, Sheikh Muhammed Ziyaeddin from Norshin also has a social and patriotic aspect. Hezret fought against the Russians in the First World War with his family and volunteers made up of his followers and became a veteran by losing one of his arms. In addition, his brothers Muhammed Said and Muhammed Eşref were martyred in this war. Sheikh Muhammed Ziyaeddin died in 1924 and is buried next to his father, Sheikh Abdurrahman-i Tahi, in Norshin.

In Kurdish literature, poets of the Halidi and Kurdish Principalities period wrote eulogies and elegies in different forms. Many poets wrote poems in different forms and genres around the Naqshbandi-Khalidi Lodges. An example of the poems written around lodge is mentioned in this study.

According to the information we have, the work consisting of the letters of Hezret was published under the name of Mektubat. Until now, no information was known about Hezret's poetry in the field of Kurdish literature, and none of his poems were included in the literature. As a result of this study, one of his poems was found in a journal. This poem was registered in the name of Hezret and was written under his pseudonym "Ziya".

This poem of Sheikh Muhammed Ziyaeddin was written in the form of quatrain and this poem, which consists of 16 quatrains, was written in the form of eulogy. Sufi mazmuns are also included in this poem of Hezret. This poem is also a product of dervish lodge literature, since Hezret is a product of the Naqshbandi-Khalidi convent.

When we look at this poem, it is seen that its language is not very complicated and it is an understandable language. But there are also foreign words and compositions in the poem.

In this study, his unpublished poem will be focused on. This poem of Hezret will be evaluated in terms of form and content, and the transcribed text and manuscript of the poem will be presented together. With this study, the literary and mystical aspects of Ziyaeddin within the framework of Naqshbandi-Khalidi will be revealed. In addition, this newly discovered poem will be an important data for classical Kurdish literature.

Destpêk

Roj bi roj berhemên nû yên di qada edebiyata Kurdî de derdikevin holê. Bi keşfırına materyalên nû qada edebiyata Kurdî jî berfirehtir dibe û derfeta xebat û tesbîten nû ji lêkoleran re çêdibe. Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî yek ji wan kesayetên edebî ye ku heta niha alîyê wî yê helbestnûsiyê nehatiye zanîn. Di vê xebatê de helbesteke Hezret dê bê pêşkêşkirin. Şêx Zîyaeddîn di serdemâ dawî ya Osmanî de jîyaye û ev yek jî rastî heyama Xalîdîtyê tê. Piştî serdemâ mîrektîyên Kurd, Neqşebendîtiyâ Xalîdîtyê jî rengê xwe daye edebiyata Kurdî û di edebiyata Kurdî de bizavek ava kiriye û heyamekê temsîl dike. Şêx Mihemedê Zîyaeddîn jî yek ji şêxên terîqeta Neqşebendîtiyâ Xalîdîtyê ye û murîdê Şêx Fethullahê Werqanîsî (w. 1317/1889) ye ku ew jî muderîsekî mezin û murîdê Şêx Ebdurrehmanê Taxî ye.

Li derdora Tekyaya Norsînê bi dehan alim û helbestkar derketine û ev tekyaya di pêşketina ilmên dînî-tesewîfî û edebî de roleke mezin bi cih anîye. Şêx Mihemed Zîyaeddîn jî ji ber ku murîd û xelîfeyekî vê tekyayê û paşê jî bûye postnişînê vê tekyayê di vê çarçoveya de weke alimekî vê tekyayê tê hesibandin. Lewra Hezret mehsûlê dergahêne Neqşebendî-Xalîdîtyê ye û ev helbesta wî jî mehsûlê edebiyata tekyayê ye.

Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî ev helbesta xwe ku bûye mijara vê xebatê bi mexlesa “Zîya” nivîsiyê. Ev helbesta ku nû hatiye peydakirin dê ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk jî bibe daneyeke girîng. Çarçoveya vê xebatê dê bi vê helbestê sînordar be. Lewra heta niha haya me ji helbesten wî yên dinê çenebûne û ger hebin jî hêj nehatine peydakirin. Beriya em derbasî nirxandina helbestê bibin em ê derbarê jîyan û berhemên Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî de kurteagahîyekê bidin.

1. Jîyana Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî û Berhemên Wî

1.1. Kurtejîyana Şêx Mihemed Zîyaeddîn (Hezret)

Şêx Mihemed Zîyaeddîn li gundê Usba (Uvseb-Doğrular) nahîyeya Ispahirt'a Hîzana navçeya Bedlîsê di 7ê Cemîyel Axira 1272yan (1855/56ê miladî) de hatiye dinê² (Ardîç, 2009: 29; Korkusuz, 2010: 225; Baz, 2014: 89). Navê bavê wî Şêx Ebdurrehmanê Taxî (w.1886) ye û ew jî kurê Mela Mehmûd e ku bi eslê xwe Şîrwanî ye û ew jî kurê Mela Mihemed e. (Korkusuz, 2010: 225; Yücel, 2015: 3; Başar, 2018: 4).

Şêx Mihemed Zîyaeddîn pêşî li ba bavê xwe dest bi xwendinê kiriye û tehsîla medreseyê jî pêşî li gundê Helenzeyê li ba Mela Mistefayê Helenzeyê Bedewî dest pê kiriye û paşê bi birayê xwe Ebdurrahman re li ba Şêx Fethullahê Werqanîsî xwendina xwe domandiye. Hemû tehsîla xwe li ba Şêx Fethullahê Werqanîsî temam kiriye (Yücel, 2015, r. 5) û îcazeya xwe ya ilmî jî ji wî wergirtiye. Herweha dersên tesewîfî jî pêşî li ba bavê xwe û paşê li ba Şêx Fethullahî girtiye û piştî temamkirina seyr û silûkê jî îcazeya xwe ya terîqê ji Şêx Fethullahê Werqanîsî standiye. Şêx Fethullah di 1889an de, Şêx Zîyaeddîn ji bo irşadê belav bike wezîfedar kiriye.

1 Ev navê mintiqeyekê ye ku gundê Tax û Nûrsê jî di nav de ye. Di hin çavkaniyan de weke Sibayert, Ispahart û Ispahirt jî derbas dibe. Bnr. (Başar, 2018.)

2 Li gorî Şêx Mihemed Asîmê Oxînî û Mufit Yüksel di 1273yan de hatiye dinê; li gorî Yeliz Başar 1274 (1858) de hatiye dinê. (Oxînî, 2017, r. 177; Yüksel, 2018; Başar, 2018, r. 4).

Diya bavê Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî seyîdeyeke ku ji binemala Hz. Huseyn e. Şêx Mihemed Zîyaeddîn di jîyana xwe de carekê zewicîye, ji jina wî ya Medîneyê lawekî bi navê Fethullah û keçeke bi navê Aîşeyê çêbûye. Kurê wî Fethullah berîya wefata wî bi 10-15 rojan wefat kiriye (Yücel, 2015: 117).

Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî di Şerê Cîhanê yê Yekem de ji murîdên xwe yekîneyên dildar ava kiriye û li dijî Rûsan şer kiriye û di vî şerî de milekî wî jê bûye û bûye xazî. Bi heman awayî birayên wî Mihemed Saîd û Mihemed Eşref jî di şer de şehîd bûne. Pişti şer padişahê Osmanî Mehmed Reşad jê re madalya şandiye, ew pîroz û teqdîr kiriye. Bi minasebeta xazîbûn û xizmetên wî yên di şer de jê re berat û milekî protez jî şandiye. Herweha Mistefa Kemal Atatîrk jî ji bo serfirazî û xizmetên wî behsa wî kiriye û jê re name şandiye (Yüksel, 2018; Başar, 2018: 7-9).

Şêx Mihemed Zîyaeddîn ders daye gelek kesan, herweha îcazeya terîqeta Neqsîbendiyê jî daye gelek kesan. Hezret li gorî çavkanîyên cuda di navbera 13-16 xelîfe li pey xwe hiştine³, ew jî ev in; Mela Mihemed Emînê Qursincî (Melayê Mezin, w. 1352/1933), Mela Ebdulkérîmê Sipahirtî/Hîzanî (w. 1333/1914), Şêx Ehmedê Xiznewî (w. 1369/1950), Şêx Mehmûdê Qerekoyî (Warto-Mûş, w. 1372/1953), Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (w. 1935-36), Şêx Mehmûdê Zoqeydî (Halenze-Sert, 1364/1944), Şêx Elaeddînê Werqanîsî-Oxînî (Kurê Şêx Fethullahê Werqanîsî, w. 1368/1948-49), Şêx Şehabeddînê Tîlî (nehîyeya Mûşê, w. 1326/1908), Mela Ubeydullahê Tîlî (kurê Şêx Şehabeddîn, 1345/1926), Mela Xelîlê Koxakî/Tîlî (gundê Kopa Mûşê), Mela Yûsifê Tekmanî/Hûrtî, Şêx Ebdurrehmanê Çoqreşî (w. 1929), Şêx İbrahimî Abîrî, Mela Ebbas Şûşarı, Mela Xalidê Poxâşî (gundê Reşadîyeyê) (Oxînî, 2017: 177-180; Korkusuz, 2010: 249; Yıldırım, 2018: 149-150; Yüksel, 2018; Başar, 2018: 12-13; Yücel, 2015: 88-89).

Hezret berîya wefata murşîdê xwe 10 sal û pişti wefata wî jî 24 sal bi tevahî 34 salan wezîfeya irşadê kiriye (Ziyâuddin, 1977: 9; Haznevî, 2012:18).

Şêx Mihemed Zîyaeddîn, hicrî di sala 17ê Receba 1342yan⁴ (23yê Sibata 1924) de li Norşînê wefat kiriye û di goristana bavê xwe de medfûn e (Oxînî, 2017: 177; Yüksel, 2018: Başar, 2018: 10).

Tarîxa wefata Hezret di mersîyeyên xelîfeyên wî de jî hatiye nivîsîn. Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (w.1936) li pey wefata şêxê xwe Şêx Zîyaeddîn mersîyeyek nivîsîye. Hezanî tê de bi hesabê ebcedê dîroka wefata wî weke 1342yê hicrî bi vî awayî daye nîşandan:

Di sê sed ‘erbe’în bû zem digel isneyn fuzûn bû xem
Digel elfê elif bûn em ez im goyînê sehrâê

Ev malik li gorî hesabê ebcedê dîroka wefata Şêx Zîyaeddîn dide me. Ew tarîx jî weha ye: sê sed (300) + ‘erbe’în (40) + isneyn (2) + elf (1000) = 1342yê hicrî (1923/1924 miladî). (Karak, 2021: 49). Ev agahîya di vê mersîyeyê de jî dîroka wefata wî ya 1924an piştrast dike.

3 Li gorî Şêx Mihemed Asimê Oxînî û Korkusuz yek ji16 xelîfeyen Hezret jî Mela Mistefa Zokî ye (Oxînî, 2017: 177-180).

4 Li gorî Korkusuz; Hicrî 29ê Receba 1342 û Rûmî 9ê Sibata 1940î de; li gorî İbrahim Baz di 27ê Receba 1342 (1923)yan de; li gorî Ömer Tayful Yücel jî di 27ê Receba 1341ê (15ê Adara 1923yan) de wefat kiriye (Korkusuz, 2010: 249; Baz, 2014: 89; Yücel, 2015: 118).

1.2. Berhemên Wî

Bi qasî em dizanin ji bilî berhema wî ya bi navê *Mektiûbat* ku ji 113-114 nameyên wî pêk têni berhemên wî yên din tune ne. Heta niha em rastî ti helbestêni wî jî nehatibûn ku li derekê behs jê hatibe kirin an hatibe weşandin. Lîbelê di encama xebatêni me de em di mecmû'eyekê de rastî helbestekê hatin ku ev helbest hem li ser navê wî hatiye qeydkirin hem jî mexlesa wî "Ziya" tê de heye. Ev helbesta wî jî di "mecmûeyeke helbestêni muxtelîf"⁵ de cî digire. Li gorî agahiyêni li ber destê me wekî din ti helbestêni wî neketine lîteratura Kurdi.

Di vê xebatê de dê li ser vê helbestê bê rawestîn û helbest dê ji alîyê ruxsarî û naverokî ve bê nirxandin û dê metna transkirîbekirî ya helbestê tevî destxeta wê bê parvekirin.

2. Vekolîna Helbestê

Şêx Mihemed Ziyaeddin ev helbesta xwe bi teşeya murebbe'ê ango çarîneyê û bi cûreya medhîyeyê nivîsiye. Li vir divê em pêşî vê termê bi kurtasî bidin naskirin.

Weke têgeheke edebîyatê ji wê teşeya nezmê re ku her bendeke wê ji çar risteyêni hemkêş pêk tê "murebbe'" (çarîne) tê gotin (Saraç, 2013:111). Bi gotineke din menzûmeyêni ku yekeya wan bend e, hemû bendêni wan ji çar risteyan pêk têni û ji alîyê helbestkarekî ve bi heman kêsê û bi awayekî pirserwa hatibin nivîsin, ew menzûme weke "murebbe'" tê binavkirin. Di Kurdi de bêjeya "çarîne" yê ji bo murebbe'e tê bikaranîn. Di edebîyata klasik a Rojhilatî de serwaya murebbe'ê bi awayekî giştî bi du şeweyan çê dibe: Şêweya yekem: "aaab, cccb, dddb..." e şeweya duym jî: "aaaa, bbba, ccca..." ye. Eger murebbe' tenê bi rêya serwayêni risteyen dawî bi hev ve werin girêdan, jê re "murebbe'a muzdewic" û eger digel hevbeşîya serwayê bi rêya dubarekirina riste/risteyen dawî bi hev ve werin girêdan ji vê re jî "murebbe'a mutekkerir" tê gotin (Adak, 2019: 371).

Di murebbe'an de bi piranî benda pêşî di nava xwe de bi serwa ye û sê rêzên pêşî yên bendêni dinê jî di nava xwe de bi serwa ne û herweha dîsa rêzên dawî bi benda pêşî re bi serwa ne (Saraç, 2013: 111).

Di edebîyata Kurdi de hem helbestkarêni serdema mîrekîyan hem jî yên serdema Xalîdîtîyê murebe', medhîye û mersîye nivîsiye. Li derdora Tekyayê Neqşebendîya Xalidîyê jî kesen weke Seydayê Licî, Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Şêx Mihemed Selîmê Hezanî, Şêx Fethullahê Hezroyî, Şêx İsmetullahê Karazî, Seydayê Xasî û bi dehan helbestkarêni din medhîye û mersîye (şînnname) nivîsiye.

Di edebiyata klasik a İslâmî de helbestêni ku mijara wan pesn û sîtayîş e wek "medhîye" têni binavkirin. Di medhîyeyan de bi gelempêri pesnê kesen payebilind têni dayîn ku bi piranî ew kes ji desthilatdarêni siyasi (şah, sultan, emîr û endamêni malbatêni wan ên wek xuşk, bira, dê û zarokêni wan), burokratîni dewletê (wezîr, serlesker, qadî û hwd.) kesyetenê girîng ên civakê (dewlemend, pehlewan û hwd.) û kesyet û figurêni dînî (Xweda, Pêxember, sehabî, ehlê beyta Pêxember, mela, şêx û hwd.) pêk têni (Adak, 2019: 135).

⁵ Li gorî agahiyêni ber dest ev mecmûe weke ya Mela Seid Ergin tê zanîn, mecmûe ji alîyê Mela Ehmedê Cewzi (w. 2010) ve hatiye îstinsaxkirin û tê de bi piranî helbestêni Hecî Fettahê Hezroyî hene. Xebatêni me yên li ser mecmûeyê didomin.

Di edebiyata Kurdî de ji bo mîrên mirektîyan medhîye hatine nivîsin. Piştî dawîlêhatina mîrektîyan ew valahî bi terîqetan hatine tijekirin û gelek medhîye û mersîye ji bo şêxên terîqetan hatine nivîsin. Dema em li vê helbesta Şêx Mihemed Zîyaeddîn jî mêze dikan ev yek bi zelalî tê dîtîn. Ji ber ku Hezret jî şêzekî terîqetê û peyrewê terîqeta Neqşebendîtîyê bû ev yek bandor li ser helbestnivîsîna wî jî kiriye. Şêx Mihemed Zîyaeddîn jî helbesta xwe bi cûreya medhîye nivîsiye.

Em ê li ser vê helbesta Şêx Mihemed Zîyaeddîn lêkolîna xwe ji alîyê ruxsarî û naverokî ve bikin û nirkandinê xwe pêşkêş bikin.

2.1. Ji Alîyê Ruxsarî ve

Di vê besê de em ê ji alîyê ruxsarî ve lêkolîna xwe bikin û em ê li ser teşe, kêş, serwabendî û mexlesê bisekinin.

2.1.1. Teşe, Kêş û Serwabendîya Helbestê

Ev helbesta Şêx Mihemed Zîyaeddîn bi teşeya murebbe‘ê ango bi çarîneyê hatiye nivîsin û ji 16 çarîneyan pêk tê. Kêşa vê helbestê jî ji behra remelê fa‘ilatun / fa‘ilatun (fa‘ilatun / fa‘ilun) e. Bendêñ helbestê bi 8 kiteyan hatiye sazkirin. Lêbelê hemû risteyên dawîya bendar bi 7 kiteyan hatiye sazkirin.

1. Sema eflakê e‘la î
Kewkeba necma cela î
Metleha hûsna buha î
Her tu î durra beîn

192

Şêweya vê murebbe‘ê di nav şêweyên standart de şêweya “Murebbe‘a Muzdewica Bêmetle” e. Lewra her sê risteyên pêşî yên benda yekem hemserwa ne û risteya çarem cuda ye. Di bendêñ din de ji risteyên dawî bi risteya çarem a benda yekem re hemserwa ne û risteyên berî wê jî di nav xwe de hemserwa ne. Şemaya vê şêweyê aaab, cccb, dddb ... ye (Adak, 2019: 371-376).

Em dibînin ku di vê helbestê serwaya bingehîn heye, lê paşserwa di hemû bendar de tune ye û di piranîya bendar de di her sê risteyên serê bendar de heye. Di risteyên dawî yên hemû bendêñ helbestê de “n” herfa rewîyê ye û “î” jî herfa rîdfê ye. Cureya serwaya vê helbestê jî “murdef” e. Ev serwa di dawîya riste û bendar de di navbera bêjeyên beîn, deranîn, kîn, semîn, evîn, dîn, Berîn, mubîn, kemîn, birîn, aferîn, tîn, mubîn, enwerîn û venîn de pêk hatiye.

Tê dîtîn ku di vê helbestê serwaya bingehîn “în” e û di dawîya hemû bendar de bûye serwabendî û helbest bi vê serwabendîyê bi hev ve hatiye girêdan.

2.1.2. Mexlesa Helbestkar

Di edebîyata klasîk de mexles mîna îmzeya helbestkar e û bi piramî di dawîya helbestan de mexles têñ bikaranîn. Hin helbestkaran navê xwe jî weke mexles bi kar anîne. Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî jî di helbesta xwe de mexles bi kar anîye. Di vê helbestê de mexlesa ku bi kar anîye “Ziya” ye ku ew jî ji navê wî yê rastîn pêk tê. Hezret mexlesa xwe di benda dawî ya 16em de û bi kar anîye:

16. Her du birhan da ku birq e
 Yek li xerbê yek li şerq e
 Lê Ziya' bû mest û xerq e
 Jê dicêt nal û √enîn

Tablo 1: *Hin taybetîyên ruxsarî yên helbestê:*

Helbestkar	Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî (1856 -1924)
Serdem	Sedsala 19-20. (Serdema Osmanî ya Dawî)
Herêm	Norşîn-Hîzana Bedlîsê
Ziman-Zarave	Kurdîya Kurmancî
Teşeya Nezmê	Murebbe‘
Yekeya Nezmê	Bend
Hejmara Bendan	16 Bend
Kêş, Qalib û Behra Erûzê	fa‘ilatun / fa‘ilatun (fa‘ilatun / fa‘ilun) (Behra Remelê)
Serwa (Serwabendî)	“în” Serwaya murdef e
Şemaya Serwayê	aaab, cccb, dddb, ...
Paşserwa	Di her bendê de cuda ye
Mexles û Cihê Wê	“Zîya”, Benda 16em a dawî

2.2. Ji Alîyê Naverokê ve

Di vê besê de jî em ê helbestê ji alîyê tema, ziman, uslûba helbestkar, hunerên edebî û ji alîyê kevneşopî û girîngîya wê ya di edebîyata Kurdî de binirxînin.

2.2.1. Mijar û Cûreya Helbestê

Ji metna helbestê jî xuya dibe ku cûreya vê murebbe‘ê medhiye ye. Weke ku me li jor jî anîbû ziman ji helbestên ku ji bo pesn û medhê kesekî têne nivîsîn medhiye tê gotin. Ev helbest jî bi vê cûreya medhîyeyê û bi teşeya murebbe‘ê hatiye nivîsîn

Divê em ji bo cûreya vê murebbe‘ê şerhekê jî li wir deynin. Gava ev helbesta murebbe‘ li derdora tekyayê û bi hizra tesewifê li ser eşq, hesret û veqetîna ji bo murşîdan hatibe nivîsîn, belkî em jê re bikaribin bibêjin “çarîneya tekyayê” (murebbe‘a tekyayê). Lewra divê em bizanibin ku li derdora tekyayan li gorî xisûsîyetên tekyayê bi gelek teşeyan li ser şêx û murşîdan heman mijarên medh û şînê hatine nivîsîn.

Gava em bala xwe didin kategoriya helbestên li derdora tekyayan hatine nivîsîn; em dibînin ku teşe her çiqas ji hev cuda bin jî mijar pir zêde nêzî hev in û heta piranîya wan jî tekrarên hev in, tenê navê murîd û murşîdan guherîne. Abdurrahman Adak li ser murebbe‘ên Kurdî yên qonaxa edebîyata tekyayê weha dibêje; “Piştî ku di dawîya mîrekîyan de di çarçoveya Qadirîtî û Neqşebendîtîyê de edebîyata tekyayê dest pê kiriye, êdî helbestên ku nakevin kategoriya sebkê Iraqi jî hatine nivîsîn. Di helbesta

tekyayê ya vê qonaxê de zimanê helbestê sivik bûye û hêmanên sebkê Iraqî hinekî hatine terikandin. Bi qasî ku tê dîtin di vê qonaxê de murebbe‘ jî wek teşeyeke nezmê belav bûye. Di van murebbe‘an de hinekî jî li pey şopa Feqîyê Teyran zimanekî sade hatiye bikaranîn. Lîbelê li ser mijarêni bi tekyayê ve girêdayî hatiye rawestan ku di murebbe‘en Feqî de nayêن dîtin” (Adak, 2019:572).

Di ekola Neqşebendîya Xalidîtîyê de di navbera murîd û murşîdan de têkilîyeke cuda heye ku ev yek di helbestan de dişibe têkilîya di navbera ‘aşiq û meşûqan. Adak ji bo xezelêni bi vî rengî dibêje “xezela tekyayê” (Adak, 2019: 227-229). Ger ev helbest jî li ser medh û hezkirina ji bo şêx hatibe nivîsin û em vê binavkirina Adak jî li ber çavan bigirin, em dikarin ji vê cûreyê re jî bibêjin “murebbe‘a tekyayê”. Lewra di vir de jî em dikarin medh û hezkirina li ji bo murşîd bibînin û ev hezkirin di derecaya eşqê de, di asta eşqa tesewifi de tê xuyakirin. Di vê helbesta Zîya de mezmûnen tesewifi jî li pêş in. Lewra helbest mehsûleke edebîyata tekyayaê ye.

8. Qibleya qible-nenasan
Ke‘beya Ke‘be-şinasan
Muğrema cinn û we nasan
Lê nezer heddê mubîn
9. Lê nezer helle hîlal e
Ew hîyata ruhî li bal e
Pertewê nûr û cemal e
Lew di cebhe der kemîn

Şêx Mihemed Zîyaeddîn di vê medhîyeyê de mühtemelen pesnê şêxê xwe daye, lîbelê ew bi nav nekiriye. Lê ev evîndara ku şair li ser dinale em texmîn dikin ku ew murşîdê wî ye ango şêxê wî yê terîqê ye.

3. Dil ji bo wê dil-ruba’ î
Mebde’ê cewr û cefa’ î
Menşea şewq û şefa’ î
Her bi cehd û se‘y û kîn
5. Xeste’ê wechê di mest im
Bulbulê gulşen perest im
Hulle’ê fexrê dibestim
Min diye meyl û evîn
10. Cubhet û dêmê bi xal e
Zilfê reş ser da bimale
Dil li ser da’im dinale
Ew tijî daş û birîn
11. Ew tijî daş û elem bû
Lew şehîfe tev reqem bû

Ebr û mijganê qelem bû
Herf û noqte aferîn
12. Noqte û reyhan û lale
Bisk û zilfan wê li bal e
Ew kemenda ibnî Zal e
În li Hesen Huseyîn

Ji van benda jî bi zelalî xuya dibe ku murîd gava pesnê murşîdê xwe dide mîna ku teswîra keçkeke delal dike û ew her tim li ser dinale. Bi îfadeya “Hesen Huseyîn”ê ve jî atifi ehlê beytê kiriye û me berê jî li jor behs kiribû ku diya Hezret jî vê binemalê ye.

Ev medhê li vir jî dîsa di çarçoveya têkilîya murîd û murşîdîtyê de ye. Murîd murşîdê xwe weke dilbereke weke me’sûqekê dibîne, lê ev dîtin di çarçoveya tesewifê de ye, ne mîna evîneke di navbera keç û xortekî de be.

2.2.2. Ziman û Uslûba Helbestkar

Gava em li vê helbestê dinihîrin em dibînin ku zimanê wî zêde ne girift e, lêbelê bêje û terkîbêni biyanî jî tê de hene. Hezret ji bilî zimanê dayikê Kurdî zimanê Erebî jî dizanîbû û hay ji Farisî jî hebûye. Tesîra Farisî û Erebî kêm be jî di helbesta wî de xuya dibe. Zimanê wî yê di helbestê de ne zimanekî giran e, lewra helbest ji bilî çend bêjeyên Erebî û Farisî zimanekî sade û zelal e. Di hin risteyên helbestê de bêje û terkîbêni Farisi û Erebî weha ne: “În li Hesen Huseyîn”, “Tîn û wel-necm û subhan”.

195

Uslûba wî herikbar e û ev unsûrên ahengê jî müsîqîyek xweş di helbestê de ava kirine. Em dikarin bibêjin pênuşa helbestkar xurt e û risteyên wî jî ji alîyê edebî ve têr û tîje ne. Lewra gelek cûre ji hunerên edebî ve di helbestê de hatine bikaranîn.

8. Qibleya qible-nenasan
Ke'beya Ke'be-sinasan
Muğrema cinn û we nasan
Lê nezer hedî mubîn

Di van risteyan de jî hakimîyet û herikbariya zimanê helbestkar xwe dide der.

2.2.3. Ciwankarîya di Helbestê de

Helbestkar bi uslûb û hunerên edebî yên weke telmîh, îstî‘are, teşbîh, telmî‘, nîda, alîterasyon û hwd. ve helbesta xwe xemilandiye. Di helbestê de gelek cûreyên ciwankarîyê hene, em ê ji wan çend nimûneyan li vir nîşan bidin:

12. Noqte û reyhan û lale
Bisk û zilfan wê li bal e
Ew kemenda ibnî Zal e
În li Hesen Huseyîn

Di vê bendê de ji bo ew taybetîya Rustemê Zal ku bi mîrxasî û pehlewanîya xwe ve navdar e, atif

heyeango li vê derê hunera telmîhê derketiye holê. Dîsa bi Hesen û Huseyîn jî dîsa atifek ji bo ehlê beytê heye. Herweha bi bêjeyên “reyhan û lale” û “bisk û zilf’ê jî hunera tenasubê pêk hatiye.

8. Qibleya qible-nenasan
Qe'beşa Qe'be-şinasan
Muğrema cinn û we nasan
Lê nezer heddê mubîn

9. Lê nezer helle hîlal e
Ew heyata ruh li bal e
Pertewê nûr û cemal e
Lew di cebhe der kemîn

Di benda 8an de bi tekrara herfîn “q” û “b”yê û di vê benda 9an de jî bi tekrara herfîn “h”, “l” û “r”yê alîterasyon çêbûye û bi herfa “e”yê jî asonans derketiye holê. Herweha di heman benda 8an de bi bêjeyên “Qible” û “Qe'be”yê jî hunera tekrîr û tenasubê derketiye holê.

1. Sema eflakê e'la î
Kewkeba necma cela î
Metleha hûsna buha î
Her tu î durra beîn

Di vê bendê de jî şibandina bi asîman, eflak û stêrkên biriqandî heye, lîbelê kesê hatiye şibandî nehatiye bilîvkirin û iştîareya vekirî derketiye holê.

2. Ew ciwan durra yetîm e
Şorgula başê cesîm e
Dilber î 'erşê 'ezîm e
Dil ji bonê deranîn

Di vê bendê de jî bi şibandina ciwan ya bi durra yetîm û baxê cesîm ve hunera teşbîhê derketiye holê. Dîsa di benda 11em de jî mijank û birûyên yarê bi qelemê hatiye şibandin. Di benda 15em de jî dêm ango hinarike û jî bi hilal ango bi heyvî re hatiye şibandin.

13. Lew ew in mi'rac û müşkat
Hem li dil seyqal û müşfat
Wan işaret da gemîşkat
Her ew in me'nê ji tîn
14. Tîn û wel-necm û subhan
Tev bi wan remzan ku 'irfan
Ger hebit dê bit bi herfan
Zahirî xeṭṭê mubîn

Di navbera bendên 1, 2, 3, 4 û 8, 9, 10, 11, 12 û 15 û 16an de jî hunera iadeyê derketiye holê. Lewra bêje û ifadeya ku bend pê qediyaye dîsa ew bêje an ifade di serê benda peyrew de jî cî girtiye.

9. Lê nezer helle hîlal e
Ew heyata ruh li bal e
Pertewê nûr û cemal e
Lew di cebhe der kemîn

Pertew û nûr di heman maneyê de ne û hunera teradufê pêk anîne. Dîsa di vê bendê de bi “Ew ھeyata ruh li bal e”yê ve hunera mubalexeyê jî pêk hatiye.

2.2.4. Kevneşopîya Helbestê

Ev helbesta bi teşeya murebbe‘ê bi kevneşopîya têkiliya di navbera murîd û murşîdîyê de hatiye honandin. Di ekola Neqşebendîtiya Xalidîtiyê de têkiliyeke hézdar a murîd û murşîdîtyê heye û pîr û murşîdê terîqetê ji murîd re mîna evîndarekê ye, di vê helbestê de jî ev yek xuya dike. Helbestkarênu ku li derdora tekyayan mezin bûne piranîya wan murebbe‘ û qesîdeyên medh û şînê yên bi vî rengî nivîsîne. Ev helbest yek jî nimûneya vê kevneşopîyê ye. Di helbestê de jî unsûr û mezmûnên tesewifî li pêş in û helbest li dora tekyayê hatiye nivîsîn û di kategorîya helbesta terîqî de dikare bê nirxandin.

2.2.5. Girîngîya Helbestê

Ev helbesta Zîya heta niha nebûbû mijara lêkolînê û di nav lîteratura edebîyata Kurdî de cî negirtibû. Ev helbesta wî alîyê wî yê terîqetê yê di nav ekola Neqşebendîtiya Xalidîtiyê de jî nîşan dide û bi heman kevneşopîyê ve wî jî ji bo şêxê xwe medhîye nivîsîye û edîbbûna wî bi vê helbestê derketiyê holê.

Ji vê helbestê jî tê fahmkirin ku Hezret jî weke alim û şairekî heyama xwe tevgerîyaye û di çarçoveya kevneşopîya ekola Neqşebendîtiya Xalidîtiyê de helbesta tesewifi-terîqî nivîsîye. Ji alîyê ziman û edebî ve jî helbesta wî serkeftî û herikbar e. Lewra hem unsûren edebîyata klasîk û çanda kevneşopîya tekyayan di helbesta wî de bi zelalî xuya dibin, hem jî telmîh di serî de gelek hunerên edebî di helbesta xwe de bi kar anîne.

Tablo 2: *Hin taybetîyen helbestê yên naverokî:*

Helbestkar	Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî (1856 -1924)
Cûreya Nezmê	Medhîye
Ji Alîyê Naverokê	Medh û pesnê şêxê xwe kiriye
Mijar	Medhê şêxê xwe
Tema	Pesn û hezkirina ji bo şêx

3. Metna Transkirîbekirî ya Helbesta Zîya

Me ji nusxeya destxet ev helbesta Şêx Zîyaeddîn (Zîya) bi elîfbêya transkirîpsiyona navneteweyî nivîsî. Ligel elîfbêya veguheztî me hin fîkr, îzah û tesbîtên xwe jî di jêrenotan de nîşan dan.

El Mola Hezret Zîya’eddîn (quddîsesirruh)

1. Sema eflakê e’la î
Kewkeba necma cela î
Meşleha hûnsa buha î
Her tu î durra beîn

2. Ew ciwan durra yetîm e
Şorgula başê cesîm e
Dilber î ‘erşê ‘ezîm e
Dil ji bonê deranîn

3. Dil ji bo wê dil-ruba’ î
Mebde’ê cewr û cefa’ î
Menşeа şewq û şifa’ î
Her bi cehd û se‘y û kîn

4. Her bi cehd û se‘y û tîlb e
Dil digel cisman bi hîrb e
Şuhbeta wî şerq û xerb e
Xeste’ê wechê semîn

5. Xeste’ê wechê di mest im
Bulbulê gulşen-perest im
Hulle’ê fexrê dibestim
Min diye meyl û evîn

6. Hulle’ê fexrê dipoşim
Lew ji meylê mey dinoşim
Her bi vî rengî dicoşim
Min çi xem dinya û dîn

7. Min tu nîne xof û tîrs e
Ger li min carek bipurse
Min qedem ew weqt li Quds e
Qibleya weqtê Berîn

8. Qibleya qible-nenasan
Qe‘beya Qe‘be-şinasan
Muğrema cinn û we nasan
Lê neżer heddê mubîn

9. Lê neżer helle hîlal e
Ew hîyatâ ruh li bal e
Pertewê nûr û cemal e
Lew di cebhe der kemîn

10. Cubhet û dêmê bi xal e
Zilfê reş ser da bimale
Dil li ser da 'im dinale
Ew tijî daş û birîn

11. Ew tijî daş û elem bû
Lew şehîfe tev reqem bû
Ebr û mijganê qelem bû
Herf û noqte aferîn

12. Noqte û reyhan û lale
Bisk û zîlfan wê li bal e
Ew kemenda ibnî Zal e
În li Hesen Hüseyîn

13. Lew ew in mi^crac û müşkat
Hem li dil şeyqal û müşfat
Wan işaret da gemişkat⁶
Her ew in miğnê ji tîn⁷

14. Tîn û wel-necm û we subhan
Tev bi wan remzan ku 'irfan
Ger hebit dê bit bi ḥerfan
Zahirî xetîtê mubîn

15. Ger bixwahî xetît û xalan
Tu nezer de l' dêm-hilalan
Neynika şahib-cemalan
Her du dêmê enwerîn

16. Her du birhan da ku birq e
Yek li ḫerbê yek li şerq e
Lê Žiya' bû mest û ḫerq e
Jê diçêt nal û ḫenîn

⁶ Ev bêje tam nehat fahmkirin.

⁷ Ev dibe ku "Her ew in meōnê ji tîn" be ji.

ENCAM

Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî muderis û alimekî rojhilatî ye û di heyama dawî ya Osmanî de jîyaye. Wî jî di çarçoveya murîd û murşîdiyê de helbest nivîsiye. Heta niha ji bilî *Mektûbatâ* wî li ti derê em rastî ti berhem û helbesteke wî nehatibûn. Di encama lêkolînê de helbesteke wî ku berîya niha me ew li derekê nedîtibû ket destê me. Şêx Mihemed Zîyaeddîn di vê helbestê de pesn û methê şêxê xwe anîye ziman.

Di vê helbestê de bi zelalî xuya dibe ku ev helbest a Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî ye. Lewra ev helbest hem li ser navê wî hatiye qeydkirin û hem jî di benda dawî de mexlesa wî “Zîya” heye. Bi vê helbestê Şêx Mihemed Zîyaeddînê Norşînî jî weke şair kete nav lîteratura Kurdî ku wî jî bi şêweya klasîk helbest nivîsiye.

Helbest ji 16 bendan pêk tê û bi teşeya murebbe‘ê hatiye nivîsin û şêweya vê murebbe‘ê di nav şêweyên standart de şêweya “Murebbe‘a Muzdewica Bêmetle” e. Cûreya wê jî medhîye ye, lêbelê em ji bo cûreya helbestê şerhekê datînin û em dibêjin ev dikare bibe murebbe‘a tekyayê jî. Çunkî ev yek dê bi xisûsîyetekede edebîyata tekyayê ve girêdayî be û em dibêjin çawa ku xezela tekyayê heye, bi vî awayî dibe murebbe‘a tekyayê jî hebe. Herweha helbesten bi teşeyen din ên weke terkîbbend, tercîbend û muxemmes jî li derdora tekyayan li ser murşîdan hatine nivîsin û ew helbest jî li gorî cûreya xwe bi van navan dikarin bêñ binavkirin. Weke xezela tekyayê û çarîneya tekyayê.


Cavkanî

200


- Adak, A. (2019). *Teşeyen Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.
- Ardıç, M. (2009). *Bidlis ve Çevresinde Yetişen Mutasavvıflar ve Tasavvuf Kültürüün Oluşması*, Van: Basılmamış Yüksek Lisan Tezi, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Temel İslam Bilimleri Anabilim Dalı, Tasavvuf Anabilim Dalı.
- Başar, Y. (2018). *Nakşibendi-Halidi Şeyhi Muhammed Ziyaeddin Nurşînî'nin Hayati ve Mektubatındaki Tasavvufi Görüşleri*. Çorum: Basılmamış Yüksek Lisan Tezi, Hitit Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Temel İslam Bilimleri Anabilim Dalı.
- Baz, İ. (2014). *Osmanlı'dan Cumhuriyet'e Norşîn Dergâhi ve Şeyh Abdurrahman-ı Tâğı*, Tasaffuv Dergisi, (34), 75-110.
- Ergin, S. (?). Fotokopîya Nusxeye *Mecmû'eya destxet* (Amd. Miftiyê Çinarê Mela Seîd Ergîn, Mustensîx: Mela Ehmedê Cewzî), n. r. 234-235.
- Haznevî, Ş. A. (2012). *Hazret ve Şah-ı Hazne Hayat ve Menkibeleri*, İstanbul: Semerkand Yayınları.
- Karak, M. Z. (2021). *Qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî*. Kurdiyat , (3) , 41-66.
- Korkusuz, M. Ş. (2010). *Nehri'den Hazne'ye Meşayîhi Nakşibendi*, İstanbul: Pak Ajans.
- Oxînî, Ş. M. A. (2017). *Birket'l-Kelimat Menkabeler Havuzu*, (Çev.: Kadri Yıldırım), İstanbul: Avesta Yayıncıları.
- Saraç, Y. (2013). *Klásik Edebiyat Bilgisi; Biçim-Ölçü-Kafîye*, İstanbul: Gökubbâe Yayınları.
- Yıldırım, K. (2018). *Kürt Medreseleri ve Alimleri-Tekkelere Bağlı Medreseler*, Cilt: 2, İstanbul: Avesta Yayıncıları.
- Yücel, Ö. T. (2015). *Şeyh Muhammed Diyyâuddîn'in Hayatu Ve Tasavvufi Görüşleri*. Ankara: Basılmamış Yüksek Lisan Tezi, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Temel İslam Bilimleri (Tasavvuf Anabilim Dalı).
- Yüksel, M. (2018). *Şeyh Abdurrahman Et-Tahi Ve Şeyh Muhammed Ziyâuddîn*, (<https://mufity.blogspot.com/2018/09/seyh-abdurrahman-et-tahi-ve-seyh.html>)(Erişim:31.07.2022).
- Ziyâeddîn, Ş. M. (1977). *Mektûbat*, (Trc. Hasib Seven), İstanbul: Yaylacık Matbaası.

PÊVEK

Pêvek 1: Destxeta helbesta navborî



201



NECİB MAHFÜZ'UN "ŞEHRU'L-'ASEL" ADLI ÖYKÜSÜNÜN YİTİRİLEN DEĞERLER BAĞLAMINDA TAHLİLİ

Tahir ARAZ, Doktora Öğrencisi, Atatürk Üniversitesi Arap Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı / PhD. Candidate, Atatürk University, Arabic Language and Literature
e-mail: tahiraraz@hotmail.com
ORCID: 0000-0002-0225-128X

Article Type/Makale Türü:
Research Article/Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 18.07.2022
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 16.09.2022
Published / Makale Yayın Tarihi: 30.09.2022
Doi: 10.35859/jms.2022.1145282

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:
Bu makale iki taraflı kör hakem sisteme göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atırı:
Araz, T. [2022]. Necib Mahfuz'un "Şehru'l-'Asel" Adlı Öyküsünün Yitirilen Değerler Bağlamında Tahlili, The Journal of Mesopotamian Studies, 7 (2), ss. 202 - 218
DOI: 10.35859/jms.2022.1145282

Tahir ARAZ

ÖZ

Arap edebiyatında hayatının tamamını roman ve öyküye adayarak roman türünün bu edebiyatta kökleşip itibar görmesinin en etkin yazarlarından sayılan Necib Mahfuz'un, her iki türün de şiirle eşdeğer tutulmasındaki büyük katkısı tüm eleştirmenler tarafından kabul görmektedir. Mısır'da tercüme çalışmalarıyla birlikte zemin bulan modern nesir türlerinin birer şube olmasının önündeki engebeli yolları aşan Mahfuz, özellikle romanın başlangıç, olgunlaşma ve zirve dönemlerini bizzat yaşamış birisi olarak Arap edebiyatında bu türün tartışmasız en büyük yazarlarındandır. Bu çalışmada eserlerinde olaylara geniş bir çerçeveden bakabilme yetisine sahip, 20.yy. Mısır toplumunun temel değerlerinde aksayan yanları dile getiren yazarın, modern roman tekniklerini esas aldığı tavriyla, sıradan, öğütvari ve propagandacı tarzdan uzak; dönemin ve Arap toplumunun gerçeklerine dokunan bir anlayışla kaleme aldığı "Şehru'l-'Asel" adlı öyküsünün tahlili yapılarak, sosyokültürel tartışmalar odaklı, eleştirel bir perspektifle değerlendirilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Arap edebiyatı, Necib Mahfuz, Şehru'l-'Asel, Yitirilen Değerler.

Analyzing the Story of Necîb Mahfuz "Shehru'l-'Asel" in the Context of the Lost Values

ABSTRACT

Naguib Mahfouz, who is considered one of the most influential writers in Arabic literature, devoting his whole life to novels and short stories, is accepted by all critics as his great contribution to equating both genres with poetry. It has overcome the rough roads that prevent the modern prose genres, which found ground with the translation studies in Egypt, to become a branch. Mahfouz is one of the greatest writers of this genre in Arabic literature, especially as someone who has personally experienced the beginning, maturation and peak periods of the novel. In this study, with ability to look at events from a wide perspective in his works, the author expresses the flaws in the basic values of Egyptian society at the 20th century, with his attitude based on modern novel techniques which is far from ordinary, advice-like and propagandist. The analysis of his story "*Shehru'l-'Asel*", which he wrote with an understanding that touches the realities of society, was evaluated with a critical perspective focused on socio-cultural conflicts.

Keywords: Arabic literature, Naguib Mahfouz, *Shehru'l-'Asel*, Lost Values.

EXTENDED SUMMARY

- . (1999). Necîb Mahfûz'un Kısa Hikâyelerinde Bazı Temalar. Erzurum: *Ekev Akademi Dergisi*, (4), 135-145.
- Zeydân, Corcî. (2013). *Târihu âdâbi'l-lugati'l-'Arabiyye*. Kahire: Hendâvi Neşriyat.
- ez-Zeyât, Ahmed Hasan. (2013). *Târihu'l-edebi'l-'Arabi*. Kahire: Dâr Nehdat Mîsrlî't-tibâ'â ve'l-neşr.

Tahir Araz

Necîb Mahfûz'un "Şehru'l-'Asel" Adlı Öyküsünün Yitirilen Değerler Bağlamında Tahlili

219

Kenan Subaşı, Dr., Zanineha Mardin
Artukluyê, Enstitûya Zimanê Zindî yên li
Tirkîyeyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdi/Mardin
Artuklu University, Intitute of Living Languages
Kurdish Language and Culture Departmant,
Mardin, Turkey
e-mail: kenansubasi@artuklu.edu.tr
ORCID: 0000-0001-7744-1646

Aydın Meral, Xwendekarê Lîsansa Bilind,
Zanineha Mardin Artukluyê, Enstitûya
Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Beşa Ziman
û Çanda Kurdi / MA Student, Mardin Artuklu
University, Intitute of Living Languages Kurdish
Language and Culture Department, Mardin,
Turkey
e-mail: meralofmeral@hotmail.com
ORCID: 0000-0003-0015-7705

Bahattin Akhan, Xwendekarê Lîsansa Bilind,
Zanineha Mardin Artukluyê, Enstitûya
Zimanê Zindî yên li Tirkîyeyê, Beşa Ziman
û Çanda Kurdi / MA Student, Mardin Artuklu
University Intitute of Living Languages Kurdish
Language and Culture Department, Mardin,
Turkey
e-mail: bhdnkhn@gmail.com
ORCID: 0000-0003-3600-9050

Article Type/Makale Türü:
Research Article/Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 04.08.2022
Accepted / Makale Kabul Tarihi: 19.09.2022
Published / Makale Yayın Tarihi: 30.09.2022
Doi: 10.35859/jms.2022.1156114

Değerlendirme ve İntihal/Reviewing and Plagiarism:
Bu makale iki taraflı kör hakem sisteme göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir. Makale intihal.net adlı intihal sitesinde taranmıştır. / This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by intihal.net plagiarism website.

Citation/Atıf:
Subaşı, K.; Meral, A.; Akhan, B. [2022]. Elaeddîn Seccadî û Nirxandina Çîrokên Wî Yêñ Ji Bo Zarok û Nûciwanan Li Gor Pîvanêñ Edebiyata Zarokan, The Journal of Mesopotamian Studies, 7 (2), ss. 220 - 242
DOI: DOI: 10.35859/jms.2022.1156114

ELAEDDÎN SECCADÎ Û NIRXANDINA ÇîROKÊN Wî YÊÑ JI BO ZAROK û NÛCIWANAN LI GOR PÎVANÊñ EDEBÎYATA ZAROKAN

Kenan Subaşı - Aydın Meral - Bahattin Akhan

KURTE

Edebiyata zarok û nûciwanan weku binbeşeke edebîyata modern digel vebûna dibistanê modern dest pê kir û amanca sereke di serî da her çiqas perwerdekirina zarokan û hînkirina wan a xwendinê be jî îroj bi gelek rîş û şaxêñ xwe ev celeb edebîyat bûye qadeke berfireh û pirberhem. Ji ber ku mafê Kurdan ê perwerdeyê heyâ îroj jî nehatîye dayîn yan jî lokal û parçekirî bûye, xwînerîya di temenê zarokatîyê da jî gelek qels maye. Bivê nevê vê yekê tesîreke nerêñî li geşekirina edebîyata zarokan a bi Kurdi kirîye. Digel vê tesîra nerêñî bi taybetî li başûrê Kurdistanê ji ber hebûna perwerdeyê ya bi zimanê Kurdi hin rê û derî li pêş afirandina vê qadê vebûne û xisûsen ji alîyê helbest û çîrokan ve. Di nivîskarîya çîrokên zarokan da Elaeddîn Seccadî çîroknûsekî pêşeng e ku bûye mijara vê meqaleyê. Wî di salêñ 1940î da şes çîrok ji bo zarokan nivîsîne ku di vê meqaleyê da ev şes çîrok li gorî pîvanêñ edebîyata zarokan hatîye nirxandin. Berî nirxandinê pêkarêñ edebîyata zarokan, mijar û rîbaza xebatê jî hatiye neqilkirin. Di encama nirxandinê da kifş bû ku Seccadî, li gorî ruhê serdema xwe di nav qalibêñ rastbîniya şikilî ya zarokan da çîrok nivîsîne ku em bi rahetî dikarin bibêjin hemkûfê çîroknûsêñ neteweyêñ di dewra xwe da bûye.

Bêjeyêñ Sereke: Edebiyata Zarokan, Çîrok, Elaeddîn Seccadî, Perwerde, Rastîya Zarokan.

Alaaddîn Seccadî'nin Çocuk ve İlk Gençlik Öykülerinin Çocuk Edebiyatı Ölçütlerine Göre Analizi

ÖZ

Çocuk ve ilkgençlik edebiyatı modern edebiyatın bir alt dalı olarak modern okulların açılmasıyla başladı ve temel amacı her ne kadar çocuk eğitimi ve okuma pratiği olsa da bugün birçok açıdan bu edebiyat türü geniş bir sahaya yayıldı ve çok fazla eser üretti. Kürtlerin eğitim hakkı bugüne kadar verilmediği ve onlardan esirgendiğinden ya da bölgesel ve parça parça bir bütün olarak verilmediğinden Kürtçenin çocuk okurları ciddi bir kitle haline gelememişlerdir. Böyle bir durum ister istemez Kürt çocuk edebiyatının gelişimini olumsuz yönde etkilemiştir. Bu olumsuz koşullara rağmen Kurdistan'ın güneyinde var olagelmiş Kurtçe kısmı eğitim olanaklarından dolayı çocuk edebiyatında özellikle de öykü ve şiir alanında birçok esere rattachmak mümkündür. Bu örneklerden biri çocuk öyküleri yazarlığında öncü bir kişilik olarak ön plana çıkan Alaaddîn Seccadî bu makalenin konusu olmuştur. Seccadî 1940'larda çocuklar için altı öykü kaleme almış ve bu makalede bu altı öykü çocuk edebiyatı ölçütlerine göre değerlendirilmiştir. Değerlendirmeden önce çocuk edebiyatı unsurları, çalışmanın konusu ve yöntemi de açıklanmıştır. Değerlendirmemiz sonucunda Alaaddîn Seccadî'nin yaşadığı dönemin ruhuna göre biçimsel çocuk gerçekliği çerçevesinde öykülerini yazdığını tespit edilmiş ve bu anlamda onun kendi dönemindeki diğer ulusların çocuk öyküleriyle benzer olduğu görülmüştür.

Anahtar Kelimeler: Çocuk Edebiyatı, Öykü, Alaaddîn Seccadî, Eğitim, Çocuk Gerçekliği.

221

Analysis of Alaaddin Seccadi's Children's and Early Youth Stories According to Children's Literature Criteria

ABSTRACT

Children's and early youth's literature have started as a subbranch of modern literature at the modern schools and although its first goal that children education and reading practice implementation today in many ways this variety of literature expanded to a large area and it produced lot of works. Since the Kurds have not been given the right to education or because they have not been given locally and piecemeal as a whole, Kurdish children's readers have not become a serious mass. Such a situation inevitably affected the development of Kurdish children's literature negatively. Despite of these bad conditions on south Kurdistan which has usual a partial education due to we can encounter lots of works –especially stories and poems- at children's literature. Content of this article is that one of a personality Alaaddin Seccadi who avant garde at the authorship of stories of children. Seccadi wrote six stories for children in the 1940s and in this article these six stories evaluated according to criterion of children literature. Before the evaluation, the elements of children's literature, the subject and method of the study were also explained. At the result of our assessment determined Allaadin Seccadi wrote his stories as like his period mind which has stylistic of children reality frame and been seem that he had similarity with other nations storyteller of child who at the same term with him.

Keywords: Children's Literature, Story, Alaaddin Seccadi, Education, Child Reality.

EXTENDED SUMMARY

Children's and early youth's literature have started as a subbranch of modern literature at the modern schools and although its first goal that children education and reading practice implementation today in many ways this variety of literature expanded to a large area and it produced lot of works. Since the Kurds have not been given the right to education or because they have not been given locally and piecemeal as a whole, Kurdish children's readers have not become a serious mass. Such a situation inevitably affected the development of Kurdish children's literature negatively. Despite of these bad conditions on south Kurdistan which has usual a partial education due to we can encounter lots of works –especially stories and poems- at children's literature. Content of this article is that one of a personality Alaaddin Seccadi who avant garde at the authorship of stories of children. Seccadi wrote six stories for children in the 1940s and in this article these six stories evaluated according to criterion of children literature. Before the evaluation, the elements of children's literature, the subject and method of the study were also explained. The contextual and linguistic features that should be found in a children's literature work are explained in general in the introduction. The information in the introduction part has been determined by generally accepted children's literature researchers and are the criteria determined for the emergence of a successful children's work. While evaluating Aladdin Seccadi's stories, these criteria were taken into account to the maximum extent. While determining the method, these criteria were used again and they were repeated while evaluating them in terms of theme, character and plot, which are the main elements that should be in a narrative. In addition, the stories were also evaluated in terms of child reality and child relativity principles. Language evaluation, which is an important evaluation criterion, was made according to the Dale-Chall formulation and the criteria determined by the Turkish Education Board. In addition, in the context of the subject of the research, we briefly included the life, works and literary background of Alaaddin Seccadi. Beyond all the evaluations, we must state that Alaaddin Seccadi lived in a period when modern Kurdish literature was in its infancy. He lived in a period when works in the style of stories and novels, which are examples of fictional literature, were untouched. Therefore, in our opinion, Aladdin Seccadi's attempt to write stories for children in such a period is an admirable intellectual stance in itself. In this respect, he is a personality beyond his time. However, when we look at the content and linguistic evaluation of the stories, we can come to the following conclusion in general. Aladdin Seccadi's stories are works written with the concern of educating children. Because, in the content of the stories, we are aware of the issues that the adults worry about the children and their presentation style rather than the children's point of view, concerns and feelings. This type of literary writing coincides with the formal child reality stage in children's literature studies. At this stage, the author chooses to convey, in an authoritative and didactic manner, the perspectives of the family, society or educational institutions towards the child, and what they desire for the children, rather than the child. For this reason, when we compare the stories with the reality of today's children's literature and the child's point of view, we have to admit that there are not enough and strong fictions and works. Although the selected themes are up-to-date, the working style of the themes is far from today's approach to children or artistic and educational reality. Nevertheless, as a final word, we can easily convey the claim that Alaaddin Seccadi wrote his stories within the framework of formal children's reality according to the spirit of the period in which he lived, and in this sense, he was similar to the children's story writers of other nations of his time.

DESTPÊK: EDEBÎYATA ZAROKAN Û PÊKARÊN WÊ

Edebîyata zarok û nûciwanan, ji hêla amancê xwe ve ji edebîyata mezinan¹ cuda ye. Di edebîyata mezinan da amanc ne ew e ku kesayetinan ji serî de saz bike, lê di ya zarokan da mebest ew e bêyî ku xweserîya zarokan xerab bike, wan ji hêla ziman, etîk, xwenasîn, civakîbûn û afirînerîyê ve bi pêş da bibe. Dema ku xebat ji bo vê amancê hatin kirin, divê naveroka pirtûkan ji hêla bedewkarîyê ve hêja be û li gorî rastî û ïzafiyeta zarokan be.

Rastî û ïzafiyeta zarokan du têgehêne sereke ne. Ev her du têgeh bingeha edebîyata zarokan saz dike û ji bo nivîskar, rexnegir û xwîneran dibe rôberek². Nivîs û edebîyata ji bo zarokan bêyî nasîna zarokan serkeftineke mayînde bi xwe ra nabe serî. Dîtin, hezkirin, helwest û tevgerên zarokan xwedîyê taybetmendîyên xwemal in. Nêrînên otorîter, amojgar û nêzîkbûna li gorî aqlîyeta mezinan, zarokan ji xwe dûr dike. Ji ber wan sedem û rewşan, nivîskarênu ku amanca nivîsîna ji bo zarokan danîne pêş xwe divê zarok, zarokañ, ziman û ramanêñ zarokan ji nêz ve nas bikin. Heya ji wan hat divê nêzî hîs û helwesta zarokan bibin di dema nivîsandina berhemekê da.

Edebîyata zarokan, divê kesayetên wisa biafirîne da ku bikarin bi xwe biryarêñ xwe bidin û bikarin berpirsîyarîya biryarêñ xwe jî ragirin. Herwiha di biryardayînê da xeta hîs û aqil ji hev derînin (Sever, 2003: 14-15). Yanî dema zarokan berhemeke edebîyata zarokan xwend, divê di wan da tovê kesayeteke bi vî rengî şîn bibe.

Norton dibêje ne mimkûn e heyâku têghiştina dîtbarî û bihîzbarî bi pêş nekeve meriv ji peyamên edebiyatê têbigihêje û herwiha heyâzêhn û bîra meriv nekemile jî peywendîya di nav rûdan û karakteran da zehmet e saxlem bê sazkirin. Li gorî wî di pêşveçûna ramanî da rol û erka edebîyatê giring e. Bi taybetî edebîyata zarokan derfeta “çavdêri”, “berawirdkarî”, “dabeşkirin”, “peyikîn” û “rexnekirin”ê dide zarokan da ku ji hêla muhakeme û fikirîn û tişîn bingehîn ve bi pêş da biçin. (Norton, 1999 vghz. Sever, 2003: 39)

Edebîyata zarokan divê bi mebesteke taybet bê afirandin. Ev mebest divê ne tundîperest, rêzikperest û derûnîkuj be. Weku prosesekê divê kesayet û xwenasîna zarok û zarokañyê berdewam xurtir bike an jî bibe arîkar ku zarok jê sûd wergirin û xwe xurtir bikin. Herwiha divê bingehêk ava bike da ku zarok li ser wî bingehî fikirek û helwestekê bo xwe peyda bike û di tevgerên xwe da wê xwemalibûna xwe bide der. Bêguman amanceke din a edebîyata zarokan avakirina civateke serbixwe, azad û hilberîner e ku ev jî bi réya zarokên wê civakê mimkûn e. Berhemên serkeftî yêñ ji bo zarokan li dor van amancan û li ser esasê rastî û ïzafiyeta zarokan li gorî demê divê bêñ afirandin.

Amanca edebîyatê ne ew e ku helwesteke yekreng a zanistî daîne. Edebîyata zarokan jî nabe ku tu kesî bixe bin dest û nêrînên teng, fikirîn otorîter û yekalî (Dilidüzungün, 2007: 20).

1 Dabeşkirin û binavkirina edebîyatê ya bi van navan, bi salan bûye mijara nîqaşan gelo hewce ye meriv wiha bi nav bike yan na. Me li vir ji bo jihevderxistinê ev nav danîne. Xisûsen dema em dibêjin edebîyata mezinan. Bêguman li gorî muxatabê sereke navdanîna bi vî rengî jî nîşankirinek e. Nexwe li gorî me jî edebîyat bi form û naverok û estetîka xwe yekpare ye çi ji bo mezinan, çi ji bo zarokan çi jî ji bo çîneke din a civatê bê afirandin.

2 Ji bo agahîyêñ berfirehtir derbarê rastî û ïzafiyeta zarokan da li xebata Kenan Subaşı (2021a: 225-229) a bi navê Nirxandina Helbesten Zarokan ên Kurdi li Gorî “Rastiya Zarokan” û “İzafiyeta Zarokan” binêrin.

Naveroka berhemên zarokan divê li ser hezkirin, hevaltî, aştî, dostanî, tifaq, arîkarî û hestênetewî û hwd. be. Esil li ser hemû babetan be ku zarok bixwe rûbirûyê wan dibin. Lê ya herî muhim rîbaza derbirîn û ristina van babetan e ku divê ji navenda hîs û hestêner zarokatîyê dûr nekeve. Helbet ne ku li ser pesinandina hesûdî, neyarî, dijminatîyê be. (Yurttaş, 1997 vghz. Sever, 2003, 112-113). Bêguman neyarî, hesûdî û dijminatî jî di ïzaffiyeta zarokan da heye. Lê bes divê edebîyata zarokan teşwîqkera van yekan nebe. An jî qet nebe bi zarokan bide zanîn ku ci encamên kambax ên van hîsan hene. Lê dema rasterast van babetan bi şewazeke dîdaktîk bide pir mimkûn e ku tesîrê li muxatabê xwe neke (Nas, 2004, 87). Yan negihêje amanca xwe yan jî ne ku zarokên afîrîner belkî teqlîdker biafirîne.

Her çiqas bawerî ew e ku hemû mijar di edebîyata zarokan da neyên nivîsin jî li gorî me ev şas e. Çimkî zarok ne ew heyîn in ji vê dinyaya ku tê da dijîn nehaydar bin yan jî ne muxatabê rastîyen dinyaya xwe bin. Zarok haydar in ji rûdan û meseleyen derdora xwe, heta bi reya dîjîtalîzasyonê haydar in ji yên gelek dûrî xwe jî û ev yek kêm û zêde li ser wan karîger e. Loma divê rûdan, raman, çalakî û serpêhatîyên ku rasterast û nerasterast di jîyana zarokan da diqewimin, di pirtûkê zarokan da hebin.

Divê nivîskarê edebîyata zarokan asta ziman a muxatabê xwe li ber çavan bigire û hewl bide muxatab an xwînerên xwe jî tevilî prosesa têgihiştin û manakirinê bike. Ev yek ji bo sûdwergirtin û netengijîna xwîneran a ji berhemekê pêwîst e. Sêwirandina ku ji alîyê ziman û watayê ve li gorî asta zarok serkeftî hatibe hûnandin, dê xwe bide xwendin û balê bikişîne (Sever, 2013: 38)

Di geşedana serdema zarokatîyê da bi awayekî lez û pirreng guherîn pêk tê. Çand, civak û malbat di geşedana zarokan da karîger in û tesîrê li jîyana wan a paşerojê jî dikin. Loma her çiqas geşedana ziman a zarokan li gorî rîzeke gerdûnî pêk bê jî li gorî welat, çand, malbat û heta zarokan bixwe jî mimkûn e ji hev cuda be. Loma divê tesnîfkirina berhemên zarokan li gorî asta zimanê wan be û berhem ji hêla zarokê wî temenî ve rewan, fambar û edebî bê nirxandin. Divê bê zanîn di wan berheman da ku ziman ne li gorî pîvanekî lê bi awayekî kêfî hahibe bikaranîn yan jî vegêran ne edebî lê bi temamî teknîk, rijî û çêkirî be ew berhem dê muxatabê xwe jî xwendinê sar bike (Sever, 2013: 93).

224

Di navbera zimanê zarokan û geşedana wan a zêhnî da peywendîyeke xurt heye. Li gorî têgihiştina zêhna wan zimanê wan teşe digire. Di berhemekê zarokan da bi awayekî giştî tesnîfa zarokatîya pêşdibistanê (4-6 salî), dibistanê (6-12) û nûciwanîyê (12 û jortir) weku bingeh bê qebûlkirin û ziman jî li gorî van serdeman weku têgehênen sêner, sêner û razber têkelhev, bêtir razber bê helsengandin dê heya astekê ji kîmasîya ziman bêrî be.³ Mesela xisûsen ji bo zarokên pêşdibistanê zimanê berhemekê divê bi peyvîn sêner û nêzî zarokan dagirtî be, hevok kurt bin û ji alîyê hejmara peyvan ve jî zêde bi ser xurcika wan a peyvan da nebe. Herwiha dîsa ji bo heman serdema zarokatîyê teswîr û tehlîlênh leheng û cih lazim e ku ne dirêj bin, ger hebin jî pir kêm bin. Helbet divê ev denge û aheng li gorî serdemêner zarokatîya dibistanê û nûciwanîyê bê kontrolkirin û parastin.

Hest û fikirêner zarokan û nêzîkbûna wan a li tiştan ji mezinan cuda ye. Divê zarok ji hêla zimanî, derûnî, gîyanî û tevgerî ve bi awayekî zanistî bê naskirin. Ev yek jî bi alîkarîya pedagojîyê dibe ku

³ Ji bo qonaxêner geşedana ziman a zarokatîya pêşdibistanê li xebata Kenan Subası (2021b: 12-15) ya bi navê *Mamik bo Zarokan di Fêrkarîya Ziman de binérin*.

edebîyata zarokan heya astekê arîkarîyê jê digire. Lê ev nayê wê manayê ku divê edebîyat di nav qalibên pedagojîyê da bê helandin.

Leheng di edebîyata zarokan da bo wan weku model in. Pir mimkûn e ku zarok wan nemûşen lehengan bo xwe mînak bigirin. Loma divê leheng hem gelekî nêzî alem û rastîya zarokan bin hem jî wesfîn weku tundî, zilm û zordarî, derew û reftarêñ xerab ji pênameya wan dûr be. Carinan ev şas tê famkirin herweku divê ev mijar bi tu awayî di berhemên zarokan da tunebin. Ne wisa ye. Esil ya muhim ev babet çawa têñ sêwirandin. Loma ya sereke divê leheng di hişê zarokan da hestêñ baş û bixwebawerîyê biçinîn (Kardaş ve Alp, 2013: 32).

Lehengên yekalî, monoton û statîk ji hêla zarokan ve nayêñ hezkirin. Herwiha şâşîyeke din jî ew e herweku divê lehengên edebîyata zarokan, zarok bin. Çawa dibe ku mijar piralî bin, leheng jî divê eyñî wisa bin ne illim ku zarok bin. Lê divê em ji bîr nekin leheng dixwazî bila ajel, heyinêñ fantastîk yan jî zarok bixwe bin dîsa jî divê muheqeq di şûna zarokan da bin. Yanî ji hîs û tevger û nêrîna wan ne dûr bin. Ger mezin bin jî divê weku mezinêñ bi çavêñ zarokan bin.⁴

1. MIJARA LÊKOLÎNÊ:

ELAEDDÎN SECCADÎ Û ÇÎROKÊÑ WÎ YÊÑ JI BO ZAROKAN

Herçend sala jidayîkbûna Elaeddîn Seccadî tam ne kifş be jî li gorî hin lêkolîneran ew di sala 1907an da hatîye dinê (Xeznedar, 2006: 55; Rûhanî, 2003: 516) û li gorî hin lêkolîneren din jî ew di sala 1917an da hatîye dinê (Shakely, 2012: 8; Borekeyî Sefizade, 2008: 286). Ferhad Shakely li gorî hin çîrok û nivîsen wî digihêje wê qenaetê ku ew ne di sala 1907an da lê di sala 1917an da hatîye dinê. Ew li Senendeca rojhilate Kurdistanê ji dayîk bûye û ji nesla seyîdîn Kelcî û binemala Seccadîyan bûye. Ew di serî da di nav çerxa perwerdeya klasîk a medreseyan da perwerde bûye û hêj zêde mezin nebûyî berê xwe daye medreseyen cuda yên devera rojhilat û başûrê Kurdistanê û feqîti kirîye. Herî dawî li Silêmanîyê di sala 1937an da îcazeta xwe wergirtîye û di sala 1939an da li Bexdayê di Mizgefta Ne'ime Xatûn da dest bi melatîyê kirîye. Peywendîyên Seccadî û Îbrahîm Ehmed xurt bûne. Dema ku Kovara *Gelawêjê* dest bi weşanê dike Îbrahîm Ehmed jê rica dike ku ew bibe birêvebirê kovarê û Seccadî di bihara sala 1940î da dibe birêvebirê kovarê. Di *Gelawêjê* da cara ewil di sala 1944an da nivîseke wî ya edebî weşîyaye ku ew jî wergîrana çîrokeke Hans Christian Andersenê (1805-1875) Danmarkî ya bi navê *Kejserens Nye Klæder* e ku Seccadî ew bi navê *Kallay Ballay Şa* ji Erebî wergîraye û çap kirîye. Pişti wê di sala 1946an da yekem çîroka xwe bi navê *Ronezengî Hemesen* (Rûnê Heliyayî yê Hemesen) di *Gelawêjê* da belav kirîye û heya sala 1949an ku weşana *Gelawêjê* berdewam bûye Seccadî hem birêvebirîya wê kirîye hem jî bi giştî diwazdeh çîrok nivîsîne û belav kirine ku şes ji van çîrokan ji bo zarokan nivîsîne û çîrokeke wergîranê ya zarokan e ku me qal kir û pênc çîrok jî ji bo mezinan nivîsîne.

Seccadî ji salêñ 1940î bigire heya 1949an bi kovargerî û rojnamegerîyê ra mijûl bûye û ji bilî *Gelawêjê* di nîsana 1948an da kovareke du heftane ya bi navê *Nizarê* jî derxistîye û pişti salekê 22

4 Derbarê pêkarêñ edebîyata zarokan da ji bo agahiyêñ berfirehtir li teza Aydin Meral (2016: 23-89) a bi navê *Ömer Seyfettin Öykülerinin Çocuk Edebîyatı Ölçütleri Açısından Değerlendirilmesi* (Nirxandina Çîrokêñ Ömer Seyfettin ji Aliyê Pivanêñ Edebîyata Zarokan ve) binêrin.

hejmar jê derçûne û paşê digel *Gelawêjê* ji hêla hikûmeta Iraqê ve weşana wê hatîye rawestandin. Seccadî piştî vê ezmûnê êdî bi rojnamegerîyê ra mijûl nebûye, lêbelê weku Îbrahîm Ehmed amaje pê kirîye ew neh salên wî yêñ di nav rojnamegerîyê da jê ra bûye derfet û îmkaneke pir giring ku xwe di warê Kurdî da pêş bixe (vgz. Shakely, 2012: 11). Jixwe ji sala 1950yî û şûnda wî dest bi xebatêñ xwe yêñ lêkolînî yêñ di warê mêtjû, edebîyat û çandê da kirîye û heya sala wefata xwe ya 1984an bê navber xebitîye. Herwiha divê em destnîşan bikin ku ew di navbera salên 1959 û 1974an da li Zanîngeha Bexdadê di Fakulteya Edebîyatê di Beşa Zimanê Kurdî da mamosta bûye. Piştî salên 1950yî heya wefata xwe di wê maweyê da heşt berg bi navê *Rıştey Mirwarî* (1957-1983 Bexda) berhemek nivîsiye ku bi piranî gotin û vegêranêñ gelêrî yêñ di nav xelkê da bûne. Dîsa berhemên bi navê *Mêjûy Edebî Kurdî* (1956 Bexda), *Geştêkî le Kurdistana* (1956 Bexda), *Şorrişekanî Kurd* (1959 Bexda), *Hemîse Behar* (1960 Bexda), *Destûr û Ferhengî Zimanî Kurdî* (1961 Bexda), *Edebî Kurdî û Lêkolînewey Edebî Kurdî* (1968 Bexda), *Nirxşinasî* (1970 Bexda), *Du Çamekey Nalî û Salim* (1973 Bexda), *Kurdewarî* (1974 Bexda), *Deqekanî Edebî Kurdî* (1978 Bexda), *Xwoşxanî* (1978 Bexda) xebatêñ wî yêñ di wê maweyê da bûne (Xeznedar, 2006: 56-58).⁵

Di nav van xebatan da ya ku em ê li ser bixebitin şes çîrokêñ zarokan e ku di *Hemîse Behar* da çap bûne. Esil di berhemê da bi giştî diwazdeh çîrok çap bûne ku ev çîrokêñ wî yêñ di *Gelawêjê* da bûne ku belavkirina wan dikeve navbera salên 1944-1949an. Ji van çîrokan çîroka *Kallay Ballay Sha* her çiqas wergêrana çîroka Andersen be jî nehatîye dîyarkirin ku ev wergêran e. Lê pir eşkere ye ku ji çîroka navborî ya Andersen hatîye wergêran. Loma em ê vê çîrokê di vê xebata xwe da nexine nav nirxandinê. Ji bilî vê pênc çîrok ji bo mezinan nivîsiye ku ev weku *Ronezengî Hemesen*, *Le Pénawî Afreta*, *Şayîyekey Reşey Xecellaw*, *Bo Çî Neçûyn Bo Koêstan?* û *Cewher Axa* hatine binavkirin. Herweku wî bixwe jî di pêşgotina *Hemîse Beharê* da gotîye wî çîroknûsî sûdewer nirxandîye û biryar daye weku neteweyen din Kurd jî ji vî warî bê par nemînin û loma ew nivîsiye û dîsa derbarê naveroka çîrokêñ xwe da jî li ser bergê çapa yekem wiha dibêje: "Ev komele çîrokêñ han her celeb kurdewarîyê di xwe da dihewînin û ji nav nax û cîgera wî mileti hatîye der ku her yek ji wan perdeyek in weku perdeyên dêwcamedane." (Secadî, 1960).⁶

Seccadî di *Hemîse Beharê* da şes çîrokêñ zarokan jî belav kirîye û esil ev şes çîrok di sala 1949an da ji meha Adarê bigire heya meha Tebaxê her mehê çîrokek di *Gelawêjê* da belav kirine. Jixwe berî Seccadî di warê çîroknûsîya zarokan da yê ku berhem dabû Şakir Fettah bû û meriv bi rahetî dikare bibêje ku piştî Fettah, Seccadî çîroknûsê duyem bû ji bo zarokan çîrok nivîsiye. Ji van her şes çîrokan pênc heb bi teknîka çîrok di nav çîrokê da hatine nivîsîn û bi piranî çîrokêñ di nav çarçoveya çîroka giştî da ji folklorâ Kurdî hatine qerzkirin. Di serê hemû çîrokan da lehengên çîrokan zarok in û bi awayekî rû bi rûyê hin kêşeyan dîbin. Ji bo helkirina kêşeyan serî li mezinan (dê, bav, kek, bapîr, dapîr) didin û mezin jî ne ku rasterast kêşeyen wan hel dîkin, lêbelê çîrokek ji bo wan vedigêrin. Esil ji alîyê fikirandin û çalakkirina zarokan di helkirina kêşeyen xwe da teknîkeke serkeftî û nûjen e. Ev çîrok bi navê *Rawejîşk* (Nêçîra Jûjîyan), *Gurg û Berxeke* (Gur û Berxik), *Sêweng û Mam Rêwî* (Sêweng û Mam Rêvî), *Dû Birake* (Du Bira), *Rêwîyekey Qemçoxe* (Rovîyê Qemçoxeyê), *Bizin û Meymûneke*

5 Ji agahîyêñ berfirehtir derbarê jîyana Elaeddîn Seccadî da binêrin: (Rûhanî, 2003: 516; Xeznedar, 2006: 55-60; Borçeyî Sefizade, 2008: 286-291; Shakely, 2012: 5-69)

6 Dêwcamedane: Nemûseke perdeyan e ku bi resm û nîgaran xemilandî.

7 Ji bo xwendin û nirxandina çîrokêñ wî yêñ ji bo mezinan li xebata Shakely (2012: 39-54, 73-130) binêrin.

(Bizin û Meymûn) hatine belavkirin. Bi piranî navêن çîroka di nav çîrokê da li wan kirine. Çimkî di zîncîreya rûdanê da vegêrana ku girêya çîrokê çareser û bi encam dike ew çîrok in ku gewdeyên çîrokan ava dikan. Bi vî rengî em ê di vê meqaleyê da li ser nirxandina van her şes çîrokan li gorî pîvanên edebîyata zarokan rawestin.

2. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ

Em di vê xebatê da van şes çîrokên zarokan yên Seccadî li gorî binyata vegêranê û li gorî pîvanên edebîyata zarokan a nûjen dimirxînin. Berî ku em derbasî nirxandinê bibin derbarê Elaeddîn Seccadî û çîroknûsiya wî û dewra wî da me xwendineke giştî kir. Ji ber ku bi giştî şes çîrokên wî yên ji bo zarokan hene xebata me jî li dor van şes çîrokan teşe girtîye. Îcar di nirxandinê da bêguman serdema ku Seccadî tê da jîyaye giring e. Giring e hem ji bo têgihiştina nêzîkatîya Seccadî ya li çîroknûsiya zarokan hem jî ji bo têgihiştina zarok û mefhûma zarokatîyê ya li gorî wê serdemê. Helbet ev têgihiştina serdemî di çarçoveya çîrokan da jî hatîye şenberkirin. Ev xwendin û raçavkirina serdemê ji alîyê rastî û îzaffiyeta zarokan ve ku du nêrînên sereke yên edebîyata zarokan a modern in, guncavbûna çîrokan a li gorî zarokan yan neguncavbûna wan bi me bide zanîn.

Ji alîyekî din ve çîrok li gorî esasên vegêranê û hin esasên pedagojîk hatine nirxandin. Yanî ziman, karakter, zincîreya rûdanê û babet yek bi yek hatine nirxandin. Me her çîrokek bi serê xwe li gorî esasên ku me li jor destnîşan kirin, nirxandin û di dawîyê da bi giştî ji bo şes çîrokan em gihiştin encamekê. Di nirxandina çîrokan da krîterên ku me ji bo xwe esas girtin li gorî literatura vegîrannasî, pedagojî û pênamekirinê zarok û zarokatîyê bûne. Herwiha me xisûsen nirxandina zimanê çîrokan li gorî rîbaza Wezareta Perwerdeyê ya Tirkîyeyê û li gorî formulasyona Dale-Chall pêk anî.

Li gorî pîvanên lêkolîn û nirxandina pirtûkan a Lijneya Talîm û Terbiyeyê ya Wezareta Perwerdeya Tirkîyeyê me dirêjîya hevokan nirxand ku divê di pola yekem a dibistana seretayî da hevokek herî zêde 6-7 peyv; di pola duyem da 8-9 peyv; di pola sêyem da 10 peyv; di pola çarem da 12 peyv; di pola pêncem da 14 peyv be (Gülcü, 2013: 269).

Li gorî formûla Dale – Chall, sed peyvîn pêşîn ê metnê tê wergirtin û tê da hejmara hevokan û peyvîn zehmet û nenasayar (peyvîn ku kêm tên bikaranîn) tê kifşikirin. Dirêjahîya hevokê wiha tê kifşikirin: hejmara peyvan li hejmara hevokan tê parvekirin û paşê encam tê dîyarkirin. Rêjeya peyvîn nenasayar jî wiha tê kifşikirin: hejmara peyvîn nenasayar li hejmara peyvîn mayîn tê parvekirin û paşê bi 100î tê carandin. Encam ci be rêje ew e (vgz. Çetinkaya, 2010: 57).

Tablo 1: Astêñ Xwendinê li gorî Formûla Dale-Chall

Rêjeya Peyvên Nenasyar di Xwendinê de	Asta Xwendinê	Asta Perwerdeyê	Temen
4,9	Asta 1.	Dibistana Seretayî	5-10 Salî
	Asta 2.		
	Asta 3.		
	Asta 4.		
5,0-5,9	Asta 5.	Dibistana Navîn Û Amadehî	10-12 Salî
	Asta 6.		
6,0-6,9	Asta 7.		12-14 Salî
	Asta 8.		
7,0-7,9	Asta 9.	Û Amadehî	14-16 Salî
	Asta 10.		
8,0-8,9	Asta 11.		16-18 Salî
	Asta 12.		
9,0-9,9	Asta 13.	Zanîngeh	18-22 Salî
	Asta 14.		
10+	Asta 15. û jortir		22+

3. NIRXANDINA ÇIROKAN

Çarçoveya nirxandinê ya her çirokekê weku hev e. Pêşî kurteya çirokan hat veguhastin. Di pêngava duyem da zimanê çirokê ji alîyê pevv û hevokan ve hat nirxandin. Di pêngava sêyem da karakter û lehengên çirokê hatin nirxandin. Paşê zincireya rûdanê û sêwirandina çirokê hat nirxandin. Herî dawî babeta çirokê hat destnîşankirin û nêzîkatîya li babetê ya nivîskar li gorî rastî û ïzafiyeta zarakan hat nirxandin.

228

3.1. Rawejîşk

Kurteya Çirokê

Rawejîşk yanî Nêçîra Jûjîyan bi teknîka çirok di nav çirokê da hatîye nivîsîn. Di çarçove an jî çiroka sereke da du xwîşk û birayêni bi navê Nesrîn û Newzad hene. Dema ku Newzad carinan ji Nesrînê aciz dibe wê bi nêçîra jûjîyan ditirsîne û Nesrîn jî tênağihêje nêçîra jûjîyan ci ye û şevekê ji bavê xwe dipirse hal û meseleya wê û Newzad ev e û nêçîra jûjîyan ci ye bila jê ra rave bike. Li ser vê yekê bavê Nesrînê dibe çirokbêj û çiroka di nav çirokê da dest pê dike û ev çirok jî derbarê xapandina kalemerekî saf ê bi navê Mame Hemed (Ehey Caw) da ye. Çar hevalên fêlbaz bi navê Ehey Kirnû, Reşey Xecelaw, Mecolî Xame û Arifê Elî fêlek tînin serê Mame Hemed û qaşo wî dibin nêçîra jûjîyan û li serê Girê Zêrînokê ku li devera Silêmaniyê ye heyâ serê şefeqê li wir didin sekinandin û jê bê xeber têñ qutîka wî ya helawê dixwin û sibetirê têñ temaşeya karesata fêla xwe. Pişî ku bavê Nesrînê çiroka di nav çirokê da xelas dike, diyar e nivîskarê çirokê di rola vegêre çiroka sereke da dikeve dewrê û peyama xwe dide û çirok temam dibe.

Zimanê Çîrokê

Pîvera Dirêjhîya Hevokê: Hejmaran Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): (a)/(b)= 100/7=14.28

Li gorî encama pîvanê rêjeya peyvên di hevokê da 14.28 e. Ev rêje li gorî zarokê di temenê 11+ da ye.⁸ Lê ji ber ku li gorî hevoksazîya Kurdî hin morfemê neleksîkal jî wek peyvekê ji hev û du cuda têñ nivîsin ev rêje di metnê Kurdî da li gorî zimanêñ din bilindir derdikeve. Dema ku em vê taybetîya Kurdî jî bihesibînin, dibe ku çîroka *Rawejîşk* ji bo zarokê di temenê 9+ jî guncav be.

Pîvera Peyvîn Nenasyar: [Hejmara Peyvîn Nenasyar (a)/Hejmaran Peyvîn Nasyar(b)]*100: [(a)/(b)]*100 = [2/100]*100=2

Li gorî pîvanê hejmara peyvîn ku ji hêla zarakan ve bi awayekî hêsan neyîn famkirin, gelekî kêm in. Ev jî nîşaneyâ zimanekî hêsan û rewan a metnê ye.

Hejmara peyvîn nenas yêñ di sed peyvîn pêşî da: pêşîr, rade.

Karakter û Lehengên Çîrokê

Di çîroka sereke da karakter Nesrîn, Newzad û Bavê wan ê çîrokbêj e. Nesrîn û Newzad zarok in û xwîner li bendê ye ku çîrok bi giştî li derdora alema wan bikerike. Lîbelê em vê yekê nabînin. Ev her du karakter hema hema bê fonksiyon in. Tenê yê ku girêya rûdanê diafirînin ew in ku ew jî meseleya rewejîşk e ka ci ye. Esil di serî da tirsandina Nesrînê ji hêla Newzad ve bi çîroka rawejîşk li gorî izaffiyeta zarakan e. Çimkî xisûsen zarokê hêj negihiştine fikirîna razber mimkûn e ji tişten ku haya wan pê nebe, bitirsin. Lê ji bilî vê em ji alema zarakan tiştekî din di çîrokê da nabînin. Esil girêya rûdanê ne ku bi vegêrana çîrokeke din ji hêla mezinekî (bavê zarakan) ve lê ji hêla zarakan vebihata encamkirin dê karîgertir bûya li ser xwîneren zarok. Em li vir bi nêrîn û hîsîn Nesrîn û Newzad nahesin. Çimkî ya ku di navenda çareserkirina girêye da ye çîroka duyem a çar hevalan û Mame Hemed e. Li vir karakterê bav jî bi zanetî ji bo ku bixwe bikeve dewrê û muşkileya wan hel bike, hatîye hilbijartin. Karakterê bav ne tesaduf e, nêrîna nivîskar a li helkirina muşkileyêñ zarakan e ku mezin otorîteyek e ji bo vê.

229

Esil amanc her çiqas analojîya di navbera her du çîrokan da be jî em ferqeke mezin di navbera karakterên çîroka yekem û duyem da dibînin. Di vê vegêranê da analojîyek di navbera Newzad û çar hevalan (Ehey Kirnû, Reşey Xecelaw, Mecolî Xame û Arifê Elî) da ye û analojîyeke din jî di navbera Nesrîn û Mame Hemed da ye. Lê gelo Newzad û Nesrîn dê weku wan karakterên çîroka duyem tevgerîyana, heke muşkileya di navbera xwe da çareser kiribana? Ev pirs di çîrokê da bê bersiv e. Loma karakter ji karakteran bêtir weku figuran û tipîk in ku nivîskar ew bi kar anîye da ku ya di dil û hişê xwe da bibêje.

Zincîreya Rûdanê

Teknîka çîrok di nav çîrokê da hatîye bikaranîn. Di vê vegêranê da du çîrok hene û çîroka sereke ji bo afirandina meraqa çîroka duyem weku destpêkekê hatîye veguhastin. Yanî girêya çîrokê bi peydabûna

8 11+: Mebest ji vê formûlasyonê ev e: ji yazdeh salî û jortir.

çiroka duyem eşkere dibe û girê an jî müşkile di nav çiroka duyem da tê helkirin. Paşê dîsa vegêran derbasî çarçoveya sereke ango çiroka yekem dibe û di wir da digihêje encamê. Rûdana çiroka yekem jî û ya duyem jî bi awayekî kronolojîk diherike û bi encam dibe. Ev zincîreya rûdanê teknîkeke klasik e û xisûsen çirokêni gelêri bi piranî bi vê şêwazê têng veguhastin. Ev zincîreya ji ber sadebûna xwe bêtir ji bo zarokê pêşdibistanê (4-6 salî) û zarokê dibistanê (6-12 salî) guncav e. Çimkî zêde muhakemeyeke têkel ne lazim e bo têgihiştina rûdanê. Lê em xisûsen di çiroka sereke da zêde bi honandin û tevgerekê nahesin, bêtir weku destpêk û encamek e ku vê yekê jî kirîye ji hêla zincîreya xwe ve pir lawaz be.

Babeta Çirokê û Rastî û Îzafiyeta Zarokan di Çirokê da

Babeta çirokê ji çiroka duyem tê famkirin ku ew jî li ser fêlbazî, xapandin û safbûnê ye. Ev babet di rastîya zarokan da heye û ji sê çar salî heya dawîya temenê xwe rûbirûyî vê babetê dibin. Lê di vir da ya ku kemasîyê diafirîne ev babet ne li gorî îzafiyeta zarokan yanî ne li gorî hîs, nêrîn û mejîyê wan li gorî otorîteyekê tê veguhastin ku ew jî çirokek e tê da şireta mezin, civak û nivîskar tê hîskirin. Loma li gorî me ev çirok di asta rastbînîya şikilî ya zarokan da maye. Yanî amanc bêyî ku hîs û tevger û nêrînen zarokan bê zanîn ji hêla otorîteyekê ve şiretek lê bê kirin û bi rîya şiretê bi zarokan bidin famkirin ku fêlbazî, xapandin tiştekî xerab e û safbûn tiştekî masûmane ye. Bêguman wisa ye. Lê em vê yekê ji deng û tevgerên Nesrîn û Newzad tênagehin, heta em hîç bi itiraz û fikir û rexneyêwan jî nahesin. Çimkî dengê zal di çirokê da dengê nivîskar e ku çiroka duyem bo xwe kirîye perdeyek. Loma jî her çiqas babet di cih da be jî ji ber nebûna deng û hîsên zarokan em dibêjin ev çirok di asta rastbînîya şikilî da maye.

230

3.2. Gurg û Berxeke

Kurteya Çirokê

Bi teknîka çirok di nav çirokê da hatîye vegêran. Di çarçoveya sereke da çiroka Azad û kekê wî heye. Rojek Azad dersa xwe dixebite û dixwaze kekê wî jê ra qala çiroka gur û berxikê bike. Li ser vê kekê Azad dest pê dike çiroka gur û berxikê dibêje ku ev çirok jî behsa zilma gurekî li berxeke biçûk dike. Lê di çirokê da gurê zilimkar nagihêje amanca xwe û berî ku berxikê bixwe marekî reş xwe lê dialîne û ew dikuje. Piştî ku kekê Azad çiroka di nav çirokê da diqedîne û li ser zilm û nebaşîya wê jî dîyalog di nav wan da çê dibe û çirok bi dawî dibe.

Zimanê Çirokê

Pîvera Dirêjahîya Hevokê: Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): (a)/(b)= 100/7=14.28

Ev çirok li gorî asta zarokêni di temenê 10-11 salî da ne. Lê weku me di çiroka pêş da jî amaje pêkir, çirok ji hêla xwendin û famkirinê ve hêsan e.

Pîvera Peyvîn Nenasyar: [Hejmara Peyvîn Nenasyar (a)/Hejmara Peyvîn Nasyar(b)]*100: [(a)/(b)]*100=[2/100]*100=2

Di 100 peyvan da 2 peyvîn ku ji hêla zarokan ve neyênn naskirin kêşeyeke famkirinê çenake. Zarokêni di temenê biçûk da bi hêsanî dikarin vê çirokê bixwînin.

Hejmara peyvên nenas yên di sed peyvên pêşî da: tenişt, şibake.

Karakter û Lehengên Çirokê

Di vê vegêranê da jî du çirok hene. Di çiroka yekem da karakter Azad û Kekê wî ne û di çiroka duyem da gurg, berx û mar in. Di çiroka Gurg û Berxeke da tu müşkîleyek di navbera Azad û Kekê wî da tuneye. Tenê em pê dizanin ku Azad xwendekarek e û dersa xwe dixebite û dixwaze Kekê wî jê ra çiroka Gurg û Berxeke vegêre. Loma tenê li vir Azad ew figuran e ku daxwaza çirokê dike û herwiha di encamê da disa ew figuran e ku guh dide şîreta çiroka duyem a gurg û berxikê. Loma em ji çiroka Azad bêhtir bi çiroka Gurg û Berxeke dihesin ku di wir da jî sê karakterên tîpîk ên çirokêni gelêri xuya dibin ku gurg weku zâlim, berx weku bêguneh, mar yê ku ji teref iradeyeke kullî (Xweda) ve tê şandin.

Di vê çirokê da analojîyek jî tuneye di navbera karakterên her du çirokan da. Azad zarokek e û guh didêre bi qiseta Gurg û Berxeke. Azad ci hîs dike, çawa dibîne, çawa dinirxîne an jî ji bo vê yekê ci dike kes pê nizane. Ji ber ku pasîf e û tu roleke wî nîne. Tenê em pê dihesin ku ji alîyê çirokbêj (Kekê Azad) ve tê manîpulekirin û dikeve aleyhê gurgî da. Herî dawî bêyî ku bixwe bigihêje hin qenaetan, ji alîyê nivîskar bi figurana çirokbêj ve digihêje hin qenaetan. Loma karakter ci zarok ci mezin bin ci jî ajelên tîpîk bin eleqeya wan bi nêrîn û hisîyata zarakan tuneye.

Zincîreya Rûdanê

231

Rûdan di vê çirokê da kronolojîk e. Lîbelê em di vê rûdanê da bi girêya rûdanê nahesin. Tenê daxwaza guhdarîkirina çiroka gurg û berxikê dibe nihiçka destpêka çiroka duyem û ew jî bi awayekî klasik ku di çirokêni derasayî yên gelêri da çawa be wisa dest pê dike. Berxik ji malê dûr dikeve, Gurg xerabîyek tîne serî, Mar bi xerabîyê dihese alîkarîya Berxikê dike û rûdan temam dibe. Zincîreya rûdanê ya çiroka duyem li gorî rîbaza Vladimir Propp a zincîreya çirokêni derasayî diqewime ku ew jî kronolojîk e û li ser fonksiyonên karakteran dabeş dibe. Çiroka sereke ya ku bi Azad û Kekê wî dest pê kirî, bi dîyalogeke di navbera wan da bi encam dibe. Em ji vir têdigezin ku zincîreyeke rûdanê ya çiroka sereke tuneye û tenê destpêk û encama wê weku hin nihiçkan e ku yan çiroka di nav çirokê da bide destpêkirin yan jî peyama çirokê ragihîne. Ji alîyê teswîrê ve jî karakterên çiroka yekem qels in. Em nizanin Azad û Kekê wî karakterên çawan in. Loma ji vir jî meriv têdigihe ji karakteran bêtir figuran in.

Babeta Çirokê û Rastî û Îzafiyeta Zarakan di Çirokê da

Babet ji çiroka duyem a gur û berxê tê zanîn ku ew jî fîlbażî, zilm, derew û encama wan a xerab e. Lîbelê di rastîya zarakan da gelek caran zilim û derew bi vî şikîlî naxuye. Zilim û derew gelek caran felaketan jî tînin serê mirovan (zarakan). Yanî alîyê pûçbûna derew û zilmê ne tenê rastîya zarakan e û alîyê texrîbkar jî rastîya wan e ku zarok bixwe dijîn gelek caran. Li vir jixwe Azad û Kekê wî bi tu awayê di nav peywendeke wiha da naxuyêñ, bi tenê bi awayekî teorîk nirxandinekê li ser babetê dikin ku ev jî midaxaleya nivîskar nîşanî me dide. Herwiha çiroka duyem a ku tê da ev temasîla babetê derbas dibe disa bi çavê mezinek, civatek an jî qebûleke giştî babetê dide û yekalî ye. Loma dubare otorîter e. Otorîter e ji ber ku Azad û Kekê wî bixwe tiştek wiha di çirokê da tecrube nekirine û negîhiştine encamekê. Disa otorîter e ji ber ku bi rîya temsîlekê tê manîpulekirin ber bi fikirekê ve. Loma her çiqas babeteke li gorî rastîya zarakan be jî ji ber ku îzafiyeta zarakan hatîye binpêkirin

di nav rastbînîya şikilî da maye û di vê çirokê da mebest perwerdekirina zarakan bi rêya temsileke otorîter û yekalî ye.

3.3. Sêweng û Mam Rêwî

Kurteya Çirokê

Ev vegêran tenê ji çirokekê pêk tê. Sêweng û Tara xwişk û birayên hev in û lehengên sereke yên çirokê ne. Sêweng xwendekar e û dema dersa xwe ya cografiyayê dixebite bala wî dikêşe ku welatê wî pir zengîn e ji alîyê siruştâ xwe ve û li ser vê yekê bi xwişka xwe Tarayê ra sohbet dike û bîryar didin ku dê û bavê xwe qanîh bikin û biçin bi çavêr serê xwe van zengînîyêl welat bibînin. Çirok li mintiqeya Kifriyê, li gundê Dirozneyê û cihekî bi navê Ava Spî derbas dibe ku ev der li başûrê Kerkûkê û bakurê Bexdayê dikevin. Sêweng û Tara dê û bavê xwe qanîh dikin û diçin li Ava Spî û Madenê Dirozneyê digerin û bi çavêr xwe dibin şahidîya zengînîya siruştâ welatê xwe û dîsa bi peyameke bi devê her du lehengan çirok diqede. Ev peyam derbarê giringîya siruştâ welat da ye. Esil piştî vê encamê sekanseke din di çirokê da vedibe. Di vê sekansê da dema vedigerin mala xwe di rê da rovîyek dibînin û Sêweng pêra sohbetê dike û di vê sohbetê da rovî qala nebûna ìntizam û edaleta li welêt bi metaforekê dike.

Zimanê Çirokê

Pîvera Dirêjahîya Hevokê: Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): (a)/(b)= 100/4=25

Dîyar e ku hevok dirêj in û bi rêjeya 25 peyvan saz bûne. Ev rêje ji bo şopandina naverok û manaya çirokê rêjeyeke pir bilind e. Ji bo xwînerên zarok û nûciwan ev rêje ne guncav e û ji bo ku xwînerên di van temenan da metnekê bi hêsanî fam bike divê hevokên herî dirêj ji 10-15 peyvan pêk bê. Loma mimkûn e xwîner û guhdêrên zarok û nûciwan di xwendin û guhdarîkirina vê çirokê da zehmetî bikêşin.

232

Pîvera Peyvîn Nenasyar: [Hejmara Peyvîn Nenasyar (a)/Hejmara Peyvîn Nasyar(b)]*100: [(a)/(b)]*100 = [8/100]*100=8

Li gorî pîvanan Dale-Chall, encam li gorî kesên di temenê 16-18 salî da ne. Bêguman ev rêje bilind e û ne li gorî xwînerên zarok û nûciwan e.

Hejmara peyvîn nenas yên di sed peyvîn pêşî da: xêr, çavkanî, binirx, bêhempa, berav, neft, element, kêrhatî.

Karakter û Lehengên Çirokê

Sêweng û Tara du bira û xwişk û lehengên sereke yên çirokê ne û dê û bavê wan û Mam Rêwî jî karakterên din ên di nav çirokê da ne. Her çiqas di vê çirokê da rûdan serdanpê li derûdora Sêweng biçe û bê jî Sêweng û Tara ne bi zanîn, hîs û helwesta xwe bêtir bi zanîn û helwesteke otorîter a nivîskar dipeyivin û tevdigerin. Li vir dê û bav zêde otorîter nînin û bêtir di çarçoveya rola dayîktî û bavtîyê da û herî zêde rêbertiyê da cih digirin. Bav erebe kirê dike, rêberîya zarakan dike û wan dibe û tîne. Dayîk digel vê çirokê di çirokên din da jî digel bavan di bîryaran da şirîk in an jî karîger in. Lê hema hema di her çirokê da bêtir ê otorîter bav e. Mam Rêwî tîpeke karîkatûristîk e di vê çirokê da jî ku di sekansa

dawî da xuya dibe. Li gorî me Mam Rêwî ne karakterek e ewqas karîger e ku navê xwe bide çîrokê. Heta sekansa dawî ya ku Mam Rêwî tê da xuyaye hebkî ji rûdana sereke ya çîrokê dûr jî ketîye. Çimkî heyâ sekansa dawî babet li ser giringîya zengînîyê welêt û mêtîngîriya kolonyalîstan e. Di sekansa dawî ya ku Mam Rêwî weku metaforek tê da xuyaye li ser nebelîbûna çep û rastên birêvebirêne welêt e. Bi giştî karakteren ku tevdigerin Sêweng û Tara ne. Dengê zal ê bavê wan û herwiha nivîskar e.

Zincîreya Rûdanê

Ev çîrok ji sê sekansan û bi tenê ji rûdanekê pêk tê. Teknîka çîrok di nav çîrokê da tenê di vê vegîranê da nehatîye bikaranîn. Sekansa sêyem a dawî ji alîyê babeta xwe ve ji herdu sekansê ewil qut bûye û bê eleqe xuya dike. Ev piçekî ji ber dawîya sekansa duyem e jî ku herweku encamê lê tê. Xwîner tê digihîje ku çîrok bi encam bûye û lê dinêre ku sekanske din dest pê dike. Ev yek însicama rûdanê xerab dike û herwiha sekansa sêyem di valahîyekê da dihêle. Ji alîyê demê ve jî kronolojîk e her sê sekans. Zincîreyeke rûdanê ya klasîk e û ne aloz e. Loma ji bo xwîneren zarok ne zincîreyeke girift e.

Babeta Çîrokê û Rastî û Îzafîyeta Zarakan di Çîrokê da

Babet di vê çîrokê da zengînîyê welêt, giringîya wê zengînîyê û rexneya bikaranîneke ne durust a vê zengînîyê an jî bikaranîna ne bi destê xelkê welêt e. Nêzîkbûna li zengînîyê welêt, rexneya li serdestan ne li gorî ïzafiyeta zarok û nûciwanan bêtir bi ïzafiyeta mezinan hatîye veguhastin. Esil di rastîya zarokêni temenê Sêweng û Tara da zengînîyê welêt û rexneya li serdestan mimkûn e bibe babetek. Lêbelê awayê hûnandin û nêzîkbûna li babetê ji helwesta zarakan (4-12 salî) pir û ji helwesta nûciwanan (12-15 salî) kêmek dûr e. An jî meriv dikare bibêje ev babet ger bê hûnandin jî di metneke edebî da bêtir li gorî nêrîn û helwesta nûciwanan ji bo zarokêni 12 salî û jortir guncav e. Lê ya muhim li vir zarokêni di wê serdemê da van zzengînîyê welêt û midaxaleya bîyanîyan a li welêt çawa hîs dîkin an jî bi kîjan rê û argûmanan van yekan hîs dîkin? Divê meriv bersivêni van pirsan baş bizane û li gorî wê vê babetêbihûne. Belkî wê çaxê çîrokeke serkeftî jê derkeve. Lê bi vî rengî Seccadî gelek ji rastî û xisûsen ji ïzafiyeta zarakan dûr ketîye. Jixwe babeta di sekansa dawî da ku Mam Rêwî lê xuya dibe bê eleqe ye û di nav heman rûdanê da babetên bêeleqe ne tenê xwîneren zarok hemû xwîneren edebîyatê ji metnê sar dike ku li vir şâşîyeke bi wî rengî hatîye kirin.

233

3.4. Dû Birake

Kurteya Çirokê

Di vê çîrokê da dubare teknîka çîrok di nav çîrokê da hatîye bikaranîn. Çîroka sereke ya Hêlo û Şaho ye ku ev du bira ne. Hêlo hin fêlan li birayê xwe Şaho dike û piştî demekê Şaho vê yekê ferq dike û diçe ji bavê xwe ra dibêje hal û meseleya min û Hêlo ev e. Bavê wî li wir ji wan ra dibêje meseleya we jî weku ya her du birayan e û li ser vê Şaho vê meseleya her du birayan meraq dike û ji bavê xwe rica dike ku jê ra bibêje. Bavê wî jî dest pê dike ji wan ra qala çîroka Gerdalî û Seferalî dike ku du bira ne û mîrasa bavê xwe di nav xwe da parve dîkin. Lê Gerdalî di parvekirina mîrasê da fen û fûtan li Seferalî dike û hemû tiştîn bi qîmet û bi kîr têni ji xwe ra digire û yêni ku bêqîmet û zikê meriv têr nakin dide Seferalî. Piştî ku çîroka wan diqede Şaho ji bavê xwe ra dibêje erê rast e Gerdalî jî weku

Hêlo kirîye û di çîrokê da hem li ser heqxwarinê hem jî li ser ferqa ‘emel û axaftinê peyam hene. Ev peyam bi devê zarakan tê dayîn.

Zimanê Çîrokê

Pîvera Dirêjahîya Hevokê: Hejmara Peyvan (a)/Hejmara Hevokan (b): (a)/(b)= 100/5=20

Di metnê da digel ku peyvên nenas kêm in jî hevoksazî li ser 20 peyvan hatîye danîn û ev yek têgihiştinê zehmettir dike Çimkî digel hêsanîya ziman rewanî jî muhim e di têgihiştinê da û nexasim bo xwînerên zarok û nûciwan. Mimkûn e metneke mezinan li gorî vê rîjeyê ava bibe, lêbelê ji bo zarok û nûciwanan rîjeyeke bilind e.

Pîvera Peyvên Nenasyar: [Hejmara Peyvên Nenasyar (a)/Hejmara Peyvên Nasyar(b)]*100: [(a)/(b)*100=[2/100]*100=2

Zarok vê çîrokê bêyî ferheng û arîkarîya mezinan bi rahetî dikarin têbigihêjin. Peyvên nenas ji ber ku kêm in dikare li gorî peywendê jî mana jê derîne.

Hejmara peyvên nenas yên di sed peyvên pêşî da: berbang, xurînî.

Karakter û Lehengên Çîrokê

Ji ber teknîka çîrok di nav çîrokê da karakter jî ji hev cuda dibin. Hem ji alîyê xisûsîyetên karakteran ve hem jî ji alîyê zîncîreya rûdanê ve analojî di navbera van her du çîrokan da hene. Di çîroka sereke da Hêlo û Şaho di çîroka duyem da Gerdalî û Seferalî karakterên sereke ne û herwiha ew karakter in yên ku di navbera wan da analojî hatîye avakirin. Di vê çîrokê da ji alîyê nasîna karakteran ve hin teswîrên nerasterast hene çawa ku Hêlo werzişê dike û Şahoyê ku birayê wî yê biçûk e çav didê û ew jî dixwaze werzişê bike. Herwiha fêl û fenên Hêlo û safbûna Şaho dîsa ji van teswîran çendek in ku em vê teswîrê di karakterên Gerdalî û Seferalî da jî dibînin. Ji bo çîroka duyem bê vegêran mîna di çîrokê din da karakterên sereke yên çîroka yekem serî li mezinekî didin ku di vir da jî ew kes bavê Hêlo û Şaho ye. Ji bilî vegêrana çîroka duyem û dayîna hin peyamên rasterast tu fonksiyoneke bav tuneye. Dengê nivîskar ji dengê karakteran zaltir e û heta hin peyamên ku gelek dûrî izafiyeta zarok û nûciwanan bin di çîrokê da têr neqilkirin herweku di dawîya vê çîrokê da Şaho dibêje:

234

“Bavocan, ez gelek tiştanji vê meseleya te gotî hîn bûm. Tu bo ci ev qas dûr diçî. Ne tenê di navbera min û Hêloyê birayê min de, iroj temamê alemê ev lê hatîye. Hinek weku Gerdalî goşte ser birincê dixwin hinek jî weku Seferalî binê beroşê vedirojin. Nexasim ev mesele di nav qewmekî weku me kurdan da pir diqewime, aşê me didizin û me bi çeqçeqokê dixapînin.

Belê bavocan, qiseta Gerdalî û Seferalî hatîye serê me; Hin kes xêr û bêra tiştan dixwin, hin kesên bi taybetî weku me jî binê beroşê dialêsin. Lê mixabin bavocan, hezar galgal bi qasî panotekî pere nakin.” (Seccadî, 2012: 150-151)

Zincîreya Rûdanê

Bi şêwaza çîrok di nav çîrokê da hatîye vegêran. Girê di çîroka yekem da ava dibe bi fêlbazîya Hêlo. Jixwe ev yek dike ku qisetekê analojîk bê vegêran da ku girê çareser bibe.

Wisa jî dibe. Çimkî ji alîyê bavê Hêlo û Şaho ve çîroka di nav çîrokê da ya Gerdalî û Seferalî tê vegêran. Hem di vê çîrokê da hem jî di çîrokê din da çîrokê di nav çîrokan da bi piranî ji qiset û çîrokê gelêrî hatine neqilkirin. Ji alîyekî ve meriv tê digihêje ku dayîna peyama rasterast bi rêya wan çîrokan xurt e. Lê ji alîyekî ve rûdan û karakterên çîroka yekem lawaz dikevin û hûnandina çîroka yekem qels dimîne. Bivê nevê pirs li cem me çê dibe: Gelo Seccadî di çîroknûsiyê da nû bû, ji dêvla ku hûnandineke nû bike loma serî li rîyeke wiha dida? Em tam nikarin bersiva vê pirsê bigirin. Lê dema em tecrubeya Seccadî ya nivîskarîya edebî dinêrin û herwiha li van çîrokan dinêrin li cem me gumanike heqdar a bi vî rengî çê dibe. Li gorî me ji bo edebîyata zarokan digel avantajên weku zindîgirtina meraqê û çêkirina analojîyê dezavantajên weku pasîfmayîna karakteran, guhdêriya şîretan a vê şewaza ku Seccadî bi kar anîye jî heye.

Babeta Çîrokê û Rastî û Îzafîyeta Zarokan di Çîrokê da

دناف دیرۆکا میرگه‌هین کوردی دا ل سه‌ردنه‌ی دهوله‌تا عوسمانی، هژماره‌کا میرین پیشنه‌نگ و ناقداره بیوه‌نیه کو گرنگیه کا باش ب ئاقه‌دانکر و نووژه‌نکرنا ناقه‌ندین زانستی (مادره‌سه‌یین ئایینی) دا، ژ وان ژی میری میرگه‌ها به‌هدینان (سلطان حسین به‌گ) ئه‌وی ب سلطان حسین وله بەرنیاس و بۆ ماوهیت چل سالان حوكمداری کری (۱۵۳۳- ۱۵۷۳)، و گرنگترین و ناقدارترین کاری وی د بیانق پووته‌دان ب مادره‌سه و ناقه‌ندین زانستی. دامه‌زراندن و نووژه‌نکرنا مادره‌سه‌یا قوبه‌هان بیوه. له‌وما ئه‌ف ناقه‌ندان زانستی بیوه‌هیقین و نقشکن قی ژه کولینی.

ئه‌گری هه‌لېراتنا ژن مزاری ئه‌وه، کو هه‌تا نوکه ئه‌و بابه‌تین ل سه‌ردنه‌سه‌یا قوبه‌هان هاتینه نقیسین، به‌هرا پتريا وان به‌حسن دیرۆکا وی یا سه‌دی ۱۹ و ۲۰ ز کرینه، له‌وما ئه‌ف ژه کولینه گرنگیت ب سه‌دی ۱۶ زا دیرۆکا وی ددهت، کو سه‌ردنه‌ی ۵۵ستپیک و زیرین یئی ژن مادره‌سه‌یین یه.

گرنگیا ژن ژه کولینت دهندی دایه کو پشت گه‌رمی ل سه‌ر ژیده و به‌لگه‌نامه و ده‌ستنیسین ره‌سنه‌ن هاتینه کرن، دگه‌ل پیزانین و راسته‌کرن و شروق‌هیین سه‌راستکرن.

ژ پرسگریک و ئاسته‌نگین ژه کولینت ئه‌و بیوه، به‌هرا پتريا ده‌ستنیسین مادره‌سه‌یا قوبه‌هان نه ل به‌ردستن، ئانکو دانه‌یین ره‌سنه کو ب دروستی مفا ژ مزارین وان بهیته دیتن.

ئه‌ف ژه کولینه ژ کورتیه‌کا دیرۆکی یا میرگه‌ها به‌هدینان بخوشه دگریت، پاشی ژ دوو ته‌وه‌ران پیکدهیت، د ته‌وه‌ری ئیکی دا به‌حسن کورتیه‌ک ژ ژینه‌نیگارا سلطان حسین وله هاتینه کرن، د ته‌وه‌ری دووی دا ب تیر و ته‌سەلی ل سه‌ردنه‌سه‌یا قوبه‌هان ژ دیرۆکا وی و ژ وان وه‌قینین بۆ مادره‌سه‌یین ژلایت میری ناقبیری ژه بۆ په‌رتونوکخانه‌یا وی هاتینه پیشکیشکرن، دیسا دیارکرنا وان په‌رتووک و گوتارین ل دوو مادره‌سه‌یا قوبه‌هان یئن هه‌تا نوکه هاتینه چاپکن و به‌لافلکن.

287

هه‌روه‌سا ل دووماهیت ژی دیارکرنا چند نموونه‌یان ژ وینه و به‌لگه‌نامه و ده‌ستنیسین په‌یوه‌ندی ب سه‌ردنه‌ی سلطان حسین و مادره‌سه‌یا قوبه‌هان ژه هه‌ی وه‌ک پاشکو هاتینه دانان.

میرگه‌ها به‌هدینان

میرگه‌ها به‌هدینان (ئامیدین) ئیک ژ گرنگترین و ناقدارترین میرگه‌هین کوردی بیوه ل باشوری کوردستان، ل نیقا دووی ژ سه‌دی ۱۳ ز هاتینه دامه‌زراندن.

سنوریئن وی دگه‌ل میرگه‌هین کوردی یئن ۵۵دورۆپه‌ر ژلایت باشوروی رۆژه‌لاتی ژه رووباری ژی یئن مه‌زن تخویین دنابه‌را میرگه‌ها به‌هدینان و سوران دا بیوه، و ژلاین باکووری رۆژه‌لاتی ژه ژی سنوری دنابه‌را میرگه‌ها به‌هدینان و میرگه‌ه و ۵۵فه‌را شه‌مدينان دا بیوه، ژلاین باکووری ژی هه‌ف سنوری بیوه دگه‌ل میرگه‌ها هه‌کاری (جوله‌میرگ) و زنجیرا چیاین ئوره‌ماری کو ب چیاین تیاری ناقدارن و ژلاین رۆژتافا و باکووری رۆژتافا ژی میرگه‌ها بوتان بیوه، ژلاین رۆژتافا ده‌فرا پیشخابوو (فیشخابوو) و رووباری ھیزل و پاش رووباری دیجله سنوری سروشی یئن دنابه‌را هه‌ر دوو میرگه‌هین کوردی یئن (به‌هدینان) و جزیری (بوتان) دا بیوه، (ئامیدی، ۲۰۰۰: ۲۴).

ل دوو دامه‌زراندا ژن میرگه‌هین ژی گله‌ک بچوون و فه‌گیزان و میزوجین جودا جودا دیارکرینه (۱)، بەلن یا ژ هه‌میان بنه‌جه‌تر ئه‌وه ژه‌ف میرگه‌هه چه‌دگه‌ریت ژه بونیقا دووی ژ سه‌دی ۱۳، چونکی ناقه‌ئیکه کورد هاتی ل پشتو که‌فتنا دهوله‌تا عه‌بیاسی کو ده‌سته‌لاتداری ل ئامیدین کری ناقن وی میر ژه بک بیوه، ئه‌وی ل سالا ۱۲۸۱ از ل سه‌ردنه‌ی ۱۲۸۱ مه‌غولان هاتیه کوشتن. (ابن العبری، ۱۹۹۱: ۳۴۱)، (العمری، ۲۰۱۰: ۲۰۵)، میری ناقبیری دبیته میری ئیکه‌مین کو بەرهه‌نگاری مه‌غولان بیوه و خۆملکه‌چ نه‌کری، له‌وما ناقبیری دبیته

(۱) بۆ نموونه میزوجین نه‌نوه مایی (۳۶۹۱- ۳۶۹۱) دیبیت : نیزیک سالا ۹۰۶ مش / ۳۶۲۱ ز بەهانه ددین کوری شەمسەدین کوری شوجاعە ددین کوری نه‌جمەدین کوری خپر کوری مبارز کەک خۆ وهک حاکم ئامیدین راکه‌اندی یه. (العمری، ۹۹۱: ۸۱)، بەلن ل دووی ژن‌دەرتن په‌سەن ل سالا ۱۶۶ مش / ۳۶۱ ز حاکم ئامیدین عزەددین کەپه‌ک کوری عەيدوللە تەبەدری ملکه‌چا خۆ وهک غولان راکه‌اندی یه. میزوجین مصري بین مەملوکى (ابن ناطر الجیش، ۷۹۶- ۷۹۷) دیار دکهت : ل سالا ۷۹۲ مش / ۱۲- ۷۹۲ نیسان (۷۷۳) ز دیار دکهت : ل سالا ۷۷۷ مش / ۱۲- ۷۷۷ [ز] (شوجاعە ددین کوری خپر کوری مبارز کەک) خودانن ئانکو میرق ئاکری و شوش بیوه. (ابن ناطر، ۷۷: ۷۸۹۱)، بۆ ژه‌ندی ژی ل دووی ژه‌گیرانا نه‌نوه مایی میر بەهانه ددین دبیته نه‌قین ژن میری ناقبیری، بیگومان ب ژه‌نگی ژی دفیت میزوجین میر بەهانه ددین ل پشتو ژن میزوجین بیت، نه کو نیزیکی بتر ژ سه‌ردنه‌ی کن ل بدري هنگی بیت !، هه‌روه‌سا میزوجین عیراقی مەحفوز نەلعه‌بیاسی (۲- ۴۲۹۱) مەلک خلیل ب دامه‌زرنەری میرگه‌هین ده‌ستنیشان کریه. (العیاسی، ۹۹۱: ۵- ۰).

که سن دهستپتکن ین دامه‌زراندن میرگه‌ها تامیدین (هه کاری یا باشور / به‌هدینان)، هه‌ژی یه بیژین دژیده‌رین سه‌ردمن نیسلامی دا ده‌فهه دگه‌ل (وه‌لاتن هه کاری، چیایین هه کاری، هه ریما جزیری، چیایین کوردان) دهاته نیاسین، ئانکو بری ناشی ده‌فهه ری بیته به‌هدینان ده‌فهه ب (وه‌لاتن هه کاری) دهاته نیاسین، ئانکو دشین بیژین (هه کاری یا که‌فن / هه کاری یا باشورو) پایته ختا وی کلا (تامیدین) بیوه، و (هه کاری یا باکور) ژی میرگه‌ها هه کاری لئن هاتبوو دامه‌زراندن و پایته ختا وی (جوله‌میرگ) ی بوو، گروقه ژی ل سه‌ر فن چه‌ندی ل سالا ۱۲۹۳ ز میر عه‌لائه‌دین ئه بولجه‌سن عه‌لی هه کاری میری (هه کاری یا باشورو ئانکو به‌هدینان / تامیدین) بیوه، هه رووه‌کی میژوون‌نیستی مه‌ملووکی (ابن عبد‌الظاهر) ل دۆر فن چه‌ندی گوتیه : «میر عه‌لائه‌دین ئه بولجه‌سن عه‌لی هه کاری» ل هه بیضا (ره‌بیعول ئه‌ووه‌ل ۶۹۱ مش/ ۱۲۹۲) که‌سک بنافن شیخ عه‌بدولجه‌مید هنارتبوو ل دهف نائیت سولتانی مه‌ملووکی «مەلک ئەلله‌شەف خەلیل» (۱۲۹۳-۱۲۶۷) ل بازیری دیمه‌شقن، (ابن عبد‌الظاهر، مخطوطه ۹۲-۹۸) ئه‌ف میرگه‌هه هه‌تا سالا ۱۸۴۲ یا به‌ردواام بیوه تاکو ل سالا ناقبری ژلاین دهوله‌تا عوسمانی یه هاتیه ژنافن و نیسماعیل پاشایی دووی (۱۲۳۶-۱۴۴۲) دووماهیک میری میرگه‌هه بیوه.

میرگه‌ها به‌هدینان د بەرفه‌هبووتنین بەردواام دا بیوه، زوربه‌یا وان ل سه‌ردمن میری به‌هدینان ین ناقدار میر حه‌سنه به‌گ کوری سه‌یفه‌ددین (سیقین) (۱۴۶۰-۱۴۶۵) بیوه‌نیه ئه‌وی دیتیه بابن سولتان حسین وله، ئه‌و ژی ده‌من دهوله‌تا (تاق قوینلوو) یا تورکمان قیای و بزاکری تامیدین داگیر بکهت و حوكمن میر (حه‌سنه به‌گ) بیختیت، سه‌رکرده‌کن وان بنافن (سلیمان به‌گ بیژن ئوغلى) سه‌رکردايیه‌تیا له‌شكه‌رەکتی کر بۆ ئەرد و وه‌لاتن تامیدین (میرگه‌ها تامیدین) و هه‌ر دوو کله‌ین سه‌ر ب وی ۋە (ئاكىرى و شوش) داگيركىن و تامیدین ژی بۆ ماوی سی هه‌يقان دۆرپىچ کر، بەلتى ل قىرى رۆلتى هېزىن مللی بىن پشتەقان بۆ میرگه‌هه بەرجاھ بیوه یا كو عه‌شىره‌تان نۇونەراتى دکر ئه‌و ژی ده‌من میرشكىريه له‌شكه‌رە داگيركىرا و زيانىن مەزن كەهانديه وان، لەدوما دۆرپىچ شكارد و بىن ژ له‌شكه‌رە پاراستى قورتال ژی بیوین خۆ ۋە كىشان و پەقىن، و ئه‌ف روودانه ژی ل سالا ۸۷۰ مش/ ۱۴۷۰) بیوه، (رۇوف، ۲۰۰۹: ۸).

پشتى فن سه‌رکه‌فتتن میرگه‌ها به‌هدینان پتر بەرفه‌هی بخو ۋە دیت، و نيمچە میرگه‌ها (بەروارى بالا) ژی كو بنگەھنی وی كەلا هەرۋىرى بیوه ئىخسته سه‌ر ب میرگه‌هی فه و دگه‌ل فن چەندى ژی دانپىدان ب زنجира مالباتا وان یا كەفن با حوكمدار ژی كر، ئانکو مالباتا ميرىن وئى هەر هەيلانه ل سه‌ر دهسته‌لادارىن، و دەردوااميما بەرفه‌هەكىز میرگه‌هتى دا ل ماوويەكتى ژ سه‌دەق (۱۵/۱۰) ده‌فهه را (تىزىد) ژی يا هەفسنۇر دگه‌ل (بەروارى بالا) حوكمى زنجира وان یا سەربخۇ ب دووماهىك ئىنى، و ده‌فهه را (مزورى بالا) ژی ل رۆزھەلاتا (زىن مەزن) ئىخسته سه‌ر ب میرگه‌هتى فه، و ب فن چەندى میرگه‌هتى شيا سەرەرەيا خۆ بىختىتە ل سه‌ر هەمى دەفرىن دەورۋەرەن خۆ ژلاین باکورى (رۇوف، المصدىر السابق: ۸).

288

ھەرۋىسا میرگه‌هتى سولتان (حه‌سنه به‌گ) شىابوو ل سالا (۱۵۱۶ مش/ ۱۱۶) ژی ژ دهستن (داسنى) یا بىينىتە ۵۵۰، و ئه‌ف چەندە ژی كو پشتى شىاي ل سه‌ر كەلا (دەھۆك) چەندى ژی دەپتەن ب زنجира مالباتا وان یا كەفن با حوكمدار ژی كر، ئانکو مالباتا ميرىن (داسنى) ۋە بىو ئىخسته سه‌ر ب میرگه‌ها تامیدین فه، ديسا شيا ئاكىرى ژی بىختىتە ژىر دهسته‌لاداريا میرگه‌ها خۆ). بەدلisis، بازىدى، ۲۰۰۷: ۱۷۰، (العباسى، ۱۹۶۹: ۵۳)، (المايى، ۱۹۹۹: ۱۲۰)، (رۇوف، ۲۰۱۱: ۳۸۴).

زاخو ژی ل نىقا دويت ژ سه‌دەق (۱۶) ژ دهستن (سندىان) هاتبوو ده‌رئى و كەفتبوو ژىر دهستن مالباتا ميرىن میرگه‌ها تامیدين (بەهدینان) فه و ئىدى سنورى میرگه‌هتى كەلەك بەرفه‌هبوو، و ميرىن ئان دەپتەن هەر ژلاین میرى تامیدين فه دهاته دهستىشانكىن، ئەچجا چ ژ كەسەكىن مالباتن بخو بىت يان كەسەكىن دېت بىت بەلن ھەر ل دووق پازەمەندى يا میرى میرگه‌هتى. هەرۋىرى كەلگەنامەيە كە عوسمانى ياسالا ۱۵۶۰ دا هاتى ل وي دەمى برايت سولتان حسین وله (خان ئەحمدەد كۈرى سولتان حه‌سنه) میرى زاخو بۇويه، هەر دوو عه‌شىره‌تىن سندى و سلىقانەي گلەيى ژ رەفتارىن میرى ناقبرى كىرىنە. (گولى - الجوابى، ۲۰۱۹: ۸۶).

دەربارە سۇرئى میرگه‌هتى ژلاین باشورى رۆزئاۋەقە ل سه‌ردمن سولتان حسین وله لەتى دەپتە دەپتەر چووبووب، هەرۋىرى دېلگەنامەيىن عوسمانى دا نەخاسىمە دەپتەر تەحرىرا موسول ياسالا ۱۵۴۰ دا هاتى ناحىا دېر مەقلۇوب كۆ بۆ ئىكەم جار ل سالا ۱۵۴۰ دناف دەپتەر تەحرىرىن موسول دا هاتى تۆماركىن، ل سالا ناقبىرى بازىرکىن دېر مەقلۇوب ژ (۲۹) گوندان پىتكەھات، ل سالا ۱۵۵۷ ژ (۲۵) گوندان و ل سالا ۱۵۷۵ ژ (۱۷) گوندان پىتكەھات، رېچەبرىن ئان گوندان ل ژىر حوكمدارى يامیرى تامیدين سولتان حسین [وله] بیوه، پاشى ئانکو پشتى مىنا وي ئەف دەپتەر بۆ كۈرىن وي هاتىنە ئاراستەرن (Gunduz). ۱۹۹۸: ۴۰.

د دەپتەر تەحرىرا موسول ياسالا ۱۵۲۳ دا ناقبى شىخان (شىخان نوکە) وەك گوندەكتى سه‌ر ب كەسەكتى داسنى فه بنافن شىخ حەيدەر هاتبوو دىاركىن، بەلن د دەپتەر تەحرىرا سالا ۱۵۴۰ دا ناقبى ئان دەپتەر (دەپتەن داسنى) وەك ئەرددەكتى سه‌ر ب حوكمى میرى

ئامىدىن ئەھاتىيە () ١٩٩٨ : ١٩٩١ . Gunduz چونكى بەھانەيا سۇلتان حسین وەسا دىاركىريه كۆگۈندى شىخان سەر ناحىا (دېرى مەقلۇوب) ئەھىيە ئەھىيە زى سەر ب حکومەتا بەھەدىنان ئەھىيە.

زەقابورى دىاردىبىت كۆ سنورى ميرگەها بەھەدىنان ژلائى باشورى رۆژئاقافە هەتا چىايى مەقلۇوب و رووبارى دىجلە چوویە.

١. كورتىيەك ژ ژىنەنىگارا مير (سۇلتان حسین وەلى)

ئىك ژ مەزىتلىرىن و ناقدارلىرىن ميرىن ميرگەها بەھەدىنان كۆ سەرەتەم وى ب سەرەتەم زېرىن دەتىتە ناڭكىن ، ناڭنى وى (سۇلتان حسین كورى مير سەيىھەدىن (سېقىدىن) كورى مير مەممەد كورى مير زەينەدىن كورى مير بەھەدىن [ئىكى] كورى مير عەلائەدىن)، ل سالا (٩٠ مش / ١٤٩٤) ل ئامىدىن ژ ١٤٩٤ (عاد ، ١٩٨٦ : ١٧٥) ، هەر ل ئامىدىن ل مەدرەسەيىن ئايىنى خواندى يە و ل سەر دەستى زانايىن ناڭدار فيرى زانىنى بۇوې ، ل دووق شەجهەرە زىيوكىيە شىيخ پىر مەممۇود زىيوكى (بەركارەيى) ئىك ژ مامۇستا و شىخىن سۇلتان حسین وەلى بۇوې ، (الشەمىدىنى ، ١٢١٠ : ١١ - ١٢) ، بۇ ماوهىن چى سالان دنابەرە (١٥٧٣ / ١٦٠٢) حوكىمدارى ل ميرگەها بەھەدىنان كرىيە ، باشتىرىن دانەناسىندا نىشاتىن كەسايىتىا وى ، ئەو زى پەسنا دېرىۋەنلىقىسى كورد (شەرەفخانى بەدىلىسى ١٥٤٣ - ١٦٠٢) يە كۆ ناھەتىي بىن ھەفسەرەتەم وى بۇوې ، دېرەتتۈوكا خۆ (شەرەفnamah) يىن دا ئەوا ل سالا ١٥٩٧ ز نېمىسى ب قى رەنگى پەسن و بەحسىن سۇلتان حسین وەلى كىرىيە دېتىت : " مەرۆفەتكى دىندا و موتەقى و عولەما و صولەحا پەرورە و رەعىيە دۆست ، مەزن و بچوكتىد وەلاتى ژ وى رازى و شاكرو لەشكەرى ب عەدل و دادبۇوبى و ب وەجەھەكىن ئەھىسىن و صدق و صەداقت و خەددەمات ئەمۇر حەزەرت پادشاھى سەعى و جەد تەمام دىرىن ب واسطا صدق و صەداقت خزمەت ل نك خۇنداڭكارى مومتاز و بەينەل ئەقران ، سەرەفەرازبۇوبى ، حەتا جەملەئى ئۆمەرائىد كوردىستانى با وى مراجعتە دىرىن ، ژ خەبەرا وى بەدەرەقە حەرەكەت نەدەرىن ، هەر چى خصوصا كۆ ژ بۇوى ئەكرادان و ياخود مادەھەكى دىنى مەمالەك عوسمانىيە وە كۆ ئەھىيە ئەفادا حضورا حەزەرت خۇنداڭكارى بىكرا رەد نەدبوو... " ، بەدىلىسى ، ٢٠٠٧ : ١٧٦) (بايەزىدى ، ١٢٧٥ ، ٥٥ سىنثىقىس ، ٢٠٠٧ : ٤٦) ، هەرەوەكى ل كۆرسىستان مېران ل ئامىدىن ل سەر حەلانى قوبىيە يە كورى سۇلتان حسین وەلى ھاتىيە ئەپسىن وەسا ھاتىيە دىاركىن ئەو ل ھەيقا شەعبانى ٩٨١ مشەختى چووې بەر دلۇقانىا خودى . (روؤف - محمدأمين ٢٠١١ : ٣٩) ، ل دووق بەلگەنامەيە كا عوسمانى ل رۆزا ٢٤ شەعبانى ٩٨١ مش [١٨ / ١٢ / ١٥٧٣] چووې بەر دلۇقانىا خودى و كورى وى قوباد بەگ بۇوې ميرگەها بەھەدىنان (ئامىدىن) ، (دفتر مەمة رقم : ٢٥ ، حکم رقم : ٨٣ : ١٠) ، گومبەتا گورى سۇلتان حسین دناف كەلا ئامىدىن ئىكى ١٥٧٤ ز ب فەرمى بىبو ميرى سنجەقا سندى - سلىقانى (زاخۇ) . (دفتر مەمة رقم : ٢٥ ، حکم رقم : ٢٨٩ ، ص ٢٨) .

نیاسىن ، سۇلتان حسین وەلى ئەھىيە دەنەنەن دووق خۆ دا ھىللان :

١ _ قوباد بەگ : ل ٢٥ ئىلىلولا ١٥٦٣ ز بىبو ميرى سنجەقا سندى - سلىقانى (زاخۇ) ، و پشتى مەنە بابى خۆ (١٥٧٣) بىو ميرگەها بەھەدىنان ١٥٨٤ - ١٥٨٣ (ز) ، ل سالا ١٥٨٤ ز ل كەلا دەھۆكى ل سەرەتەم زەلامىن عەشىرەتا مزووريان هاتە كوشتن . (بايەزىدى ، ١٢٧٥ ، ٤٧ مش : ٤٧) .

٢ _ بەھرام خان بەگ : ل سالا ١٥٧٢ ناھىيە كەلەنامەيە كا عوسمانى دا ھاتىيە دەن و دىاركىن بەھەنىيەن دەن و شىخان بۇون ھاتىيە و دىاركىريه ئەھە دەھەنلىرىن ل ژىر حوكىمدارىي بەھرام بەگ كورى سۇلتان حسین بەگى دانە) . (دفتر مەمة رقم : ١٩ ، حکم رقم : ٤٣٨) ، ل ٩ كانونوا ئىكى ١٥٧٤ ز ب فەرمى بىبو ميرى سنجەقا سندى - سلىقانى (زاخۇ) . (دفتر مەمة رقم : ٢٥ ، حکم رقم : ٢٨٩ ، ص ٢٨) .

٣ _ رۆستەم بەگ .

٤ _ خان ئىسماعىل : هەرەوەكى دەلگەنامەيە كا عوسمانى دا ھاتىيە يە مىزۇويا وى ۋە دەگەرەت بۆ (١٧ رەھمەزانى ٩٨١ مش - ١٥٧٤ / ١ / ٩) . ئاماڭىز ب ئىسماعىل خان ھاتىيە دان و دىاركىتەت ل سەر داخوازا قوباد بەگ كورى سۇلتان حسین سەنچەقا سندى سلىقانەيان بىا ژ بىراپت وى بەھرام بەگى ١٤٠ مایى كى ١٤٠ هەزار ئاقچە زەعامەتى وى بەبۇو ژ ٩٣ زەعامەتىن ٥٠ هەزار ئاقچە بۆ ئىسماعىل بەگى كورى سۇلتان حسین بىتە تەرخانكىن . (دفتر مەمة رقم : ٢٥ ، حکم رقم : ٣٠٦ - ٣٠٩) .

٥ _ سۇلتان ئەبوبەسىعىد .

شەجهەرە يە زىيوكىيە دەربارە سۇلتان حسین وەلى

شەجهەرە يە زىيوكىيە : ئىك ژ دەستنەپىسىن دېرىۋەنلىقىسىن گۈنگە بۆ دەھەنلىرىن بەھەدىنان كۆ تىدا بەحسى زىجىرا ميرىن بەھەدىنان و يىن شەمىزىنان

(ھەكارى) و شىخىن زىوکا(بەرى گارى) كۆ دېيىزنى (زىوکا شىخان) ژى و بەنەملا ميرىن تىروھيان و زىيار و چەندىن جە و ناقىن زانا و كىسايەتى و گوندىن دەقىرى كري، كۆ ب زمانى عەربى هاتىه نقيسىن، نقيسەرى وى نەھاتىه زانىن و هەر وەسا سالا نقيسىنا دەستپىكى ژى، بەلۇن ژېر كۆ ناقىن مير سەيدخان (سولتان حسین وەلى) ۱۰۸۵ - پشتى ۱۶۲۰) نەفيت (۱۵۷۳ - ۱۵۳۳) ژى تىدا هاتىه بە حس كرن ، لەوما ژ فىن چەندى دەھيتە زانىن بۆ جارا ئىكىن ل سەرەدەم وى هاتىتە نقيسىن ، ئانكۆ ئەف دەستنقيسە بۆ جارا ئىكىن ل دووماهىيەن سەدى شازدى و ل دەستپىكىن نيقا ئىكىن ژ سەدى ھەقىدى هاتىه نقيسىن، پاشى بۆ جارا دووماهىيەن هەتا ناقىن مير ئىسماعيل پاشايىن ئىكىن (۱۷۹۸ - ۱۷۶۸) هاتىه كول سالا ۱۲۱۰ امىش (۱۷۹۵) ل سەرەدەم ميرى ناقبىرى ژلائين تەھما مەلا عوزىز شەمدىنى ۋەھاتىه نەسخ كرن، ئەف دەستنقيسە بۆ جارا ئىكىن ل نيقا دووئى ژ سەدى شازدى هاتىه نقيسىن، و ژېر كۆ ل گوندى (زىوکا) بەرى گارى هاتىه نقيسىن لەوما هەر بناقى گوندى هاتىه ناقىن ، ئەف دەستنقيسە ژيلى جارا ئىكىن ، دوو جارىن دى ژى سەر ژ نوي هاتىه ۋە دەگەل ھندەك زىدەھيان ، ئەو ژى ئىكەم جار ژلائين زانا (مەلا مەممەد باليسانى) ۋە ل نيقا دووئى ژ سەدى ۱۱۸ ل گوندى (سپىندارى / بەرىگارى) نقيسى بۇو، و جارا دووئى ژى ژلائين زانا (تەھما كورى مەلا عوزىز شەمدىنى) ل (۱۳) ربىع الالى ۱۲۱۰ امىش ۲۶ - ۱۷۹۵) ل مزگەفتا گوندى (زىوکا / بەرىگارى) نقيسى بۇو، (الشەمدىنىي ، مخطوطە ، ۱۲۱۰ ھـ)، كۆ دېيىتە سەرەدەم ميرى ميرگەھا بەھەدىنان ئىسماعيل پاشايىن ئىكىن كورى بەھرام پاشايىن مەزن (۱۱۸۲ - ۱۲۱۳) .

دەربارە سولتان حسین د شەجهرىيا زىوکىيە دا ب ۋى رەنگى هاتىھ بە حس كرن كۆ ب كورتى دى ئامازھ دىيىت :

– سولتان حسین بۆ ماوهىيە كىن دەگەل سەيدا و شىخى خۇ شىيخ پىر مەممۇود زىوکى ڈيابىيە دا كۆ فېرىي (الضرب و الخط) بىكەت ئانكۆ فېرىي ھونەرى شەرى و بكارئىنانا چەكى ، زانىتى ناقبىرى ل سالا (۱۰۲۰) ۱۰۶۱۱ / ۱۶۱۱ وەغەر كريه. (الشەمدىنىي ، ۱۲۱۰ ھـ : ۱۱ و ۱۴) .

– سولتان حسین مزگەفتەك ل سەرایا خۇ ئافاكىيە و شىخ پىر مەممۇود ل دەف وى يى ئامادە بۇو. (الشەمدىنىي ، ۱۲۱۰ ھـ : ۱۲) ، ھەزى گۇتنى يە ئەو مزگەفتە تىزىكى ۸۰ مەتران ژ سەرایىن و جامعا ئامىدىن يَا مەزن دوورە ، ژېر كۆ نىزىكى مالىن مالبىتا شىركەرايدە لەوما بناقى مزگەفتا شىركەرا ژى هاتىھ نىاسىن. (الكتاني ، ۲۰۱۰ : ۲۰) ، نوكە ناقنى وى كريه مزگەفتا سولتان حسین. (سەرەدانە كا مەيدانى يَا نقيسەرىن گۇتارى).

290

– سولتان حسین ئەۋى ئافاكىرى مەدرەسەيى بناقىن قوبەھان ، ب زىرەكى و زەقەرى يَا وەرزشى و مەردىنى و دادپەرەھىر و قەنجبىن بەرنىاس و ناقدارە ، (الشەمدىنىي ، ۱۲۱۰ ھـ : ۱۷) .

٢. گىنگىدانان سولتان حسین ب ناقھەندىن زانستى

دناف ميرگەھا بەھەدىنان دا هەندەك ژ ميرىن وى گىنگىكە كەلەك باش ب لايەنلى رەۋشەنېرى و زانستى و زانىن دايە ، نەخاسمە د بوارى زانستىن شەرعى دا ، ئەفە ژى ھەك مير بخو ژى ژ كەسەن زانا و پشتەفانى زانىن بىت ، ئەف پەنگەفەدانە پىر ل سەرەدەم وى دا پەيدابۇويە ئىك ژ كەفتىرىن مەدرەسەيىن بەھەدىنان ل ئامىدىن مەدرەسەيى (القضاء) ژى هاتىھ يَا كۆ دېرۋىكا وى فەدگەرىتى سەدى ۱۶ ، بەلگە ژى بۆ فىن چەندى ئەوھە كۆ ئىك ژ دەستنقيسەن ل فى مەدرەسەيىن هاتىھ نقيسىن فەدگەرىت بۆ سالا (۱۳۷۶) ۱۴ ھـ ئەو ژى پەرتۈوكا (كتاب فقهى) ”محمد بن مولانا شيخ آقىل بن احمد بن محمد بن على الباو...في بلدة العمادية...في المدرسة المسمى بالقضاء“ . (القرداغى ، ۲۰۱۴ : ۴۶۳) ، ئانكۆ ئەف ھەدرەسەيە بەرلى فى مېۋەۋىتى ھەبۈويە ، گەرۋۇقاتى عوسمانى ئەولىا چەلەبى ژى ل سالا (۱۶۵۶) ناقى وى ب (قازى) ئىنایە و ل دۆر فى مەدرەسەيى گوتىيە : ئەف مەدرەسەيە ژ ھەمیا كەفتىرە، ھەر كەسى ئىكچار دەن خوانىنگەھەتىدا بېزىت (بسم الله) دى بىتە تەفسىرناس و فەرمودۇدەزان! بېرىدە كا ئاقا زەلال ھەيە، دەھەوشَا وى دا دارە كا كاژى ھەيە وەسا يَا بلندە كۆ دەگەھىتە ئەسمانى! و بېھنە بەلگىن وى قوبەھان ل سەرەدەم بەرەنە كۆ دەكتە . (گولى ، ۲۰۱۶ : ۴۰) .

میر سولتان حسین وەلى ژ وان ميرىن ميرگەھا بەھەدىنانە كۆ ئەف بىاڭە ب گىنگى قە ۋەھىيە كۆ باش دايىنە دەستنقيسە و شاكار و بەرەھەمىن زانىيان ، ناقھاتى كەلەك گىنگى ب زانا و زانىن دايە و گەلەك پەرتۈوك وەك وەقف پېشىكىشى مەدرەسەيى قوبەھان كرىنە كۆ ب ئافاكىرى وى دەھيتە نىاسىن و مەدرەسەيى ناقبىرى ژلائين وى فەھاتبوو نۇۋەزەنكەن و بەرفرەھەكەن و سەخېرەكەن ، لەوما مەدرەسە دەزىمارەكە دەستنقيسەن دا بناقىن (السلطانية) و (الحسينية) هاتىھ ناقھاتى كۆ دەگەرەن بۆ نەموونە : دېئىك ژ كەفتىرىن دەستنقيسەن ل فى مەدرەسەيىن هاتىھ نقيسىن تىدا هاتىھ دىاركەن : « وقع الفراج من التسويد يوم الاثنين من شهر شوال في مدرسة

السلطانية المنشارة في قرية قبهان المتصلة بزيارة محمد الباقر زاده الله شرفاً سنة ٩٤٨ هـ (١٥٤٢ م). «(البختي، مخطوط : ٥٩٤٨ : ٦٤)، ئەفه ژى گروقۇنى وى چەندى يە ل دەستپېتىكى مەدرەسە ھەر بناقۇنى وى بخو ھاتىھ ناڭكىن و پاشى بناقۇنى وى گوندى مەدرەسە لى ھاتىھ ئاڭاڭىن، ئەفه ژى ئىكەم و ئىكەن بەلگە يە دەھىتە دىاركىن كۈنلىقىن (قوبەھان) ھەر ژى ناڭى گوندى ھاتىھ وەرگەن.

مەدرەسە يى قوبەھان

ئاڭدارلىرىن ناڭھەندىن زانسىتى يىن سۇلتان حسین ئاڭاڭىرى و نۇۋەزەنلىرى. مەدرەسە يى قوبەھان، ئەف مەدرەسە يى دەھىتە باکورى رۆزئاڭا كەلە ئامىدىن ل نەھالا دېيىزنى (شەقلفاتىن) ل رووبارى ئامىدىن، كۆ گوندى (رووبارى) ژى گوندى كەقنه و ناڭى وى دەددەستنىشىسە كا ٨٧٤ مش / ١٤٦٩ (ھاتىھ ، د. تارق پاشا ئامىدى) ئىك ژى وان نېمىسىز رانە يىن ل دۆر قوبەھان نېمىسى دېباھەتى خۇ دا دىار دەكت كۆ خواندىگەھا قوبەھان ل سالا (١٣٣٤) ژلایىن دامەززىنەرى مىرگەھا ئامىدىن (بەھەدىن) مىر(بەھەدىن) ھاتىھ ئاڭاڭىن. (العمادى ، ٢٠٠٦ : ٧٣)، بەلى ج بەلگە يىن ۋەپ بۇ ۋەن چەندى نىن، بەلى دەمن دىرۈكقانىن كوردى شەرەخانى بەدلەسى (١٥٤٣) د شەرەخانەيىن دا كۆ ل سالا (١٥٩٧) ھاتىھ نېمىسىن، ٥٥ مىتى بەحىسى مىرگەھان دەكت، ئامازە دەكت كۆ مىرگەھا بەھەدىن ژ مىر (بەھەدىن) ھاتىھ و رەقىشتا وى بەرى نېزىكى ٤٠٠ سالان حوكىدارى ل ئامىدىن كەپە كە ئەم مىۋۇپۇيا تېقىسىن شەرەخانەيىن و ٤٠٠ سالان ھەۋپەر بەكەن ناپىتە مىۋۇپۇيا ناڭھاتى دىاركىر، بەلگو دېشىن بېتىن ل سەدى سېردى دا مىرگەھ دەرسەت بۇويە ئانكۆ مە سالا دەستپېشانلىرى نىن، دېسان بەھرا پېتىريا جاران دەمن كەسەك جەھەت ئانكۆ ناڭھەندەكى زانسىتى يان ئايىن ئاڭا بەكت گومان تىدا نىن دىن ناڭى وى كەسى ھېتىھ دانان، خواندىگەھا قوبەھان ژى ب مىر(بەھەدىن) نەھاتىھ ناڭكىن.

ھەزى يە بېتىن ل دوو ۋېدەرین رەسەن و ھەزەمارەكە دەستنىشىسان بەھرا پېت دووپاتىيە ل سەر وى چەندى دەن كۆ ئەف مەدرەسە يى دېرۈكى ل سەرەدەمەن (سۇلتان حسین وەلى ١٥٣٣ - ١٥٧٣) ھاتىھ ئاڭاڭىن (نۇۋەزەنلىرى و بەرەھەن)، ئەف چەندە ژى بۇ چەند خالان ۋە دەگەپىت :

خالا ئىكىت : دەندەك دەستنىشىسەن پەرتووكخانەيَا موقىتىت ئاڭرى دا دوو ژ كەفتىرىن دەستنىشىسان ھەنە ئىك يَا سالا (٨٧٤ مش) يە كۆ دېتىتە (١٤٦٩) ل گوندى رووبارى ھاتىھ نېمىسىن كۆ ھەر نېزىكى مەدرەسە يى قوبەھان و يَا دووئى يَا (٨٧٦ مشە خىتى) دېتىتە (١٤٧١ زايىنى) ناڭى زانايەكى ئامىدى تىدا ھاتىھ بناقۇنى (مەھمەد كۆرۈ عومەر شىفەكى يى ئامىدى). (العمادى ، ٨٧٦ : ٢٠٢٠، ٤٤ - ٤٣)، ئەف بەلگەنامە كەلەك نېزىكى مىۋۇپۇيا سۇلتان حەسەن (١٤٦٥ - ١٥٣٤) كۆ دېتىتە باپن (سۇلتان حسین وەلى)، د ھەر دوو بەلگەنامەيَا دا ناڭى مەدرەسەيىن و نە ناڭى سۇلتان حەسەن نەھاتىھ كۆ وى ئاڭا كىرىت، ل دووف ئەفان ۋېدەرەن ھەتا دووماھيا سەدى پازىتى ژى ج بەلگە ل سەر ئاڭا كرنا مەدرەسە يى (قوبەھان) دەستتى مە دا نىن، ئانكۆ پاشتى ھاتتا (سۇلتان حسین وەلى) ئەمۇي سەرەدەمەن وى ب سەرەدەمەن زېرىن دەتىتە ناڭكىن ژېھر كۆ گەلەك گەنگى ب ئاڭا كرنا خواندىنگەھە و مزگەقەت و پر و كەلھا دايىھ و شەرەخانەيىن ژى دا گەلەك پەسنا وى ھاتىھ كرنا كۆ مەرۋەھەكى زانا و دىنداو و تىگەھەشتى يە و ئەف ئامازە كە كۆ گەنگى ب مەدرەسە يىن ئايىنى دايىھ.

خالا دووئى : يَا كۆ مە پېت نېزىكى پېشتراسىتىن بەكت، پېتىريا دەستنىشىس و وەققىن خواندىگەھا قوبەھان مووهرا (سۇلتان حسین وەلى) ل سەر ھەيە و ژلایىن وېقە ھاتىھ وەقق كەن.

خالا سېيىت : د چەندىن دەستنىشىسان دا ناڭى مەدرەسە يى قوبەھان ب (الحسينييە) ھاتىھ. (الكتانى ، ٢٠٠٩ : ٣٦٤)، ئەف ھەر مەبەست ب ناڭى سۇلتان حسین وەلى يە، دىسا دەندەك دەستنىشىسان دا بناقۇن (السلطانية) ژى ھاتىھ دىاركىن. (الكتانى ، ٢٠٠٩ : ٣٨٠)، ئە و ژى ھەر ژېھر ناڭى وى ھاتىھ (سۇلتان حسین) و دېرۈكى بەھەدىن دا كۆ دەگەل ھەر دوو مىران (سۇلتان حەسەن و كۆرۈي وى سۇلتان حسین وەلى) پەيغا سۇلتان دەگەل ناڭى وان ھەر دوو كۆ ھاتىھ ئانكۆ پەيغا سۇلتان بخۇ ژى ھەر ژى پېكەناتا ناڭى وانە نەكۆ ناسنافى دەستتە لاتدارىن.

ھەرەكى دەددەستنىشىسە كا سالا (٩٤٨ م / ١٥٤٢) ناڭى مەدرەسە يى ب (مەدرەسە يى سۇلتانىيە) ھاتىھ. (البختي ، ٩٤٨ هـ : ٦٤)، ئەف ھەنە ئەفلىرىن و نېزىكىتىرىن دەستنىشىسە بۇ سەرەدەمەن سۇلتان حسین وەلى، ئەف ھەنە گروقۇنى بۇ وان ئامازەھەدىن شەرەخانەيىن دىاركىر كۆ (سۇلتان حسین) وەسا يىن ب ناڭدار بوو ھەم مىريىن كوردان بۇچۇن ئەن وەرگەن، دىسا دى بۇ ئىكلاڭىن مىۋۇپۇيا ئاڭا كرنا وى دىن مىنیت ھەتا بەلگە يە كەپ بەنەجەھ و سەرەستكىر دىاردىتى.

ھەزى يە بېتىن گەلەك زانايىن مەزن ل سەر ئاستى كورستانى و عيراقى ژۇ خواندىنگەھى شاگىرە بۇويىنە و پاشى بۇويىنە سەيدا و زانايىن

مەزن و پېشکەفتى، پىريا نېيسەر و مىر و زانا و ھۆزانقان و تىگەھشتى شاگىدىن قى خواندىگەھن بۇينە يان ل سەردەستن وان پىنگەھشتىنە و ل بەر دەستن وان زانا و مامۆستايىن هاتىنە پەروھەرەكىن و باوهەنامەيا زاناتىن وەرگىتىه و ۋەرىزىا ھەمۈيان بۇ قوبەھان ۋەدەرىت ، قوبەھان بۇويە رووگەھە كا مەزن ياسەرەكى و ھەر چار پارچىن كوردىستانى كومكىرىنە، (مەلا مەحمۇودى بەھسى/ مزوورى ژۇورى) ل سالا (١٦٨٩) چووې بەرلۇقانيا خودى كو سەيدابىي ل چەندىن مەدرەسەي كريي و ئىتكە ژ سەرکىشىن زانايىن مەدرەسەي (قوبەھان) و زانايىن دووف دا هاتىنە ھەمۈو ۋەرىزىا زانىن و نىشادانان ئەقى زانايى مەزن، وەك زانا و ھۆزانقان (مەلا خەليل سېرىتى ١٧٥٠ - ١٨٤٣ ز) خەلکن سېرىتى يە ل كوردىستان باکور، دەستنقيسىه كا قى زانايى ھەيى كومىزۇرۇيا وى بۇ سالا (١١٩٢ مشەختى) كو دېيتى (١٧٧٨ زانىنى) ل قوبەھان نېيسى يە، و ھەمان سال زانايى كى دى ھەيى بناقى (مەلا عەبدوللاھى رېكاني يې مامىسى: مرن ١٧٩٥ ز) كول دووماهىيىن سالىن سەدى ھەزىدى مفتىن زاخۇ بۇو، چەندىن دەستنقيسى ب زمانىن (عەرەبى، فارسى، توركى) ھەنە ل قوبەھان نېيسىنە دگەل ھەنەك پارچە و پەيقەن كوردى، (رېكاني ٢٠١٨ : ٦٦)، و زانايى مەزن (مەلا يەھىجايىن مزوورى : مرن ١٨٣٩ ز) كوب مەزىتىن زانايىن بەھەدىنان دەھىتە ھەزمارتىن و ب مفتىتى ل سەر ئاستى عىراقى بۇويە ئەقە ھەمۈو ۋەرىزىا سەيدابىي (قوبەھان) بۇينە ل بەر دەستن مەلا مەحمۇودى بەھەدىنى باوهەنامە وەرگىتىنە ئەۋى ل سالا (١٧٨٧ ز) چووې بەرلۇقانيا خودى. (رېكاني، ٢٠٢٠ : ٨١).

دەيسا زانايى كى دى ھەيى (مەلا رەسۋولن سۈورچى) كو دەستنقيسىه كا وي ھەيى، ل سالا (١٦٦٧ ز) كوردىستان رۆزھەلات ل بازىرى سەقز نېيسى يە كو وي ھەمى ل سەقز مامۆستا بۇويە، (مفتى، ٢٠١٣ : ١٣٠ - ١٣٦)، ۋېدەر ئامازە ب وي چەندى دەكەن كەن كەن ئامىدىن ژېھر زانينا وي داخاز كريي بەھىتە ئامىدىتى و بۇويە رېقەبەر و مفتىتى خواندىگەھا (قوبەھان)، ئانكۆ قى خواندىگەھى ھەمى پارچەتىن كوردىستانى بخۇقە گرىدايە.

ھەرەسال (قوبەھان) بىرا وھەگىپانى ژى هاتىكەرن و پېشتر مە ئامازە ب دەستنقيسىنە كى دا كول سالا (١١٩٢ مشەختى) كو دېيتى بەرامبەر (١٧٧٨ زانىنى) هاتىي نېيسىن، رۆزئامە (الجديد) ئىك ژ دەستنقيسىنە كو گرىدايە ب فەلەكتاسىيىن ۋە، زانا (عەللامەيىن كورىي مەحمۇودى بھوسى) ب زمانى توركى نېيسىيە و دووف دا هاتىي وەرگىران بۇ زمانى فارسى و مەلا (عەبدوللاھى رېكاني / مامىسى) ژ فارسى نەسخ كريي، كەلەك ئامازە ھەنە كو گىنگى ب ھوزان و ئەدەبىياتا كوردى ژى هاتىدەن، دەيسا فەرەھەنگىكە كا بچۈوك هاتىي نېيسىن پەيقەن كوردى، عەرەبى، توركى و فارسى تىدانە ئەقە ژى پىتى جەھى ۋە كولىنى و سەر راۋستاندىنى يە. (رېكاني، ٢٠٢٠ : ٥٧ - ٥٨).

292

قوبەھان د گەشتا ئەولىيا جەلەبى دا

گەرۆكقانى عوسمانى ئەولىيا چەلەبى (١٦١١ - ١٦٨٤ ز) ئەۋى ل سالا (١٦٥٦ ز) سەر دەستان ئەپەن ئەپەن دەستنقيسىن دېبىزىت : ”ئەف مەدرەسەي دەكەتىتە دېن كەلتى دا دناف باغ و بۇوستانان دا، ھند مەزىنە خۇ دى بىئى كەلایە، ل سەر بانى وي شازىدە قوبەھەنەن، (گومبەدىن) موكوم ھەنە، ژ (٢٠) حوجرەيان (زۇوران) پېكىدەتىت، و دناف حەوشَا وىدا بىرەكە كا ئاقىن و جووبار و نافورىن ئاقىن ئەنەن، و ل ھەر دوو رەخىن جادەيا وي گول هاتىنە چاندن. ل زەستان و ھاشىيان دنابىھەر ٣٠٠ - ٤٠٠ شاگىدان تىدا دخوين، و ھەمى جورىن زانست و ھونەران تىدا دەھىتە خواندىن، ھەر ژ زانستى ئەرەستوو ھەتا زانستى سرۆشتى! ھەزمارتە كا مەزن ژ باغ و بۇوستان و دوکان و تاشە كى ئاقىن ب رەخخە هاتىي ئاقاكرن و داھاتىي وان وەقفا مەدرەسەي، ئەقە ژبلى داھاتى دېر و كەنيسە و كىشتىا و جىزا ٥٠ گوندىن فەليان، سەيدابىن مەزنى وي (رېقەبەرلى وى) شىخولئىسلامى (موفتىي) ميرگەھى يە، ل مېھقانخانىيە وى رۆزانە دوودانىن خوارنى دەھىتە دانان. و چونكە ئەق مەدرەسەي ب رەخ پرا (قوبەھان) هاتىي ئاقاكرن لەلما ب ناقىن (مەدرەسەي قوبەھان) دەھىتە يىاسىن، بەلن ئاقاكرەرى وى (سۇلتان حسین)، لىن پىتىيا كوردان دېبىزىتى (مەدرەسەي قوبا). ب كورتى دېبىز ئەز يازىدە سالان ل وەلاتى كوردىستانى گەپرایيمە بەلن من چ خواندىگەھىن وەكى ۋەن نەديتىنە. (گولى، ٢٠٠٠ : ٣٠٦ - ٣٠٥).

ژ وھقىن سولتان حسین وەلى بۇ مەدرەسەي قوبەھان

ھەزى يە بېزىن كو ژ بلى ئاقاكرن و نووژەنكرنا مەدرەسەي قوبەھان، ھەر ژ گەنگىدەن سولتان حسین ب زانىن و زانايىان، داناندا پەرتووكخانەيە كا بەركەفتى بۇويە بۇ ھەمان مەدرەسە و وەقف كرنا پەرتووكىن بىزارە، ئەق چەندە ژى ل سەر چەندىن دەستنقيسىن هاتىي دىاركىن كو موھرا وي ژى ل سەر هاتىي دانان (٢). و ل سەر موھرا وي ب ۋەرەنگى هاتىي نېيسىن (الواشق بالملك الناس سلطان حسین بن حسن العباس).

(٢) ئەنۇنەن ئەپەن دەستنقيسىن كو موھرا سولتان حسین ل سەلە. بىتىپ پاشكۈن ئەمە (٥).

ئىك : وەققىن پەرتۇوكان (دەستنېسىس)

پشتى مەدرەسە يىا قوبەھان ھاتىيە ئاقاکىن ، ژ بۇ كۆپتەر مەفا ژ خواندن و فيتكىندا وى بەيىتە وەرگەتن ، سولتان حسین پەرتۇوكانە يەك ژ بۇ دانايى و چەندىن دەستنېسىس ژ بۇ كىرىنە دىيارى و وەقف ، ل ۋېرىتى دى ئاماشە دەينە چەند نموونە يە كان ژ وان دەستنېسىسان وەك :

— قبهان : (٢٠٨٤٧) (٣) : شرح المحرر عليه وقفية :

قد وقف و حبس و سبل امير امراء الكرام و كبير كبراء العظام ذو القدر والاحتشام سلطان حسين بن سلطان المرحوم [حسن] هذا المجلد من كتاب على المدرسة المسماة بقبهان حسبة لله و طلبا لمرضات الله ، فمن بدله بعد ما سمعه فاما ائمه على الذين يبدلونه ، (القرداغى ، ٢٠١٤ : ٣٣٩) .

— قبهان : (٢٠٨٥٨) : عليها وقفية : الامير الكبير العادل سلطان حسين بك على المدرسة السلطانية [قبهان] في تاريخ ٩٧٨ هـ ، الجزء الرابع من شرح المنهاج ، (القرداغى ، ٢٠١٤ : ٣٣٩) . ئانكۆ ئەف پەرتۇوكانە ل سالا ٩٧٨ مش (١٥٧٠ ز) ژلائىن سولتان حسین فە بۇ خواندىنگەھا قوبەھان ھاتىيە وقف كرن.

— قبهان : (٢٠٨٦٥) : اسنى المطالب شرح روض الطالب : الناسخ : احمد بن على بن عبد الرحيم ... الشافعىي ٩١٤ هـ ، هذا ما وقفه و حبس و سبل الامير العالم العادل سلطان حسين بك على مدرسته سنة ٩٧٨ هـ ، (القرداغى ، ٢٠١٤ ، ٣٤٠) . ئانكۆ ئەف پەرتۇوكانە ل سالا ٩٧٨ مش (١٥٧٠ ز) ژلائىن سولتان حسین فە بۇ خواندىنگەھا قوبەھان ھاتىيە وقف كرن.

— قبهان : (٢٠٨٧٤) : الناسخ : عثمان بن سلمان سنتي ٨٩٥ هـ ، هذا ما وقف و حبس و سبل الامير الاعظم سلطان حسين بن حسين [حسن] بىك على مدرسته القبوية وفقا صحيحا شرعا بشرط ان لا يخرج من المدرسة الا ثلاثة ايام و باذن المدرس (وعليه ختمه) ، (القرداغى ، ٢٠١٤ : ٣٤٠) . ئانكۆ شىۋاوازى وەرگەرتىنە پەرتۇوكان (ئىستىعارە) ھەبۈويە، بەلىن ب مەرجەكى كۆزى سىر زۇزان نەبورىت و ب دەستووريا سەيداين مەدرەسە يىت و ب موھرا وى بىت.

دۇو : وەققىن مەزاختىنى

ئىك ژ پىنگاڭقىن دىتىر يىن سولتان حسین بۇ پۇوتەدان ب زانىن و زانستان و لايەنلى رەۋشەنبىرى ، دىاركىن و وەرگەرتىنە وەققان بۇويە ژ ھەزمارەكى گوندان و دىئر و كىنيشىتەيان ، كۆئەف چەندە تا پشتى وى ژى يابەردەوام بۇويە بۇ مەدرەسە يىا قوبەھان ، ھەروھەكى د ۋى ئىستەكە ل ڈىرى دا دىيار ، (فندى ، ١٩٩٨ ، ٩٠_٩١). (رۇوف ، ٢٠١١ : ٢٧) :

ناثقى گوند و دىئر و كەنىشىتەيان	كۆزىمە (پارە)	ژ
گوندىق بىيادىق (فەلا)	٧ قوروش و چارىكەك	١
گوندىق ھەمزىك	٧ قوروش و چارىكەك	٢
دېرا قەدش	٥ قوروش و چارىكەك	٣
دېرا بىباتى	٣ قوروش و چارىكەك	٤
دېرىيىن گوندىن ئىنىشكىن و ئەرەدنا (دېرا قدىسە ئەشىمونى و قدىسە سلطان ماھيدوخت) و تىن و داودودىن	ھەر ئىك ژ وان ٧ قوروش و چارىكەك	٥
كەنىشىتە يى شيخو (شخو)	٧ قوروش و چارىكەك	٦
دېرا دەنى	٥ قوروش و چارىكەك	٧
دېرا مانگىشكىن	٧ قوروش و چارىكەك	٨
كەنىشىتە و دېرا كەربلى	ھەر ئىك ژ وان ٧ قوروش و چارىكەك	٩
دېرا قەلاشكىن	٣ قوروش و چارىكەك	١٠

Hersh Kemal Rekanî - Farhad Mohammed Ahmad
مەدەرسە يى قوبەھان ل سەردىمىت مىرىي بەھدىنان (سۇلتان حسىئەن وەلى) ١٥٣٣ - ١٥٧٣

١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	كەنيشته يى سندورى	١١
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	كەنيشته يى دەھۆكى	١٢
٧ قوروش و چارىكەك و ٥ بەغدادى	دېرا دەھۆكى	١٣
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا مالتا و سېمیل و سېجى و قەسر ئىزدىن و دېر و ئالۆكا و تلخىش	١٤
٧ قوروش و چارىكەك	كەنيشته يى بەراشى	١٥
٧ قوروش و چارىكەك	دېرا خورپىنى و بىبۈزى و چەلۈكى و مىزى و بارەمېنکى و ئاقۇكى	١٦
٧ قوروش	دېرا ئاتقۇشى	١٧
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا بىتگە	١٨
٧ قوروش و چارىكەك	دېرا بىددۇلىنى	١٩
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	كەنيشته يى دزى	٢٠
ھەر ئىك ژ وان ٧ قوروش و چارىكەك	دېرىن خدرە و ئازدەخ و ھەرماش و بلان و بىرۇباسفرى	٢١
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا تله	٢٢
١٠ قوروش	كەنيشته يى عومرانيي	٢٣
ھەر ئىك ژ وان ٧ قوروش و چارىكەك	دېرىن سيانكى و ئەركن و دېرك	٢٤
ھەر ئىك ژ وان ٧ قوروش و چارىكەك	دېرا كىسە و ئارتوك	٢٥
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا سيانىتى	٢٦
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا ھەرنى	٢٧
٧ قوروش و چارىكەك	دېرا دەفلى	٢٨
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا شەرمنى	٢٩
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	كەنيشته يى شوش	٣٠
ھەر ئىك ژ وان ٧ قوروش و چارىكەك	ھەمى دېرىن دەفەرا پېتكان	٣١
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا گوندى گوندك	٣٢
٧ قوروش و ٥ بەغدادى	كەنيشته يى گوندى گوندك	٣٣
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا خەرەز	٣٤
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا خربە	٣٥
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	كەنيشته يى ئاكىرى	٣٦
٧ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا ئاكىرى	٣٧
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	كەنيشته يى بچىل	٣٨
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	دېرا كەلاتى	٣٩
٧ قوروش و چارىكەك	دېرا كەلەدېرى	٤٠
١٠ قوروش و ٥ بەغدادى	كەنيشته يى كەلەدېرى	٤١
٧ قوروش و چارىكەك	دېرا كوانى و دېرا گوندى دېرى	٤٢

294

٤٣ دېرا درگىنى	١٠ قوروش و چارىكەك	دېرا بىتكۈك
٤٤	٧ قوروش و چارىكەك	

ھەڙى گوتى يە ھەزماھە کا پەرتۇوڭ و گوتاران يېن تايىھەت بە مەدرەسەيَا قوبەھان فە ھاتىنە چاپكىن و بەلاقكىن ، ھەروھەكى دەقى لىستەيال ۋىزى دا ھاتىنە دىاركىن (ھندى مە ئاگەھى ل سەر ھەين و بەردەست).

بىلۇغرافيا چاپكىن و بەلاقكىن ل دۆر مەدرەسەيَا قوبەھان

گوتار (رۆزنامە و گۇفار)	پەرتۇوڭ
مەممود ئەحمد مۇحەممەد ، روناکىيەك بۇ سەر شوينەوارى رۆشنىبىرى لە كوردىستان خۇينىدگاي قوبان ، رۆزنامەي ھاوكارى ، ژمارە ١٩٨٣ / ٢٧ ، ٧٠٩	د.مسعود مصطفى الكتاني ، مدرسة قوبا – قوبەھان (ذلك الطود الشمس الافتلة) . (دھوك : ٢٠٠٩).
عبدالرقيب يوسف ، شيعىن چەند شاعيرەكى كەفن ٥٥٥ ستەنثىيىسىن مەدرەسا قوبەھان دا ، گۇفارى روشنبىرى نۇرى ، ژمارە ١١٩ ، ١٩٨٨.	
محمد علي القرداغى ، وثائق عن مدرسة قبهان ، جريدة العراق ، العدد ٥٩٤٣ ، ٢٥ ، كانون الثاني ١٩٩٦.	
عبدالكريم فندي ، واردات مدرسة قوبا ، مجلة دھوك ، العدد (٥) ١٩٩٨ ،	
حسين علي البرواري ، من مدارس كوردىستان الدينية مدرسة قبهان في ثامىدىي (العمادىة) ، مجلة دھوك .العدد (١٠) ، ايلول ٢٠٠٠.	
د.مسعود مصطفى كتاني ، ايضاح تارىخي حول مدرسة قوبا (قبهان) في العمادىة ، مجلة دھوك ، العدد (١١)، كانون الاول ٢٠٠٠	د.سعید محمد أحمد ، مدرسة قبهان في العمادىة و دورها في نشر العلوم الإسلامية في كوردىستان ، (دھوك : ٢٠١٣) . (ئەقە دېنىيات دا نامەيى ماستەرلى بىوویە) .
طارق الباشا العمادى ، كوردىستان و المسيرة الثقافية من مدرسة (جامعة) قبهان الى جامعة السليمانية ، مجلة دھوك .العدد (٣١)، ٢٠٠٦	مەدرەسەيَا قوبەھان (رۆلن وى دېپىشىقە بىن ئەدەبىن كلاسيكىيەن كوردىدا) ، (دھوك : ٢٠٢١) .

<p>د. م. ف. کارل نوفاجیک _ د. نرمین علی محمدامین ، دراسة لمدرسة قبھان في العمادیة ، ت : عبدالمجید محمد سعید ، مجلة سوبارتتو ، العدد (٤ _ ٥) ، صيف ٢٠١١.</p>	
<p>د. م. ف. کارل نوفاجیک _ د. نرمین علی محمدامین ، فەكۆلينەك ل سەر خاندنگەھا قوبەھان ل ئامېدىن ، و : كۇفان ئىحسان ياسىن ، گۇڭارا سىلاق ، ژمارە (٦٦) ، چىريا ئىتىك ٢٠١١.</p>	
<p>ھېرىش كەمال پىكانى ، دەستنقىسىھەنى زانىي خواندنگەھا قوبەھان مەلا عبدولالىن مامىسى ، گۇڭارا ئىزەن ، ژمارە ٤ ، ٢٠١٥.</p>	
<p>ئىسماعىل بادى ، مەدرەسەيا قوبەھان و رەۋشا ئەدەپياتا كوردى چەرخنەفتى مەشەختى (١٣ زايىنى) ناڭدارتىرين زانا و شاعرىت دەڤەرا Hakkari) ، ٢ ZapHavzasıUlemasıSempozyumu، Cilt :</p>	

ئەنجام

296

د ڦىن فەكۆلينى دا بۇ مە چەندىن خال و ئەنجام دىياربۇون ، ل ۋېرىدى دى چەند خالان دا ب كورتى دىياركەين :

سولتان حسین وەلى گەلەك گۈنگى ب بىاڭى زانىن و رەۋشەنېرى دايى ، گرۇغە ژى بۇ ڦىن چەندى ئاڭاڭىندا مەدرەسە و پەرتۇوكخانە يان و دابىنگىدا زىنەرەن زانستى يە.

خواندنگەھا قوبەھان ڙ ناڭدارتىرين ناڭەندىن زانستى و رەۋشەنېرى بۇويە ل سەر ئاستىن مىرىگەھا بەھەدینان و دەڤەرەن دەورۇۋەر.

بەرى خواندنگەھـ بناقى قوبەھان بەرنىاس بىيت ، ل دەستپېكىن هەر بناقى (السلطانية) و (الحسينية) دەھاتە نىاسىن ، ئەقە ژى بەلگەيد بۇ ئامازەدانا گۈنگىدا سولتان حسین وەلى ب ئاڭاڭىندا ناڭەندىن زانستى و ناڭپىرى ئاڭاڭەر و دامەززىنەر ئىخواندنگەھا ناڭھاتى بىت.

سولتان حسین ڙ بلى كو كەسايەتىھەن سىياسى و لەشكەرى بۇويە ، ل سەر دەستىن زانا پەروەردە بۇويە و كەسەكتى خودىناس و زانا ژى بۇويە ، لهوما ب پاشنافن (وەل) هاتىه ناڭكەن و نىاسىن.

سەردىمى وى چىرىپ زانستى گەشتىرلىتىن زانستى و مەدرەسەيا قوبەھان بۇويە زانىنگەھە كا مەزن و رووگەھە كا زانىن بۇ دەڤەرەن دىتەر ژى يېن كوردىشىن.

ئەو سالۇخەتىن مىزۇونقىسىت كورد شەرەفخانى بەدىسى دەرىھەقى سولتان حسین دا گوتىن ، ب كىيار ژى رەھنگەھەدا خۆ د كەسايەتى و سەردىمى وى دا دىيار بۇويە.

لىستا زىنەرەن :

ئىك _ بەلگەنامە و دەستنقىسى :

أ _ بەلگەنامە :

دفتر مەمە رقم : ١٩ ، حکم رقم : ٤٣٨.

دفتر مەمە رقم : ٢٥ ، حکم رقم : ٨٣.

دفتر مەمە رقم : ٢٥ ، حکم رقم : ٢٨٩.

دفتر مەمە رقم : ٢٥ ، أحكام : ٣٠٦ - ٣٠٩.

ب_ ٥٥ ستنتقىسى :

الاكاسري ، شرف بن شمس الدين (البدليسى). (مخطوطه : ١٠٠٥ هـ ١٥٩٧). شرف نامه تاريخ كردستان.

بايەزىدى، مەلا مەحموود. شرفخان بدليسى . (٥٥ ستنتقىسى : ١٢٧٥ مىش - ١٨٥٨ ز). شرفنامه (تواريخ قديم كوردستان) . جلد أول .

البختى محمد بن محمود البرواري (الناسخ). (مخطوطه : ٩٤٨ هـ ١٥٤٢ م). مجلمل الاصول في الاحكام.

ابن عبدالظاهر ، محيى الدين أبو الفضل عبدالله المصري.اللطاف الخفية في السيرة الشريفة السلطانية الملكية الاشرفية ، (مخطوطة)، مكتبة ميونخ ، رقم التسلسل : ٤٠٥ ، ج ٢.

الشمدىنى ، طه بن ملا عزيز بن ملا محمود بن ملا حسين بن الشيخ هفند (الناسخ). (مخطوطه : ١٢١٠ هـ ١٧٩٥ م).الشجرة الزيوكية.

العمادى ، محمد بن عمر بن حسن الشيفكى (الناسخ). (مخطوطه : ١٤٧٦ هـ ١٤٧٦ م).

الامام النووى ، اذكار النووى.

دوو_ پەرتۈوک :

أ_ ب_ زمانى عەرەبى :

ئامىدى ، كاوه فريق أحمد شاوهلى. ٢٠٠٠. إماره بادىنان ١٧٠٠ - ١٨٤٢ دراسة سياسية اجتماعية ثقافية.أربيل : مؤسسة موكريانى للطباعة و النشر.

ابن العبرى (ت : ١٢٨٦ م) . ١٩٩١. تاريخ الزمان لأبى الفرج جمال الدين ابن العبرى ، نقله الى العربية : الأب إسحق أرملا . قدم له الأب جان موريس فيه. بيروت : دار المشرق.

رؤوف ، عماد عبدالسلام. ٢٠٠٩.الشجرة الزيوكية وثيقة نسب أمراء بەھىنەن و تارىخەم (دراسة و تحقيق). أربيل : مكتب التفسير للنشر و الإعلان.

_____ ٢٠٠٩. السلطان حسين ولی أمیر بەھىنەن ٩٤٠ - ١٥٣٣ / ١٥٧٣ - ٩٨١ م . هولير.

_____ ٢٠١١. المعجم التاريخي لإماره بەھىنەن. ط ١. أربيل : مطبعة الحاج هاشم.

رؤوف ، عماد عبدالسلام _ محمد أمين ، نريمىن على. ٢٠١١. شواهد المقبرة السلطانية في العمادى. أربيل : من مطبوعات الاكاديمية الكوردية.

العمرى ، ابن فضل الله (ت : ١٣٤٩ م) . ٢٠١٠ . مسالك الابصار في ممالك الامصار، تحقيق : كامل سلمان الجبوري. ج ٣ . بيروت : دار الكتب العلمية .

عواد ، كوركيس . ١٩٨٦. خزان الكتب القديمة في العراق منذ أقدم العصور حتى سنة ١٠٠٠ للهجرة . ط ٢ . بيروت : دار الرائد العربي.

القرداغى ، محمد علي . ٢٠١٤. كنوز الکرد في خزان دار المخطوطات العراقية . ج ٢. أربيل.

الكتاني ، مسعود مصطفى. ٢٠٠٩. مدرسة قوبا _ قوبهان (ذلك الطود الشمس الأفلة) . دهوك.

_____ ٢٠١٠. المساجد و المدارس و العلماء و المخطوطات في إمارة بادينان _ العمادية . دهوك.

گولى ، نزار أیوب _ الجوادی ، غسان ولید . ٢٠١٩ . مقدمة في تاريخ زاخو خلال العهد العثماني ١٩١٨_١٥١٥ . دهوك : مركز زاخو للدراسات الكردية _ جامعة زاخو.

المایی ، انور. ١٩٩٩. الاکراد فی بەھەدىنان . ط ٢ . دهوك : مطبعة هاور.

ب _ ب زمانى كوردى :

بەدلیسى ، شەرهەف خان. ٢٠٠٧. شەرهەفناھە يىا شەرهەفخانى بەدلیسى تەرجەمە مەلامە حمودى بازىدى ١٧٩٧_١٨٦٧ . توپانىن : سەعید دىريشى . دهوك : دەزگەھا سېرىز يىا چاپ و وەشانى .

رېكاني ، هيىش كەمال . ٢٠١٩ . عەشىرەتىن بەھەدىنان ١٥١٤_١٩١٩ ز (قەكۈلەنە كا دىرۆكى بەلگەنامەي). دهوك : سەنتەرىي بىشىكچى بۆ چەكۈلەنەن مروقا يەتى _ زانكۈيا دهوك.

_____ ٢٠٢٠ . گەنجىنە يابەھەدىنان ڦ ٥٥ سىتىقىسىت زانا و مير و ھۆزانغانان ل سەدى ١٥_٩ / ١٥_٩ مش . دهوك : پىرۆزە يىپ بەندەر دهوك .

قەرداغى ، محمدەد عەلى بۇۋازىندە وەرى مىزۇوو زانىيانى كورد لەرىگەي دەستخەتە كانىانەوە، بەرگى ١ ، (بەغدا : ١٩٩٨).

_____ ١٤٢١ ك _ ٢٠٠٠ ز. بۇۋازىندە وەرى مىزۇوو زانىيانى كورد لەرىگەي دەستخەتە كانىاواھ . بەرگى ٣ . بەغدا.

ب _ ب زمانى توركى :

سى _ گۆفار :

أ _ ب زمانى عەرەبى :

العمادي ، طارق الباشا. ٢٠٠٦. كورستان و المسيرة الثقافية من مدرسة (جامعة) قبهان الى جامعة السليمانية . مجلة دهوك . العدد (٣١).

فندى ، عبدالكريم. ١٩٩٨. واردات مدرسة قوبا . مجلة دهوك . العدد (٥).

ب _ ب زمانى كوردى :

رېكاني ، هيىش كەمال. ٢٠١٥. دەۋەرا بەرى گارى ڦ دىرۆك و زانىيەن وى . گۆفارا نىزەن . ژمارە (٥) .

_____ ٢٠١٨ . رۆلن زانىيەت دەۋەرا (رېكاني) د ژيانا زانستى و چاندى دا ل (ھەكارى) و (بەھەدىنان) ل چەرخى (١٠_١٥ مش / ١٦_٢٠ ز) . گۆفارا دىرۆك . ژمارە (٢٠).

گولى ، نزار ئىيوب. ٢٠١٦ . ڦ ھۆزانځايىت كەقنىيت بەھەدىنان مەلا رەممە زانى عەبباسى . گۆفارا دىرۆك . ھەزمارە (١٢) .

مزوورى ، عەبدولرە حمان. ٢٠١٤ . كاودانىن رەۋشەنېرى ل مىرگەھا بەھەدىنان . گۆفارا دىرۆك . ھەزمار (٥)

مفتنى ، بلند محمد شكري. ٢٠١٥ . مەلا عبدالله يىن رېكاني يىن مامىسى ئىكە ڦ زانا و نافدارىت مىرگەھا بەھەدىنان . گۆفارا دىرۆك . ژمارە (٧).

Belgename û Destinivîs:

a_ Belgename :

- _ Defter muhimme reqem : 19 . hukum reqem : 438.
- _ Defter muhimme reqem: 25 . hukum reqem 83.
- _ Defter muhimme reqem: 25 . hukum reqem 289 .
- _ Defter muhimme reqem : 25 . ehkam reqem : 306_309.

Pirtûk û Gotar

Al'imedî , M.(elnasix) . (mextut : 876 h_ 1471m). Alimam alnewewy. ezkar alnewewy.

Al'madî , T. (2006). Kurdistan we Almesîre Alseqafîye min Medrese (cami'e) Qubehan ila cami'e Alslîman . *Mucele Duhok* . 'eded (31).

Al'umerî , ibn fezl allah (t : 1349 m) . (2010). Mesalik alabsar fi memalik alamsar. tehqîq : Kaml Sliman alcuburî. c: 3 . bîrût : dar alkutub al'lîmîye .

Alakasîrî, Ş . (Mextut: 1005 h_ 1597m) . şeref namh Tarîx Kurdistan.

Albuxtî, M.(elnasix). (mxtut: 948 h _ 1542 m). mecmel elosul fi elehkam.

Alkitanî ,M. (2009). Medrese Quba _ Qubehan (zalik eltewd elşems alafle). Duhok.

Alkitanî ,M. (2010). Almesacid we Almedaris we al'ulema we almextutat fi imaret Badînan _al'madiye. Duhok.

Almayî ,A . (1999) . alakrad fi Behdînan . t: 2 . Duhok: metbe'e hawar.

Alqederedaxî ,M. (2014). Kunuz alkurd fi xezayin dar almextutat al'raqîte . c: 2. Erbîl.

Alşemdînî, T. (elnasix) . (mextut: 1210 h _1795 m). Elşecere elzîwkiye.

Amîdî ,K. (2000) .imaret Badînan 1700_ 1842 drase syasye actmaîe sqâfi , moassese Mukiryanî liltiba'e ü alneşir . arbîl.

Bayezîdî, M .(Destnîs : 1275mş _1858 z). Şerefyan Bidlîsi . şerefname (Tewarîx Qedîm Kurdistan). cild ewul .

Bedlîsi, Ş. (2007). Şerefnameya şerexyanê Bidlîsi Tercema Mela Mehmudê Bazîdî 1797_ 1867. Twêjandn: Seîd Dêreşî. Duhok.

Çelebi ,E . (2000). Evliya Çelebi Seyahatnamesi . Haz: Yücel Dağlı, Seyit Ali Kahraman. IV kitap. İstanbul: YKY.

Findî , E . (1998). Waridat Medrese Quba , *Mucele Duhok* . 'eded (5).

Gullî , N. (2016). Ji Hozanvanê Kevnêt Behdînan Mela Remezanê 'Ebbasî. *Govara Dîrok* . hijmare (12).

Gullî , N _ X. (2019). Muqeddime fi Tarîx Zaxo xilal al'ehid el'osmanî 1515 _ 1918 Duhok : merkez Zaxo lildirasat elkurdiye _ camî'e Zaxo.

Gunduz , A . (1998).Osmanli Doneminde Musul 1523 _1639. Yayınlanmamış Doktora Tezi, Fırat Üniversitesi.

Ibin el;brî (t : 1286 m) . (1991). Tarîx alzeman liabî alferc Cemal aldîn ibn al;brî , nqlh alî al;brî : alab ashq arml . teqdim alab can murîs fih . bîrût : dar almesriq.

Ibn 'ebdulzahir .M. (1212 _1292m) .alaltaf alxefiye fi alsîre alşerîfe alsultanîye almelekîye alaşrefiye . (mextute). mektbe miyunix . reqem alteselsul: 405. c: 3.

Mizûrî , E . (2014). Kawdanê Roşenbîrî li Mîrgeha Behdînan. *Govara Dîrok*. hijmar (5).


Mufî , B. (2015). Mela Ebdullah yê Rêkanî yê Mamîsî êke ji Zana û Navdarêt Mîrgeha Behdînan. *Govara Dîrok*. jimare (7) .

Qeredaxî , M. (1421 k _ 2000 z). bûjandnewey mêjuuy Zanayanî Kurd lerêgey Destxetekanyawe . bergi 3. Bexda.

Qeredaxî , M. (1998). Bûjandnewey Mêjuuy Zanayanî Kurd Lerêgey Destxetekanyanewe. B.1 . Bexda.

- Rêkanî , H. (2015). Devera Berê Garê ji Dîrok û Zanayên wê. *Govara Nîjen*. jimare (5).
- Rêkanî , H. (2018). Rolê Zanayêt Devera (Rêkan) di Jiyana Zanistî û Çandî da li Hekarî û Behdînan li çerxê 10_15mş/ 16_20z . *Govara Dîrok* , jimare (20).
- Rêkanî , H. (2019). Eşîretên Behdînan 1514_ 1919 z (vekolîneka Dîrokî belgenameyî). Duhok : Senterê Bêşkçî bo Vekolînê Mirovayetî _ Zankoya Duhok.
- Rêkanî , H. (2020). Gencîneya Behdînan ji Destnvîsê Zana û Mîr û Hozanvanan li sedê 9_15mş / 15 _20 z . Duhok : Projeyê Bender _ Duhok.
- Rewof, ‘İ. (2009). alşecere alzîwkîye wesîqe neseb imaret Behdînan we Tarîxihim . (dirase û tehqîq) . Erbîl : mekteb altefsîr lilneşir we ali’lan.
- Rewof, ‘İ. (2009). Alsultan Husîn Welî emîr Behdînan 940_981 h 1533_ 1573 m.hewlêr.
- Rewof, ‘İ. (2011). Almu’cem altarîxî limaret Behdînan .t 1 . erbîl : metbe’e elhac haşim.
- Rowof , ‘i_ N. (2011). Şewahid almeqberiye alsultanîye fî al’imadîye , min metbu’at alakadîmîye alkurdîye . erbîl.

(۱) پاشکو



میرزا میر سولتان حسین وله، ۲۴ شهعبانا ۹۸۱ مش (۱۸ کانونونا ۱۵۷۳)

(ژ: دفتر مهمه رقم: ۲۵، حکم رقم ۸۳، ص ۱۰)


پاشكۆ (۲)




302

تابلویه کا شەرە فنامە يې ب دەستن شەرە فخانى بە دلیسى

دەربارەي ئىك ژ نافەندىن زانستى ل ئامىدىي.





پاشکو (۲)




304

ئهولیا چله‌هی دهرباره‌ی مادر مدرسه‌یا سولتان حسین (قوبه‌هان).

پاشکو (٤)





الشجرة الزيوكية . ١٢١٠ مش / ١٦٩٥


٣٥ ستنتسيسيا (تها مهلا عوزير شه مديني)

(۵) پاشکو

و لا يك انا خود ميرزه مفتح المعرفه المفتتح لات نيم الالب و قبل المنشد و فتن الداجن دل الابكي اهله
في اتعاقبي والادكان فهذا فصل في شفاعة صدق المسعد و الفتح و الامامة مني الجنون والجنون هذا
له وقد في الخطبة تحمله و الصدقة الفتح في الغائب و كذبة المفتح تذكر في الفتح لارفع الراية في الگانه على درفة
الشيد فاني مدققا عنق ما اخراج لاجمكم كل اجيادكم مدقعا عنق شهيد البانه
الاخ في عيون اهلا الاراده بين المهومنا الراهن ابا عاصي عصونا و عصونا الاستخلاف العرش
تهمت التي و الاصل فيه قوله الم الرايل الشفاعة و عصونا فوت سينما و محن النياث بليل ظالم
الخطيب علاقت ربكم السيدة ملكه ملوكها به في كل غيره بمحاجة كثيرون ثم اشتراها المجهض
عشونا و عصونا الرايلها من بنده و ادا شهادها للقيمة المكلفة و قصحتن لياشونه خاشونه
موسيان و اتماما في العتقه عشقه شيك و نه لاقرمه و فرقهم الرايل و ادانة بالغشين فالرايل
بنينا الائمه ضيق حكمه عشقه و على المذهب المترقب عصونه كاشنده بحقه الرايل و يحيى الله من القبور بعانتها
هـ و انه لعلم بالعقواب و منه المبذلة و انه المقرب تم اصحاب تبرق للكبار اجل انت الفرعون
هـ تعليقه كهر الله و منه و حزن في قيمه ظلمه يوم الرايل اثافن نه و صورهم بالسعادة المطفنة
هـ غافل شهور سنه حسین و سبطه الهايله الهايله و المنسى ذذاله لواحة التور حراج عصته
هـ عباد الله على طرحهم عقوب و مخزنه الحاج مهرين سعدون المطفر مهرين عدل العبد نه
هـ المطفر بربه مهرين المطفر بربه اربع بن بيشون صالح بن عبد الرحمن بن مهرين صاحب
هـ المتبرري مولاده من اداره الملكي محمد و اقربيه شباب اهل الله عليه ربه
هـ نصوح و حصله من ذمرة الصالحين حامله تعالی و مصلحا على نه
هـ بغير المعلوق به المرضه مستغرا ولها عذرها و ربها
هـ دعوه يوم الحمد الرايل و المشرب من رحمة
هـ سنه سبع و سمعه و تایه
هـ اغفر له ولارمه اهله
هـ راجداده


ژ و هفین سولتان حسین و ولی بو پرتووکخانه یا مهدره سه یا قوبه هان

موهرا سولتان حسین ژی ل سه رده دیاره




ژ وەققىن سۆلتان حسین وەلى بۆ پەرتوكخانە يى مەدەرسە يى قوبەھان

موھرا سۆلتان حسین ژى ل سەر دىارە




ڙ وەققىن سۇلتان حسین وەلى بۆ پەرتۈوكخانە يى مەدەرسە يى قوبەھان

پاشكۆ (٦)



310



وهرگیرانا شره فنامه‌یی، ملا مه‌حموودی بایه‌زیدی، (۱۲۷۵) مش / ۱۸۰۸ (ز)

پاشكۆ (٧)



311

شۇونەوارى مەدرەسە يى قوبەھان ژلايىن باکورى قە

(ژئاشيفىن مامۆستا : عەبدورەھقىب يۈوسف) (٢٠٠١ / ١٠ / ١١)




شۇونەوارى مەدرەسە يى قوبەھان ژلايىن باشۇرى قە.

(٨) پاشكۆ



312

گومبەتا گورى مىرىگەھا بەھەدىنان سۇلتان حسىئەن وەلى



313

گورى سۇلتان حسېن وەلى ل ئامىدىقى. ل سالىن پىنجىيان ڙ سەدسالىيا بىستى



(چار شەمبى : ١٤ / ٨ / ٢٠١٩)

الصورة البلاغية لدى فحول الشعر الجاهلي دراسة إحصائية İSLAM ÖNCESİ ŞİİRİN DÖRT BÜYÜK ŞAIRLERİNDE RETORİK İMGE-İSTATİSTİKSEL BİR İNCELEME

Mohammad BONJA

ملخص:

يتناول هذا البحث بالدراسة فحول شعراء من العصر الجاهلي، وهم: «امرأة القيس، وزهير، والنابغة الذبياني، والأعشى»، ويحاول رصد نسبة التصوير الفني القائم على الصورة البيانية بأنواعها «التشبيه والمجاز والكتابية»، والصورة القائمة على الوصف اللغوي الحُرّ، مستفيداً من المنهج الإحصائي والتحليلي، وذلك بإجراء إحصاء شامل يبيّن الفروق الدقيقة للفنون «البلاغية البيانية» بين الشعراء المبحوثين، وذلك بقياس نسبة كل فن بلاغي لدى الشاعر الواحد، ونسبة ما يتفرع عنها من أقسام. إضافة إلى إجراء موازنة بين الشعراء الأربع لإرصد الفروق في نسبة كل فن من تلك الفنون وفروعه التي تلحق به عندهم، وبذلك تتجلّى الخصائص الفردية في علم البيان لدى كل شاعر على حدة، والسمات المشتركة فيما بين الشعراء الأربع. وهي دراسة تُجرى للمرة الأولى بهذه السعة في الشعر الجاهلي.

الكلمات المفتاحية: الصورة البلاغية؛ الشعر الجاهلي؛ الموازنة البيانية؛ إحصاء بياني.

ÖZ

Bu araştırma, İslam öncesi dönemin en dört büyük şairleri olan Imruu'l-Kays, Zuhayr, en-Nabiğa ve el-A'şa'yı ele almaktadır. Çalışmamız, "benzetme, mecaz ve kinâye" çeşitleriyle birlikte beyânî imgeye dayanan sanatsal tasvîrin oranını ve serbest dilsel betimlemeye dayanan tasviri tespit etmeyi amaçlamaktadır. Bunu ölçmek için, beyânî belâğat sanatlarında zikredilen şairler arasındaki ince farklar kapsamlı bir istatistiğe tabi tutulacaktır. Bu ise söz konusu sanatlar ve dalları arasındaki farkların tespiti için dört şair arasında karşılaştırma yapılmasıının yanı sıra tek tek şairlerin belâğî sanatın ve bunların dallarının oranlarının mukayese edilmesi ile gerçekleştirilecektir. Böylece her bir şairin beyan sanatı kullanmadı bireysel özellikleri ve dört şair arasındaki ortak noktalar ortaya çıkacaktır. Bu dönemin bu geniş şiir yelpazesinde ilk kez yapılan bir çalışmadır.

Anahtar Kelimeler: Belagat; Beyân Sanatlar; Cahiliyye dönemin Şiiri; İstatistiksel çalışma.

A Rhetorical Image of the Biggest Poets of the Pre-Islamic Poetry

ABSTRACT

This research is aimed to study the works of four fathers of pre-Islamic poetry, namely, Imra' ul-Qais, Zuhair, Al-Nabigha Al-Dhubyani and Al-A'sha, and highlight the role of the aesthetic image in sparking off the poetic scenes. The researcher sought to examine the aesthetic image including simile, metaphors and metonymy as materialized in the works of these four poets. The research benefits from conducting a comprehensive census that shows the subtle differences of the "rhetorical graphic" arts among the poets surveyed, by measuring the proportion of each rhetorical art of each poet, and the proportion of its subdivisions. In addition to making a comparison between the four poets to know, the differences in the percentage of those arts and its affiliated branches, and thus the individual characteristics of each poet's science of retoric are manifested, and the common features among the four poets. It is the first work done in this wide range of poetry of this period.

Key words: Poetic image; Comparison between poets; Pre-Islamic poetry ; Rhetorical statistics.

EXTENDED SUMMARY

This is the first statistical research of pre-Islamic poetry, conducted on the four most important (*Muallaqat*) poets. The total number of poetry verses examined reached 4000. The aim of this research is to exhaustively catalogue the graphic images of four poets by elucidating the intricacies of the rhetorical arts that draw on simile, metaphor, and metonymy. It also aims to outline the intricacies of the simile, metaphor, and metonymy rhetorical types. The objective is to identify the subtle differences between the poetic image styles of the four poets, as well as their similarities and differences. In addition, the research aims to determine the extent to which these poets choose narrative-based poetic imagery independent of the science of rhetoric. The statistical findings revealed that the pre-Islamic poet relied on rhetorical images and linguistic narrative in his portrayal. The findings also revealed that the four pre-Islamic poets included in this study favor simile in figuration over metaphor and metonymy. One of the poets, Zuhair, favored metaphor over simile. However, this exception proves the final rule. Based on the results of the statistics, it indicates that (metonymy for an adjective), which is one of the arts of metonymy, is a highly favored art among poets, competing with similes and metaphors alone.

Research recommends the following:

- The research suggests that scholars conduct statistical studies in the field of rhetoric of a single poet in order to determine the characteristics of his rhetorical choices.
- The research recommends undertaking statistical research on other pre-Islamic writers within the field of rhetoric.
- The research recommends conducting statistical studies in the field of rhetoric with more than one poet in a specific era to discover the characteristics of each one of them, and determine the characteristics of each poet, as well as the similarities and differences between them.
- The research also recommends conducting statistical studies in the field of rhetoric with more than one poet from different eras in order to track the similarities and differences, if any, between the poets of those eras and to discover the change in mood that emerges from the poetics of poets from one era to the next.
- It is also possible to conduct comparative studies between poets from two or more languages in order to determine the similarities and differences, if any, between the poets of those languages, particularly contemporary poets or poets from neighboring countries, in order to determine the extent of their influence in the field of rhetoric or any other linguistic field.

١. مقدمة:

سلك الشعاء الجاهليون سُبلاً فنية متعددة في عرض معانيهم، فتنوعت طرق التعبير، واختلفت أطر التصوير بتنوع الموضوع واختلاف الموقف، كما تفاوت بين شاعر وشاعر، وبين قصيدة وقصيدة عند الشاعر نفسه. وإن مفهوم التصوير الشعري في التراث العربي يرتبط بالتصوير البلاغي ارتباطاً وثيقاً؛ إذ يستعين الشاعر في رسم مشهد بالصور القائمة على التشبيه والاستعارة والكتابية، وهي من الطرق المهمة في التصوير الفني، بيد أن كثيراً من الباحثين المعاصرين يرون أن التصوير لا ينحصر في الصورة البينانية، وإنما يتعدى ذلك إلى التصوير الذي يعتمد على الوصف الحي الواقعي باللغة المجردة. وقد اهتم الباحثون قديماً وحديثاً بالشعر الجاهلي اهتماماً كبيراً، من الناحية اللغوية والأدبية والنقدية على حد سواء. وكثرت الدراسات البلاغية فرصد الباحثون موضوعات الصورة البينانية ومصادرها، وخصائصها من الناحية اللفظية والمعنوية.

